Arşîva Bîra Kurdan: Ji Michel Verrier gotara bi serenavê "Rewşa kurdan a berî şerî" (2002)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Çirîya paşîn 2012 - Hejmar 36 · www.diplo-kurdi.com · info@diplo-kurdi.com · 20 Rûpel

**Aziz Oguz**
Li Tirkîyeyê şanzdeh dibistanên ermenî hene; pênc ji wan lîse ne û bi giştî sê hezar xwendekarên wan hene. Hemû li Stenbolê ne ku îro hema hema tevahîya şêst hezar ermenîyên welêt lê dimînin…
R. 5

**C. Durand û R. Keucheyan**
Alozîyên di navbera welatên Ewropî de di asteke navneteweyî de gurr dibin, lê welatên ku bayê xirabûna aborîyê hêrî zêde ew dayî ber xwe; Îspanya, Îtalya, Portugal û Yewnanîstan in...
R. 7

**Alain Gresh**
Di salên 1950 û 1960î de, bi milyonan kadroyên Birayên Misilman ku li Misirê, li Sûrîyeyê, li Cezayirê yan jî li Iraqê zilm û zor dîtibûn berê xwe dan Kendavê, nexasim Erebistana Suûdî...
R. 13

**Wendy Kristianasen**
Bi xwepêşandanên bihara erebî re di heman demê de xwepêşandanan li Fasê jî dest pê kirin; di 20ê sibata 2011ê de bi hezaran kesan xwe berdan kolanên paytext Rabat, Kazablanka û Marakeşê...
R. 16

**S. Kleine-Ahlbrandt**
Dema artêşa Çînî di manewrayên eskerî de xwe nêzî peravên li ser wan nehatî lihevkirin kir, di heman demê de kêştiya hilgir a balefirên amerîkî jî li Derya Başûrê Çînê hêza xwe nîşan dida...
R. 17

# Grevên Birçîbûnê

Vahap Coşkun

Girtîyên ji doza PKKê û KCKê di 12ê îlonê de li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê kirin. Ev gotar di roja 57em a greva birçîbûnê de hat nivîsîn. Grevên birçîbûnê ku di rojeke ji bo dîroka sîyasî ya Tirkîyeyê gelek wategirîng de dest pê kiribû, demeke dirêj di rojeva raya giştî û medyayê de cih negirt. Ji destpêkirîna greva biçîbûnê 40 roj paşê raya giştî bi awayekî berfireh ji greva birçîbûnê haydar bû. Di van rojên dawîyê de ku tendirustî û jiyana girtîyên di grevê de ne bi awayekî cidî ket xeterê, çalaki hîn zêdetir ket rojevê, hewldanên çareserkirinê rû dan. Sîyasetvan, rewşenbîr û medya mecbûr man ku li ser vê pirsgirêkê rawestin. Lê hîn grevên birçîbûnê bi dawî nebûne.

### "Greva birçîbûnê"

Greva birçîbûnê, di nav metodên têkoşînên sîyasî de yek ji metodên bê şîdet e. Beşdervanên grevê bi armanca çêtirkirina mercên jiyanê, ji bo bidestxistina mafekî, ji bo daxwazên xwe yên sîyasî bigihîjînin raya giştî an jî bi armanca şermezarkirina rewşekê, serî li metoda birçî mayinê didin. Di daxuyanîya Maltayê ya 1991ê de greva birçîbûnê, wek "kesê/a ku ji alîyê zîhnî ve bi ehlîyat û bi biryara xwe ji bo demeke xwarin û vexwarinê red bike" tê şîrovekirin.

Greva biçîbûnê metodeke protestoyê ya sedsala 20em e. Di salên 1900î de di hilbijartinan de bi armanca ji bo bidestxistina dengdayina mafê jinan li Amerîka û Îngilistanê grevên birçîbûnê hatin çêkirin. Lê yê ku ev çalakî populer kir **Mahatma Gandî** ye. Gandî bi armanca şermezarkirina rêveberîya Îngiliz a li Hîndistanê greva birçîbûnê kir. Greva birçîbûnê bi felseya Gandî ya bi navê "***Satyagraha***" ( li dijî xerabîyek dîyarker berxwedana bi biryar, lê bê şîdet) re guncaw bû. Di dema nêzik de yek ji grevên birçîbûnê ya herî zêde deng veda, ji alîyê girtîyên sîyasî yên endamê IRA yê çêbû. Ev çalakî bi beşdarbûna 16 kesan 73 roj dewam kir û di encamê de 10 endamê IRAyê jiyana xwe ji dest dan. Ji ber sedemên jiyana xwe jidestdayina **Boby Sands** û hevalên wî, sîstema giştî ya Îngilistanê xera bû. Rêveberîya Îngîlîstanê ji bo bikaribe pêşî li alozîyan bigire hin tawîz dan û grev bi dawî bû.

### Li Tirkîyeyê grevên bîrçîbûnê

Li Tirkîyeyê jî di demên nêzîk de 4 grevên birçîbûnê yên girîng hatin jîyin. Li paş cûntaya 1980yê li ***Girtîgeha Tîpa E ya Dîyarbekirê*** girtîyên kurd bi armanca rawestandina îşkence û zilmê pir caran grevên birçîbûne kirin. Di salên 1984, 1996 û 2000î de bi armanca protestokirina kincê yek cûreyî û protestokirina girtîgehên tîpa Fyê girtîyên di zîndanan de grevên birçîbûnê û rojîya mirinê kirin. Di van her çar çalakîyan de jî gelek girtîyan jiyana xwe ji dest da.

Grevên birçîbûnê yên îro hîn jî berdewam dikin girtî û mehkûmên doza PKK û KCKê dimeşînîn. Daxwazên wan 3 armancên sereke ne: Perwerdeya bi zimanê zikmakî, di dadgehan de xweparastina bi zimanê zikmakî û rakirina tecrîda li ser **Abdullah Ocalan**.

Meriv dikare wekî metodeke çalakîyê helwesteke sîyasî nişan bide. Ji bo ku ez bikaribim helwesta xwe dîyar bikim divê ez du mijaran dest nişan bikim. Ya yekem li gor bîr û bawerîya min jîyana meriv nirx û hêjayîyê herî girîng e. Dîsa li gorî min hîç armanceke sîyasî û ramanî ji jîyana meriv bi rûmettir nîne. Belê rast e, grevên birçîbûne çalakîyên aştîyane ne û zerarê nadin kesên dinê. Lê li gel vê rastîyê ez rast nabînim û napejirînim ku tu kesek ji bo armanc û sedemên sîyasî jîyana xwe ji dest bide.

R. 4

# Sîyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û Pirsa Kurdî

Doç. Dr. Nezir Akyeşilmen *

Pirsa kurdî, bi vegotina serokkomar **Abdullah Gül** pirsa herî girîng a Tirkîyeyê ye. Ji damezirandina Tirkîyeyê heta roja îroyîn, jandeyeke wisa ye ku di sîyaseta hundirîn û derveyî de girîngîya xwe her parastîye. Weke ku pisporê Rojhilatê Navîn **Henri J. Barkey** jî dibêje; Pirsa kurdî, di polîtîkayên derveyî yên Tirkîyeyê de yên bi Amerîka, YE, Rojhilatê Navîn, Rûsya û Kafkasya jî di nav de roleke tayînker dileyîze. Ev rol carna bi awayekî xwezayî li gor dem û cîh bê guhertin jî, di bingehê xwe de hedefên Tirkîyeyê biçûk dike, qada manewrayên polîtîkaya derve û vîzyona Tirkîyeyê dorteng dike. Pirsa kurdî, bêguman herî zêde xwe di têkilîyên derveyî yên Tirkîyeyê yên bi Rojhilatê Navîn re nîşan dide; him bi awayeke dîrokî û him jî di sîyaseta îroyîn de bandorker û tayînker e. Heta ku **Davutoğlu** bû wezîrê kar û barê derve, pirsa kurdî, têkilîyên derveyî yên Tirkîyeyê yên bi Rojhilatê Navîn re bi kûrahî û neyînî tesîr dikir. Di serdema Davutoğlu de jî hîn jandeyeke girîng e, lê di heman demê de ji bo çareserîya pirsa kurdî nexasim di çarçoveya têkilîyên kurdên Iraqê de wezîfeya enstrumaneke girîng dîbîne.

Li gor vê nirxandina kurt, pirsa kurdî li ser polîtîkayên Tirkîyeyê yên Rojhilatê Navîn tesîra xwe dike û çareserîya vê pirsgirêkê dorpêç dike. Bi kurtahî, meriv dikare bibêje ku pirsa kurdî demeke pir dirêj e li ser polîtîkayên Tirkîyeyê yên Rojhilatê Navîn tesîreke mezin dike. Di polîtîkaya derveyî ya ku pirsa kurdî di navenda wê de cîh digire pir caran tesîrên neyînî û hinek caran jî ji bo çareserîya pirsê bandor kiriye.

### Ji perspektîva dîrokî ve têkilîyên bi Îran, Iraq û Sûrîyeyê re

Cografyaya ku kurd lê dijîn, li Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê ji hêla sîyasî, dîrokî, çandî û etnîkî ve cudabûn hene. Ev dewlet, ji ber berjewendî û armancên polîtîkayên xwe yên derveyî di dîrokê de gelek caran bi hev ketine û li hember kurdan têkoşîyane, lê tenê weke ku **Andrew Mango** jî dibêje, mijara ku li ser li hev kirine pirsa kurdî bûye. Ev her çar welat, ji bo ku kurdan asîmîle bikin, wan înkar bikin bi kêmasî hebûn û hewldanên wan sînordar bikin bi hevre bername û proje pêş ve birine, li pişt perdeyê jî qerta kurd li hember hev lîstîne û xwe ji vê yekê mehrûm nekirine. Lewra li ser vê meseleya ku li hev kirine jî bawerî qet bi hev neanîne. Sedemên vê bêbawerîyê yên dîrokî, olî, çandî hene. Lê meriv dikare bibêje ku xala herî girîng ew e ku di vesazî û mekanîzmayên biryardayînê yên van her çar dewletan de cudabûn hene.

R. 3



Parwez Zabihi: **Bênav**, Bi kureyên polystren boyaxa rûnî li ser tûwalê, 25x45cm

## Li Zanîngeha Erfurtê Beşê Lêkolînên Kurdî

Somestera havînê ya sala 2012ê li Zanîngeha Erfurtê li Almanyayê Beşê Lêkolînên Kurdî yê **Mustafa Barzanî** li bin banê Fakulteya Fîlozofîyê dest bi xebata xwe kir. Fînansmana beşî bi weqfeke serokwezîrê hikûmeta Herêma Başûrê Kurdistanê **Nêçîrvan Barzanî** misoger bû. Navend û înstîtuyên lêkolîna akademîk li zanîngeh û bajarên cihê yên Ewropayê berê hebûn (Exeter-Ingilîstan, Uppsala – Swêd, Utrecht-Hollanda, Viyana-Awusturya, St. Petersburg-Rûsya, Parîs- Fransa), lê belê li Almanyayê navendeke xweser ji bo lêkolînên kurdî kêmasîyek bû.

Li Almanyaya ku kurd lê di nava komên koçberan de duyemîn koma mezin in, ji mêj ve dema damezrandina navendeke lêkolînên akademîk a kurdolojîyê hatibû. Ji bo vê xebatên hatin meşandin encameke erênî derxistin holê. Fikar û mitaleyên siyasî yên ku li pêşîya damezrandina navendeke bi vî rengî asteng bûn, êdî ji ber bûyer û rûdanên li Rojhilata Nêzîk betal bûn.

Li Zanîngeha Erfurtê mijarên sereke ên lêkolînê ji bo Beşê Lêkolînên Kurdî pirsên neteweperestîyê, neteweavakirin, nasnameya etnîkî û mezhebî ne. Wekî din, lêkolîna têkelhevîya bi herêmê re ya dîrokî û dîroka koçberîya kurdan ber bi Ewropa û nexasim Almanyayê ve jî di nava mijarên li pêş ên Beşê Lêkolînên Kurdî de ye.

**Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm Seyder** birêveberîya beşî dike û **Dr. Lokman Turgut** jî asîstanîyê dike. Tevî alîkarên zanistî **Theresa Petrausch** û **Laura Kalcher** beş dixwaze li Almanyayê cihê Lêkolînên Kurdî di cîhana akademîk de zexm bike. Lêkolînên Kurdî li Erfurtê wê encamên xebatên xwe bi rêya weşanan bigihîne raya giştî ya akademîk û bi vê jî lêkolînên kurdî di nîqaşa zanistî ya rojane de bi cih bike.

www.diplo-kurdi.org

*EDITO*

# Bawerîneanîna bi dewletê

## Serge Halimi

Çar salan piştî krîzeke bi sûcê bankeyên şexsî pêkhatî û ji alîyê kesên bacê didin ve ji felaketekê hatî xilaskirin, di hilbijartinên serokdewletîyê de divê tu îhtîmala serketina namzetekî di sektora spekulasyona malî de dewlemend bûyî tunebe. Lê belavbûna bawerîneanîna bi destwerdanên dewletê bêguman dibe sedema nezelalbûna pêşdîtinên li ser encamên hilbijartinên amerîkî. (1) Sedemên vê bawerîpêneanî gelek in.

Berî hertiştî gelekî mezinbûna lihevderneketinên budceyî, rewşeke ku bi meşandina du şeran [li Efxanistan û li Iraqê] di heman demê de hê xirabtir bû, nepixandina bankeyan û kêmkirina bacên zêde bilind û newekhev, kirin ku pirsa deynên dewletê bibe mijara sereke ya siyasetê. (2) Lê êdî yên ku li têkîlîyên divê tunebin di navbera hikûmet û şîrketên şexsî de difikirin û yên ku li skandala kevne-serokwezîrên ku piştre bûne lobîyîst yan jî bûne konferansvanên luks (nivîsa Ibrahim Warde di rûpela dawî de bixwîne) difikirin, xwe li yên ku wisa digotin zêdekirin "dilê me heye lê pereyên me êdî têrê nakin". Tirsa heyî ya ji xisarên bûrokratîk, ya ji hebûna navcîyên parazît, ya ji pêkanîna projeyên mezin yên bi kêrî tutiştî nayên, guman li ser hene ku hatine kirrîn, qat bi qat zêde dibe. (3)

Peyva "zêde biha ye û bêkêr e" jixwe bûbû weke çekeke bikêrhatî li dijî her şiklê tedbîrên civakî yên Dewletê. Di vê rewşê de mirov dikare çi bibêje eger bi ser de jî, bawerî hebe ku yên bijartî xwe zêde dûrî gel xistine, ku bertîlê dixwin û bi ser de girêdayî berjewendiyên olîgarşîyekê ne, ku nikarin başîya hevpar pêk bînin? Rast e ku kirasê lîberal li xwe kirîye, ji vê bawerî pêneanînê sûdê werdigire. Û dihêle mirov bifikire ku ji bo birêvebirina welatekî çêtir e serokdewlet xwedî tecrube be di birêveberîya şirketekê yan jî foneke spekulasyonê de.

Di sektora şexsî de jî binpêkirin û hîle serdest in. Kî wê behsa hejmara bilind a muhendis, hesabdar û civaknasên bi pereyên dewletê perwerde bûn bike, yên ku her roj kapasîteyên xwe dikin xisar û wexta xwe bi malîştina koşeyeke kaporteya wesaîtekê, bi paketkirina weke diyarîyekê, bi kirîna fîltreyên cixareyê derbas dikin, yan jî yên ku kontratên sîgorteyê yên nedîtî diafirînin, yên pereyan radizênin bêyî ku bac ji wan bê standin. Bi serketina aborî ya şîrketan hema bibêje timî li pêş in li gorî bikêrhatîbûna civakî ya berhemên ku hildiberînin. Carnan patron dihetikin, carnan hetikîna patronekî ji meqamê wî dike, lê ev yek avahîyên ku sedema kiryarên wan in û kanîya hêza patronan e, naxe ber lêpirsîne. Li hemberî vê, îfadeya bi derewan a şaredarekî yan jî wezîrekî, serîtewandina hikûmetekê li ber lobîyekê, fînansmaneke guman jê tê kirin ya kampanyayeke hilbijartinan, di cîh de têsîrê li tevahîya dewletê dike. Vê yekê derb li rewatîya wê ya bac standinê, ya birêkûpêkkirina devereke ya seferberkirina neteweyekê xist.

Hema bibêje li her deverî, gel meyildarên guhertinê ne. Lê ji ber tunebûna rêbazên çi kevn û çi nû yên ji bo pêkanîna armancên xwe, ew pêşîya xwe bi destê xwe dipelînîn û wisa gavên xwe diavêjin û carnan jî bi paş ve gavê diavêjin û bi vî rengî li berevajîya tevahîya hêvîyên xwe dimeşin.

(1) Çavkanîya li jêr bixwîne: Manière de voir, hejmar 125, "où va l'amérique? / Amerîka bi ku ve diçe?", çiriya pêşîn û çiriya paşîn a 2012ê, li firoşgehên rojnameyan peyda dibe.

(2) "Une dette providentielle (deynekî pîroz)", *Le Monde diplomatique*, kanûna 2008ê.
3 Alain Devalpo, "L'art des grands projets inutiles (Hunerê projeyên mezin ên bêkêr)" , *Le Monde diplomatique*, tebaxa 2012ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 30x30cm

# Li pişt mentiqê insanî mafê navneteweyî

## Philippe Leymarie

Heqê kê "yê destwerdanê" heye? Destwerdana li erda kê, bi kîjan sedeman û ji bo çi? Gelo ev "maf" di rastîyê de yê çi ye? Di pirtûka xwe ya bi navê *Şerê li ser navê mirovatîyê* de, hiqûqnas û fîlozof **Baptiste Jeangène Vilmer** analîza vê konseptê dike ku bû bingeha îdeolojîk ya operasyonên leşkerî li ser navê "mirovatîyê" hatî meşandin. Lê pirranîya welatan ev îdeolojî red kirin, lewra ew "gelekî dişibîya ya ku Rojavayê ji sedsalan û vir ve dikir û dixwest bidomîne bi destwerdana raya xwe ya giştî ku zêde hatibû hişyar kirin, vê destwerdanê rewabûna xwe bi xwe ava dikir" (1) Da ku tiştekî bixe şûna vê îdeolojîyê, kevne-sekreterê giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) **Kofi Annan** dixwest fikra "berpirsîyarîyeke ji bo parastina" gelan îfade bike – "R2P"yê: weke ku **Hubert Védrine**, di pêşgotina pirtûkê de bi bîr dixe, R2P di sala 2005ê de ji alîyê RNYê ve hatibû erêkirin, wî bi xwe weke wezîrê karên derve yê fransî piştgirîya vê înîsîyatîfê kiribû.**Vilmer** doza nêzîkatîyeke pir mijaran bi hev re li ber çavan digire, ya pirçandî ku xwe dispêre lîsteyeke dirêj ya referansên pirtûkî, dike. Ew doktrîna destwerdana li ser navê mirovatîyê bi hûrgilî analîz dike li gorî rêzek pîvanan - ên weke rewabûn, şikil, nîyet, neçarî, mezinahî li gorî girîngîya pirsgirêke... – da ku hêmanên teorîyeke realîst ku weke "xirabîyeke piçûktir" were nirxandin, jê derbixe. Bi vî rengî ew tê derdixe "*heke piştî ku zêde dereng bibe mirov bixwaze berpirsîyarîya destwerdanê bigire ser milê xwe, maneya vê, vemirandina agirê ku mirovî bi xwe bi destê xwe pêxistî ye*". Ango ew pêşnîyaz dike ku mirov di dîroka bûyeran de li sedema wê ya yekem bigere û bigihêje vê encamê *"qebûlkirina hûqûqî û sîyasî ya konsepteke psîkomentiqî pirsgirêkek e"*.

Şerê di sala 2011ê de li Libyayê qewimî, sembola van pirsan e ku mirov ji xwe dike. Pirsa "berpirsîyarîya parastinê" ji destpekê ve ji alîyê çend hêzên ewropî ve hat kirin. Piştre biryarên Konseya Ewlekarîyê – yên bi saya dengnedana Çîn û Rûsyayê hatî dayîn – bi awayekî fireh hatin şirove kirin: di encamê de, armanca bikaranîna şîddetê – di hiqûqa navneteweyî de ne qanûnî ye – hilweşandina rêjîma **Mûamer Qedafî** bû.

Vê yekê gumanbarîyeke mezin a mirovan li hember alîkarîdanên civîneke piştî vê destwerdana ji alîyê *Komeleya ji bo Parastina Mafên Navneteweyî ya Mirovan* dide fêm kirin. (2) Gelo şer çareserîya yekane bû? Gelo divîyabû tevahîya hewldanên agirbest û hevdîtinan werin redkirin û divîyabû piştgirîya bendeke şer were kirin û bibin sedema mirina bi hezaran kesî yan jî bi deh hezaran kesî? Weke ku hiqûqnasê bi navê **Géraud de la Pradelle** binxêz dike, "berpirsîyarîya parastinê" statuyeke hiqûqî dide jirêderketinan bêyî ku serê xwe bi pirsgirêkên "insanî" re biêşîne. Li alîyekî din, **Rony Brauman**, kevne-serokê Bijîşkên Sînornenas (BSN), vê yekê rexne dike "*nû girêdayîbûna bi emperialîzma lîberal ve di nava tevgera parastina mafên mirovan bi xwe de gelekî belav e. Maneya ku divê mirov jê derbixe ew e, eger yek bixwaze bikuje, dizîyê bike, bibe xwedî desthilatdarîya totalîter, divê parazvanê wî hebe.*" Yê Qedafî bi xwe êdî tunebû. Lê wisa xuya ye ku serokdewletê Sûrîyeyê **Beşar el-Esed** hê xwedî parazvanekî ye…

*Ferhenga cîhanî ya operasyonên ji bo aştîyê* gelekî bikêrhatî ye, têde operasyonên bi vî rengî bi qest ne weke destwerdanên leşkerî yên klasîk cîh digirin (yên li Yugoslavya, Iraq û Lîbyayê). (3) Têde behsa sed û pencî operasyonan tê kirin; yên ku di navbera 1948 û 2011ê de hatin meşandin, *"yek ji kiryarên mirovî yên herî balkêş piştî Şerê Cîhanê yê Duyem"*, fermandar û hejmara wan ji sala 1990ê û vir ve ewqasî zêde bûn, "*ku carinan wezîfeya avakirina dewletên lihevçêkirî jî didin leşkerên RNY*". Berevajîya "çareserkirina" bi rêya arteşê ya pevçûnan, Civaka ***Sant'Egidio*** ku li Romayê hatibû damezrandin, ji bîst û pênc salan û vir ve bû pispora navcîtîyê. Çawa ku navcîyên veşartî yên ji bo wê xebitîn rave dikin, ev rêxistina navneteweyî ya civakên xiristîyanî xwe ji Mozambîkê heta bi Guetemalayê nîşan da. (4)

(1) Jean-Baptiste Jeangène Vilmer, *La guerre au nom de l'humanité (şerê li ser navê mirovatîyê)*, PUF, Parîs, 2012, 597 rûpel, 29 euros.

(2) Nils Andersson û Daniel Lagot (di bin rêveberîya wan de), *Responsabilité de protéger et guerres "humanitaires": le cas de la Libye (Berpirsîyarîya parastinê û şerên "insanî": bûyera Lîbyayê),* L'Harmattan, Parîs , 2012, 155 rûpel, 16,50 euros.

(3) Jocelyn Coulon, *Dictionnaire mondial des opérations de paix (Ferhenga cîhanî ya operasyonên ji bo aşitîyê),* Athena, Outremont (Québec), 2012, 280 rûpel, 24,95 dolarên kanadayê.

(4) Roberto Morozzo della Rocca (Di bin rêveberîya wî de), *L'Art de la paix (Hunerê Aştîyê)*, Salvator, Parîs, 2012, 358 rûpel, 23,50 euros.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 12x10cm

**Le Monde diplomatique kurdî**
**(Çapa elektronîk)**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Nedîm Baran
Semra Polat

**Revîzyona Wergeran**
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €**

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.arsivakurd.org

# Sîyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û Pirsa Kurdî (Dewama rûpela 1)

Di vê çarçoveyê de, ji bilî çend salên dawîn, dema meriv li têkilîyên sedsala dawîn yên Tirkîyeyê û Îranê dinêre û li têkilîyên Tirkiyeyê û Sûrîyeyê yên 50 salên dawî dinêre, meriv dibîne ku di seyra van têkilîyan de jandeya kurd di her xaleke werçerxalê de tê dîtin. Di sala 1926ê de, di navbera Tirkîye û Îranê de *Peymana Dostanî ya Tehranê* çêbû. Sedemê vê peymanê rasterast bi serhildana ***Agirî***yê û pirsa kurdî ve girêdayî ye. Di peymanê de tê gotin ku, *"Heger alîyek bê tehdît kirin, dê alîyê din rê li ber van grûb an avahîyan bigire"*. Di xaleke din ya peymanê de tê gotin ku, *"Herdu alî dê sûcdaran li hev vegerînin"*. Herweha di xaleke din ya peymanê de dîsa tê gotin ku, *"Dema alîyek bi êrişekê re rûbirû bimîne, dê alîyê din bêteref bimîne"*. Bi vê xalê derdikeve holê ku di rastîya xwe de bawerîya van herdu dewletan jî bi hevûdin nîne.

Di sala 1937ê de jî di navbera Tirkîye, Îran, Iraq û Afganistanê de ***Peymana Sadabadê*** hate mor kirin. Yek ji sedemê vê peymanê pêşveçûnên herêmî û gerdûnî be jî, sedema bingehîn pirsa kurdî bû. Li ser vê mijarê **Mustafa Serdar Palabıyık** tesbîteke weha dike:

*Yek ji sedemê girîng yê morkirina ku Pakta Sadabadê ew bû ku Tirkîye, Îran û Iraqê dixwestin îtifaqeke herêmî saz bikin, lewra van her sê dewletan jî pirsa kurdî wek tehdît didîtin. Di rastîya xwe de, him ji ber ku ev mesele di hundirê dewletê de dibû sedemê serhildan û bêhizûrîyan û tehdîdeke hundirîn û him jî ji ber ku dema serhildêrên kurd ji dewletekê direvîyan û xwe dispartin dewleteke din, wê demê jî mesele vedigerîya tehdîteke derveyî. Him li Tirkîyeyê, him li Îranê û him jî li Iraqê hindikayîyeke mezin ya kurd heye û di avakirina netewe-dewletan de ev nasname li derve hatiye hiştin. Ji bilî vê yekê, wê demê piranîya hindikayîya kurd jîyaneke koçerîyê dijîyan û li gor demsalan di nav sînorên van dewletan de diçûn û dihatin û ev sînor îhlal dikirin. Ev rewş ji alîyê van dewletan ve, ku dewletên xwe yên neteweyî nû avakiribûn, bixweşî nedihat pêşwazî kirin. Dema ku Tirkîye, Îran û Iraqê dewletên xwe yên neteweyî avakirin û xwestin sînorên xwe destnîşan bikin û nasnameyeke neteweyî pêşve bibin, wê demê bi serhildanên kurdan re rûbirû man. Vê rewşê wisa kir ku ev her sê dewlet ji bo "çareserkirina meseleyê" nêzîkî hevûdin bibin. Di sala 1920ê de, Îsmaîl Axayê ji eşîra Şikakê ku weke **Simko** tê naskirin li bajarê Ormîyê li hember rêveberîya **Şah Riza** serî hilda. Ev serhildan ancax di dawîya salên 1920ê de hate têk birin. Di sala 1925ê de Tirkîyeyê bi serhildana **Şêx Seîd** re têkoşîn kiriye û serhildanên kurdan heta dawîya salên 1930ê berdewam kirine. Nexasim eşîretên kurd yên ku li ser sînorên Îran û Tirkîyeyê eşqîyatî dikirin, di navbera her du dewletan de dibûn sedemê pirsgirêkên cidî.*

*Di sala 1930ê de, ji ber ku Tirkîye bikaribe tevgera serhildêrên kurd ên li çîyayê **Agirîya Biçûk** biperçiqîne, ku ev der wê demê di nav sînorên Îranê de bû, çîyayê Agirîya Biçûk dagîr kir. Îranê ev **rewşa de facto** ancax di sala 1932yê de di encama paymaneke li ser sînor a bi Tirkîyeyê re pejirand. Di destpêka salên 1930ê de eşîreta Barzan dest bi serhildanan kirin û zor dan vê dewleta ku serxwebûna xwe nû îlan kiribû. Ji ber ku nifûsa kurdan ya di hundirê sînorên van her sê dewletan de zêde bû û serhildêran carcaran di nav sînorên van her sê dewletan de tevdigerîyan, ji bo çareserîya vê pirsgirêkê pêdivîyeke mezin derdixist meydanê. (Pakta Sadabadê 8ê Tîrmehê 1937): Lêkolînek li ser teorîyên îtifaqê ", Etudên Rojilatê Navîn, Cilt 2, No 3, Tîrmeh 2010, rûpel. 147-179).*

Di heman demê de, di xala sêyemîn ya Peymana Bexdayê de, ku di sala 1956ê de di navbera Tirkîye, Îngiltere, Îran û Iraqê de lidarket, tê gotin ku; "Welatên teref teahhud dikin ku dê tevlî karên hev yên hundirîn nebin." Di serdema şerê sar û piştî wê de Sûrîye jî tevlî van welatan bû. Li gor peyman û hevkarîyên van welatan ku carna du welatan di nava xwe de û carna jî tevan bi hevre dikirin, pirsa kurdî dihat destnîşankirin û hevokeke standard ku herdem li ser mitabiq bûn ev bû: Li ser navê dostanî û hevkarîyê şidet jî di nav de bi her awayî têkoşîna li dij terorîzmê.

### Aktorê ku lîstikê xera dike: Rêveberîya Herêma Kurdistanê

Jandeya ku denklema li jor hatî dayîn xera dike, makezagona Iraqa Federal ya sala 2005ê ye. Li gor vê makezagonê, Iraq welateke federal e, Rêveberîya Herêmî ya Kurdistanê jî bi awayeke fermî wek aktoreke herêmî û navneteweyî hatiye nas kirin. Herçiqas ji sala 2003yê ve û heta niha li Iraqê kaos û şidet kêm nabe, li Herêma Kurdistanê jî her ku diçe pêşveçûn çêdibin û ev der dibe qadeke ewle. Herweha di hilbijartinên Iraqê de partîyên kurdî ji bo îstiqrarê bûn partîyên kilît û him li hundir û him jî li derve li hember lidijderketina hin aktorên gerdûnî jî, alîyan li ser serokkomarîya **Celal Talebanî** li hev kirin. Vê pêşveçûnê him di hundirê Iraqê de û him jî di qada navnetewî de kurd kirin aktoreke girîng. Êdî kurdan jî di nava wê denklema ku ev bû qirnek ku hebûna xwe diparast cihê xwe girtin û ev denklem êdî bûye denklemeke pir nezan. 'Dijminê hevkar' êdî bi awayeke fermî bûye partner. Ev denklema nû, êdî Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê mecbûr dikin ku di polîtîkayên xwe de guhertinan çêbikin.

### Stratejîya nû ya Tirkîyeya nû: Vebûna kurdî

Helbet meriv nikare îdîa bike ku sedemê yekane yê ku Tirkîyeyê polîtîkaya xwe ya Rojhilatê Navîn guherandîye pirsa kurdî ye. Ev yek zêde ne realîst e û ne argumaneke saxlem e. Li kêleka vê yekê, ji sala 2002yê bi hatina AKPyê ve pêvajoyeke demokratîkbûnê û li hember daxwazên kurdan îklîmeke nermbûnê rû daye. Herweha, di sala 2009ê de bi hatina wezîrê derve **Ahmet Davutoğlu** re polîtîkaya "Bi cîranan re sifir pirsgirêk" hîn haleke realîst girtiye, şûna polîtîkayên ewlekarîyê yên dostanî, aştî û demokratîkbûna bihevreyî derketîye pêş. Di heman salê de vebûna kurdî hatiye destpêkirin. Him li hundir û him jî li derve hatiye pejirandin ku pirsa kurdî ne pirseke ewlekarîyê ye, pirseke sosyal û çandî ye. Ji ber ku him li hundir û him jî li derve ji polîtîkayên ewlekarîyê dûr ketîye, Tirkîyeyê bi Rêveberîya Herêma Kurdistanê re jî têkilîyan xwe hîn bi awayekî tendirustîtir meşandiye û kişandiye sewîyeyeke aştîxwaz. Di sala 2010ê de Davutoğlu û di sala 2011yê de jî serokwezîr **Erdoğan** paytexta Herêma Kurdistanê, Hewlêr ziyaret kirine. Herweha, serokê Herêma Kurdistanê tevî rayedarên bilind yên herêmê gelek caran serdana Tirkîyeyê kirine. Di van serdanan de li ser enerjî û gelek sektorên din, veberdan û hevkarî hatine kûrkirin, têkilîya herdu alîyan rengeke dezgehî û asteke bilind girtîye. Pêşveçûna van têkilîyan, ji hêleke din ve, ji alîyê kurdên Tirkîyeyê ve jî bi erênî hatiye pêşwazîkirin. Van têkilîyan di heman demê de **Mesûd Barzanî** û rêveberîya herêmê di pirsa kurdî de jî kiriye aktoreke girîng.

### Gelo pirsa kurdî çiqas nêzîkî çareserîyê ye?

AKPyê şûna polîtîkaya kevneşop û antîkurd ya Rojhilatê Navîn, polîtîkaya xwe ya bi kurdên Iraqê re kişand asta hevkarîyê û bi kurdên hundirîn re jî kişand xeta muzakereyê. Tirkîyeyê, di salên dawî de her ku têkilîyên xwe yên bi Sûrîyeyê re pêşve bir, her ji **Esad** xwest ku rewşa mafên kurdan baştir bike. Di destpêka bûyerên Sûrîyeyê de herçiqas bi saya hin weşanên provokatîv û halanker di bin tesîrê de mabe jî, piştî kurtedemekê hat ser xeta aqil û bi rêya hin nûnerên xwe da zanîn ku ew piştgirî didin maf û azadîyên kurdên Sûrîyeyê. Bi kurdên Iraqê re têkilîyên xwe kûrtir kir û herçiqas hikûmeta navendî ya Iraqê li dij jî derketibe, bi wan re peymanên petrol û bazirganîyê mor kir. Van pêşveçûnan li ser têgeha kurdan tesîrên erênî çêkirin. Lê herçiqas ev bû salek û nîv e vegerîyabe ser polîtîkayên xwe yên ewlekarîyê jî dît ku ev korerêyeke û deklare kir ku dikare hevdîtinên Osloyê ji nû ve bêne destpêkirin.

Daxuyanîya hikûmetê ya ku dabû zanîn ku hevdîtinên duwemîn yên Osloyê dikare destpêbikin, ji ber polîtîkayên ewlekarîyê yê sala dawîn û ji ber birînên ku zimanê tê bikaranîn çêkirine heyecaneke zêde di civakê de çênekir û herweha şideta li hember hevûdin berdewam dike. Ji bilî vê, grevên birçûbûnê û nexasim helwêstên ku serokwezîr **Erdogan** nîşan dide, ew hêvîyên biçûk ku xwanê dikirin jî, meriv dikare bêje ji holê rakirin.

Li hember daxuyanîyên li hember-hev ên ku hevûdin sor dikin, bikaranîna zimanê pevçûnê û cudadîtina yê din peyamên hin rêveberên AKPyê yên erênî û hêvîya hevdîtinên piştperde ji ber ku meriv bêhêvî be sedemek nîne. Em wek civak ne li wî cihî ne, ku peyv qedîyabe, lewra em li cihê destpêka peyvê ne. Di pirsgirêkên weha yên ku alîyên wan ên siyasî, çandî û civakî heyî de ti caran pêşveçûn bi yekalî nabin. Herweha ji ber xwezaya pevçûnan hertişt ji nikare bi awayekî vekirî bê meşandin.

Ew hêvî heye ku ji hewldan û gavên neserketî yên heta îro hatî avêtin hin ders hatibin derxistin û di nexşerêyên ku ji îro û pê de stratejîyeke hîn rasyonel, îlmî û mayînde bê çêkirin. Tenê divê êdî dev ji van polîtîkayên populîst û hestyar bên berdan.

Çareserîya pirsa kurdî, bi temamî meseleyeke demî ye. A girîng ew e ku herdu alî meydanê nedin daxuyanî û çalakîyên ku êdî vegera ji wan zehmet be. Lewra pirsa kurdî îro gihîştiye asteke wusa ku nikare bibe aletê berjewendî û çavsorîya hin kesan. Bi zimanê rêveberîya pevçûnan, ev pevçûneke pileya çarem. Ango, merhaleya krîza şidetê ye. Gava piştî vê, ango pileya pêncem, şer e. Lewra di nava şer û çareserîyê de xêzeke zirav heye. Ji ber ku ev xêz wenda nebe, divê herdu alî bi dîqet tevbigerin.

Lê hem analîst, hem jî piranîya civakê xweşbîn in ku em zêdetir, nêzîkî çareserîyê ne.

* Li Unîversîteya Selçukê di Beşê Têkilîyên Navnetewî de wek doçentê alîkar perwerdekar e.

Wergera ji tirkî:Yado Ciwan



Parwez Zabihi: **Bênav**, bazaltên reş li ser tûwalê, 40x40cm



Parwez Zabihi: **Bênav**, bazaltên reş li ser tûwalê, 40x40cm



Parwez Zabihi: **Bênav**, bazaltên reş li ser tûwalê, 40x40cm

www.arsivakurdi.org

# Grevên Birçîbûnê... (Dewama rûpela 1)

Ya duyem daxwazên ku di greva birçîbûnê de tên xwestin daxwazên sîyasî ne. Hemî daxwaz jî meşrû ne. Di dadgehan de, pêşî li mafê xwe bi zimanê zikmakî parastinê girtin, pêvajoya gihîştina dadmendîyê paşve dixe. Mafê xweparastina girtî û mehkûman ji holê radike. Daxwaza mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî daxwazeke hevbeş a gelê kurd e û kilîta pêkhatina sazûmaneke aştîyane ya civakî ye. Tecrîda ku li ser **Ocalan** tê meşandin jî li derveyî hiqûqê ye û sepandineke keyfî ye. Li gor mewzuata cezayê ya Tirkîyeyê girtîyek di pêvajoya dadgehkirinê de her dem dikare bi avûkatên (parêzvanên) xwe re hevdîtînan bike. Dadgehkirina Ocalan jî ji ber sedemên hin dozan li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê didome. Ji ber vê sedemê mafê wî jî heye ku wek her girtîyekî/ê bi avûkatên xwe re hevdîtînan pêk bîne. Ji ber van sedeman têkilîbirîna bi avûkatên Ocalan re ne ji sedemên hiqûqî ye. Sedema têkilîbirînê tercîha sîyasî ya dewletê ye.

Ji bo van daxwazên meşrû meriv dikare di qada sîyasetê de têbikoşe, ji bo vê yekê mekanîzma û merc jî hene. Parlementer, şaredarî, mezringên sîyasî yên sivîl, organên çapemenîyê ji bo bidestxistina van daxwazan dikarin çalakvan bin û van daxwazan bikin daxwazên rayagiştî. Ji ber vê sedemê qinyata min ew e ku divê ev têkoşîn bi destê girtîyên ku jixwe ji azadîyê bêpar in nemeşe, divê bi destê yên ku li derveyî girtîgehan in û derfetên wan hîn zêde ne bimeşe.

### Grevên birçîbûnê û alîgir

Di greva biçîbûnê de meriv dikare behsa 3 alîyan bike. Yekem PKK ye. Di nav beşdarvanên grevê de yên ku bi îradeya xwe beşdar bûne jî hene, lê divê meriv bîne ziman ku di pêvajoya biryarê de hêza dîyarker PKK ye. Wekî ku **Alî Bayramoğlu** jî dest nişan dike, meriv dikare greva birçîbûnê yek ji hewldanên tevgera sîyasî ya kurd a li ser jîyana merivan, rê li pêşîya sîyaseta xwe veke û zorê bide sîstemê binirxîne. PKKê wisa pêş dît ku dê AKP vê çalakîyê wekî inyatkirin an jî şantajê binirxîne. Û bi vî awayî dema daxwaz neyên pejirandin dê ji encamên neyînî yên biqewimin AKP berpirsîyar be û bedêla bûyerên neyînî dê bi AKPê bide dayîn. Yek ji hesabên PKKyê ya li ser vê bûyerê jî hesabê tenzîmkirina sîyaseta girseyî bû.

Alîyê duyem BDP ye. BDP dikaribû îfade bikira ku hewldana bidestxistina van daxwazan peywir û berpirsîyarîya wê ye û bang li beşdarvanên greva birçîbûnê bike da ku dev ji çalakîyê berdin. Tiştê ku ji BDPyê dihat hêvîkirin ev bû. Lê BDPyê nikarîbû helwesteke wisa nîşan bidaya. **Selahattîn Demîrtaş** vê yekê bi gotinên wekî *"em bizanibin dê bi banga me dev ji grevê berdin, me dê ev bang bikira"* şîrove dike. Lê vê daxuyanîyê bi gelemperî civak tetmîn nekir. Daxuyanîyên hin parlementerên BDPyê yên teşwîqkirina greva birçîbûnê jî derxist holê ku BDP ji bo dawî li grevên birçîbûnê bîne ne xwedîyê îradeyeke samîmî û ji dil û can e. Berevajî vê helwesta BDPyê, di nav civatê de têgiha ku BDP dixwaze li ser bingeha greva birçîbûnê sîyasetekê ava bike, bi hêz kir..

Alîyê sêyem jî AKP ye. AKP wisa difikirî ku bi vê çalakîyê armanca PKKê ew e ku rê li pêşîya AKPyê bigire û wan bixe tengasîyê. Ji ber vê yekê jî ji destpêkê de helwesteke neyînî nişan da, çalakî biçûk dît û got *"Greva birçîbûnê tuneye!"* û bi daxuyanîyên wekî *"Her tiştî dixwin û vedixwin, tu kesek birçî namîne!"* êrîşî rûmet û kesayetîya beşdarvanên çalakîyê kir. Dema ku Wezîrê Dadê daxuyanîya **"683 kes di greva birçîbûnê de ne. Em hêvî dikin ev grev bê bidawîkirin"** Serokwezîr jî li Almanyayê digot "**Greva birçîbûnê tuneye, ew kes şowê dikin"** û li pêş çapemenîya dinyayê êrîşî çalakvanan dikir. Pir vekirî ye ku ev zimanê ku Serokwezîr bi kar tîne, dûrî nirxên merivî û exleqî ye. Gotinên li dijî BDPyîyan *"ji merivan re dibêjin bimirin, lê ew bi xwe kebaba berxan dixwin"* û li her derê bikaranîna wêneyekî ku du meh berî greva birçîbûnê hatiye kişandin mercên dîyalogê jî ji holê rakir.

Dema ji vê tabloyê li bûyerê bê nêrîn, dikare bê gotin ku him PKK/BDP û him jî AKP li ser greva birçîbûne ketine nav rikekê û armanca wan ew e da ku ji vê bûyerê qezenceke sîyasî bi dest xin. Lê divê ev helwest him ji alîyê sîyasetê û him jî alîyê exleqê ve neyê pejirandin.

### Nermbûna zimanê sîyasî

Bi dirêjbûna deme tesîra greva birçîbûnê hîn zêdetir di nava rayagiştî de deng veda û her çû tendirustîya çalakvanan ket xeterê. Ev jî zimanê alîgiran ku tenê bi polemîkan bi kar dihat veguherand. Cîgirê Serowezîr **Arinç** daxuyand ku ji bo xweparastina bi zimanê zikmakî amadeyî tên kirin û sînyala hevdîtina parêzeran bi **Ocalan** re da. Li ser vê yekê di şêwaz û uslûba sîyasî de nermbûnek derket holê. **Ahmet Turk** got, em vê helwesta hikûmetê bi erênî dinirxînin. Konseya rêveberîya KCKê jî daxuyanîyek belav kir: **"Em bang li hikûmeta AKPyê dikin ku pejirandina daxwazên çalakvanan wek têkçûn û paşvegavavêtinê nenirxîne û bi erênî nêzîkî hewldanên çareserxwazan bibe û ji bo çareserkirina pirsgirêkê peywirên xwe di demeke herî kin de bîne cih"**

Hevserokê BDPê **Selahattîn Demirtaş** daxuyand ku *"em hêvî dikin dê pirsgirêk di nav 2-3 rojan de bi muzakere û hevdîtinan bê çareserkirin".* Serokkomar **Abdullah Gul** jî helwest nişan da; ji bo grevên birçîbûnê bi dawî bin, bi Wezîrê Dadê **Sadullah Ergin** re hevdîtin pêk anî. Ger ev pêşveçûn rastî qezayekê neyê îhtimaleke mezin e ku grevên birçîbûnê biqedin.

Em di pêvajoyeke krîtîk de ne, îro 57em roja greva birçîbûnê ye û êdî bi demê re pêşbazîyek heye. Ji ber sedemên ku îro em rûbirû mane êdî ne ew dem e ku li ser sedemên greva birçîbûnê gengeşîyên sîyasî û felsefî werin kirin. Divê em hemî enerjîya xwe ji bo ku tu kes jiyana xwe ji dest nede û seqetîyên mayinde çênebin xerc bikin. Divê em hewl bidin bêyî ku kes jîyana xwe ji dest bide û seqet bimîne greva birçîbûnê bi dawî be.


Wergera ji tirkî: Nedîm Baran



Parwez Zabihi: **Bênav**, Kevirên daran li ser tûwalê, 25x25cm



Parwez Zabihi: **Bênav**, Kevirên daran li ser tûwalê, 25x25cm



Parwez Zabihi: **Bênav**, Qaçên daran li ser tûwalê, 25x25cm



Parwez Zabihi: **Bênav**, Kevirên daran li ser tûwalê, 25x25cm

www.arsivakurdi.org

# Li Tirkîyeyê fêrbûna zimanê ermenî

Aziz Oguz *

Nêzî sedsalekê piştî qirkirinê (1915-1916), şêst hezar ermenî li Tirkîyeyê dijîn. Li Stenbolê ev civak xwedîyê tevneke dibistanan e: 16 sazîyên ku nêzî sê hezar xwendekaran dixin nav pergala dibistanan. Erka wan zehmet e: Zindî hiştina zimanekî û çandekê di demekê de ku zanîna zimanê ermenî kêm dibe, lewra ew mexdûrê hegemonyaya tirkî ye.

Mari Nalci bi rûyekî şidyayî û awirên gumanbir dibêje «*derîyê buroyê megirin.*» Bi cilûbergên xwe yên yên tarî û cidî birêvebera dibistana Tarmanças a ku ji 25 salan û vir ve wezîfedar e, xwediyê helwêstên «jina hesinî» ye. Ew dipirse «*ji bo çi elaqeya te ji vê mijarê re heye?*» Ermenîyên Tirkîyeyê baldar û bi dîqqet in, nexasim jî dema mijar dibistan bin. Nûnerê dibistanên ermenî **Garo Paylan** berê em hişyar kiribûn ku «*pirsgirêka ewlekarîyê ya sazîyên perwerdeyê gelekî girîng bû, nexasim piştî reşkujîya li dijî Hrant Dink*». Kuştina rojnamevan Dink, ji alîyê neteweperestekî tirk ve sala 2007ê, kir ku tirsên ermenîyan ji nû ve bidin der û vejîn: lodê kamerayên kontrolê, deradeyên hesinî yên li pêşîya pencereyan û heta nobetdarê li devê derîyî. Atilla Şen ê devbiken û beşervekirî bi her halî weke gardîyanekî girtîgehê yê hişk û ji ya xwe nayê xwarê, xuya dike: bêyî ku civanê mirov hebe, ne mumkin e mirov bikeve hundir. «*hîç pirsgirêk neqewimîn, lê belê hin şênîyên taxê bi çavekî xirab li dibistanê dinêrin. Mala xwedê ava, çawa ku tên me dibînin pêşhukmên wan betal dibin.*»

Avahîya dibistanê li Ortakoyê ye, nêzî Pira Tengavê (pira Bogazê) ye, pira ku herdu alîyên Stenbolê digihîne hev. Ev yek ji taxên herî zêde kozmopolît ên kevne-paytexta Împaratorîya Osmanî bû: gelek cihû, rûm û ermenî lê diman. Ji bilî du mizgeftan, lê çar dêr û du kenîşte lê hene. Îro kurdan şûna ermenîyan girtîye; bi tenê komek malbat lê mane. Wekî din jî sed û pêncî xwendekarên dibistanê ji alîyên din ên magalopolê bi xêra mînîbusên xwendekaran dikişînin tên dibistanê.

Şanzdeh dibistanên ermenî hene li Tirkîyeyê, pênc ji wan lîse ne û bi giştî sê hezar xwendekarên wan hene. Hemû li Stenbolê ne ku îro hema hema tevahîya şêst hezar ermenîyên welêt lê dimînin. Yekane şertê qeydîya dibistanê heye: divê herî kêm ji dê û bavê xwendekarî yek jê bi eslê xwe ermenî be.

### Du asteng: Dewleta tirk û dema dibihure

Dîroka van dibistanan heta bi serdema Împaratorîya Osmanî diçe. Di rejîma kevin a împaratorîyê de, her civak berpirsîyar bû pergala xwe ya perwerdeyê bi rêxistin bike. Bi hezaran dibistan hebûn. Îro ji wan ti tişt nema: qirkirina ermenîyan a salên 1915-1916ê (ji milyonekê ta 1.5 milyon kes hatin kuştin, ev jî teqabulî ji sê paran diduyên nufûsa ermenîyên Împaratorîya Osmanîyan dike), piştre jî komkujî û koçberîyên li pey hev, kirin ku ev dibistan ji zarokên xwe xalî bibin.

Komara tirk a ku Mustafa Kemal sala 1923yê damezrand, hebûna van sazîyên cemaetî nexist ber lêpirsînê, tercîh kir ku pergaleke melez pêk bîne: dewletê wesayeta xwe li ser van sazîyan danî, lê belê ew li herkesî venekirin. Dewletê li ser her dibistanê hevbirêveberekî tirk ê ku wezareta perwerdeya neteweyî destnîşankirî ferz kir. Mamosteyên ku dewlet mûçeyên wan dide pêk hatina dersên çanda tirkî misoger dikin (ziman, dîrok û cografya), dersên din bi zimanê ermenî tên dayîn ku sazîya dibistanê bi xwe bi rêya weqfên xwe mûçeyên mamosteyan dide.

Sala 1974ê, sala destwerdana eskerî ya tirk li Qibrisê, tedbîr hatin girtin li dijî civakên xirîstîyan. Paylan weha heyf û xwezîya xwe tîne: «*berê dewletê ev dibistan fînanse dikirin, bi awayekî gelekî qels jî be li gorî peymana Lozanê* [sala 1923yê bi hêzên ewropî re hat mohrkirin] *fînanse dikir. Lê belê ji 1974ê ve ew êdî hîç alîkarîyê nade. Ew bawerîyê bi me naîne.*» Ango dibistan girêdayî weqfan in. Heke ev weqf xwedîyê mîrasekê, milkekî bin karên ku bi vî awayî tên bidestxistin destûrê didin wan ku xwe fînanse bikin; yan na ew dikarin bi tenê xwe bisipêrin alîkarîyên civaka xwe bi xwe. Lewra tevî ku ev dibistan taybet in, ev dibistan ne bi pereyan in. Dêûbav pereyekî salane yan jî mehane ji bo qeydîya dibistanê ya zarokên xwe nadin. Heke ji wan alîkarî tê xwestin ev jî bêşek e ku li gorî rewşa aborî û hatina maddî ya malbatê diguhere.

Mîsyona van dibistanên cemaetî girîng e: divê ew zimanekî û çandekê sax bihêlin. Lê belê ew li du astengên sereke diqelibin, dewleta tirk û dema dibihure. Lewra zimanê ermenîkî li tu devera din nayê fêrkirin. Li tu zanîngehê kursîyên ziman û yên şaristanîya ermenî nînin; Tirkîye qet mamosteyan nagihîne. Weqfa dibistanê dersdaran dineqîne – ev tercîh paşê ji alîyê wezareta perwerdeya neteweyî ve tê erêkirin-, profîla civakî ya dersdaran gelekî pirreng û cihêreng e. Tevahîya ermenîyan zimanê xwe ji malbatê fêr dibin berîya ku bi awayekî otodîdakt zimanê xwe bêqusûr dikin. **Mari Kalayaci** bi awayekî ji xwe re li hev hatî dest bi dersdanê kirîye. Dîplomaya birêveberîyê di berîka wê de, wê di sektora xwe de kar peyde nekirîye. Hingê şîret lê kirine ku di sektorên din de ji xwe re li kar bigere. Ji berîya heft salan heta niha ew dersên zimên dide. Ew ji du salan û vir ve li Ortakoyê ye û venaşêre heke karê wê ne ev bûya wê dê qet nekarîya zimanê xwe yê dayikê evqasî baş û ji nêz ve nas bikira; ew dibêje: «*Dema min dest bi dersdanê kir, ez pir zêde fêr bûm. Û ev yek îro hê jî dewam dike»* û dibişire.

Xwendekarên wê bi xwe çi kêm û çi zêde li dersê û zimên vekirî ne; ew weha rave dike: «*zimanê ermenîkî zimanekî zor e. Hin jê zehmetîyê nakişînin, lê ji bo hinan jê jî pir zor e.»* Xwendekarên li Ortakoyê para bêhtir bi tirkî di nava xwe de dipeyivin, li dibistanê jî rewş ev e. Birêvebera jin van gotinan li peyvên xwe zêde dike: «*Ew li Tirkîyeyê dijîn. Tiştekî xwezayî ye ku ew ji ermenîkî çêtir bi tirkî dipeyivin.*» Lê belê mijar ne bi tenê zorî û zehmetîya zimên e. Pergala perwerdeyê ya tirk bi tu awayan alîkar nîne ji fêrkirina wî re. **Murat Gozoglu** yê ku tevahîya perwerdehîya xwe li dibistanên ermenî kir dibêje «*Li lîseyê hin hevalên min kêm diçûn dersên zimanê ermenîkî. Li dijî vê tu ceza nebûn.*» Jixwe êzmûnên neteweyî yên ji bo xwendina zanîngeh û lîseyê bi tirkî ne.

Tevahîya dêûbavan zarokên xwe li dibistaneke cemaetî nanivîsin. Û yên ku dişînin jî tevahîya xwendina xwe li van dibistanan nakin: piranîya wan piştî dibistana sereke û yan jî piştî kolejê dev jê berdidin. **Nora Mildanoglu** ku debistana sereke li dibistaneke ermenî xwend û paşê jî li dibsitana amerîkî Robert a Stenbolê, yek ji dibistanên herî bi prestîj ên Tirkîyeyê, xwend weha rave dike: «*sazîyên perwerdeyê yên ermenî nexasim jî lîse, ne yên herî navdar in. Carinan ew weke tekereke hewarê tên dîtin. Dêûbav tercîh dikin zarokên xwe bişînin dibistaneke fransî, ingilîzî, almanî û hwd.*»

### "Êdî çanda gelêrî nemaye"

Li Tirkîyeyê mentalîte veguherîn. Welêt xwe li hindikahîyên xwe yên ku bi hêsanîtir doza nasnameya xwe dikin, vekir. **Kalayaci** vê tesbîtê dike «*îro, êdî ez natirsim li derve bi ermenîkî bipeyivim. Dema ez zarok bûm min qet nediwêra bi ermenîkî bibêjîm,* ***mama*** *' ji dayika xwe re, min li şûna wê digot****, anne****'* [bi tirkî ye]*, da ku mirov nizanibin ku em xirîstîyan in.*» Dîsa jî ev ziman hêdî hêdî li Tirkîyeyê tine dibe û çanda wî jî pêre.

Ermenî fikaran dikin. Paylan bi hewarê dibêje «*di nava malê de êdî pir kêm bi ermenîkî tê peyivîn. Êdî çandeke gelêrî ya ermenî nema. Em pê razî ne ku bi tenê beşinan fêrî zarokan bikin, da ku karibin di jiyana xwe ya rojane de pê xwe îfade bikin.*»

Ev tesbît **Sarkis Seropyan** ku hevdamezrênerê rojnameya sereke ya cemaetî ***Agos***ê ye qet jî matmayî nahêle: «*kêm ermenîyên Tirkîyeyê bi zimanê xwe dipeyivin. Piranîya gotarên* Agos *bi tirkî ne û ev jî vê rastîyê piştrast dike.*» Ji bîstûçar rûpelan bi tenê çar bi ermenîkî ne. Seropyan dibêje «*heke ne wisa be tu kes rojnameyê nakire.*»

Civaka ermenî fêm kir ku ev dibistan bi tena serê xwe wê nikaribin zimanê wê vejînin. Lê belê derxistina wê ji nava sînorên wê karekî tevlîhev be: di dema reforma dawî ya mezin a pergala perwerdeyê de ya ku bihara 2012ê hat erêkirin, fêrkirina zimanê ermenî li dibistanên dewletê hat redkirin. Ango divê mirov hê jî bi pergala heyî razî be.

* Li Zanîngeha Toursê xwendekarê rojnamevanîyê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Parwez Zabihi, **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 40x30cm

www.arsivakurdi.org

Piştî erêkirina Peymana Lîzbonê –kopyaya "Destûra Bingehîn a Ewropî" a sala 2005ê hat red kirin –, parlemana Fransayê divê vê mehê Peymana li ser Îstîqrar, Koordînasyon û Birêveberîyê (PIKB) erê bike. Liberrabûna parlemanterên beşek ji wê komê, ne ku di hilbijartinên serokkomarîyê de piranî bi dest xistin –di navê de kesk jî– û protestoya gel dîyar e xwedîya hindik şansê astengkirina operasyonekê ne ku wê fînansên dewletê bixe bin wesayetê. Dîsa jî dengên piştgir ên Ewropayeke pêşverû hene. Va ye, ev yek ji wan e.

## Peymana îstîqrarê, bazara hevpar, reforma nemimkin

# Ji bo Ewropayeke çepgir raperîna sîvîl

Bernard Cassen *

Ewropayeke çepgir -ango bi rastî demokrat, civakî, hevgir û ekolojîk, ya ku têkîlîyên xwe bi siyasetên lîberal bi awayekî radîkal qût bike– gelo mimkin e? Sedemên baş hene da ku meriv bifikire ku birêz François Hollande tu cara bawerîya xwe bi vê tiştê neanîye. Di 6 nîsana 1992yê de, di dema ku ew bi tenê parlementer bû, di trîbuna Meclisa Neteweyî de wisa bi îdîa axivîbû: *"Sedema sertewandina me li hember ferzên pereyî, budceyî û aborî qebûlkirina me ya globalbûnê ye. Eger wisa ye, yekane mijar ku divê were nîqaş kirin qebûl kirin yan jî redkirina me ya qanûnên kapîtalîzma navneteweyî ye. Eger em di nav lîstîka globalbûnê de întegre bibin, ev tê maneya ku pêdivîyên wê yên aborî, pereyî, û pê re yên ewropî tên ferz kirin»*. (1) Bi gotinên din avakirina Yekîtîya Ewropî bi tenê dikare bibe beşeke globalbûna lîberal.

Çaxê bîst salan bi şûn ve, ew ê ku bû serokkomar soza "guhertina berê" avakirina ewropî dide, ji bilî pir kêm dizane ku ne mimkin e … hemû daxwazên "guhertina berê wê" bi avahîyeke îdeolojîk û xwedî sazî ya Yekîtîya Ewropî re rû bi rû dimîne. Em ne bi tenê behsa peymanan dikin ku "reqabeta azad û ya rastî" weke prensîpa birêvebir a tevahîya siyasetan bi cîh dike. Em herwiha di nav dehan hezar rûpelên ya "destketîyên civakî" de behsa wergera wan di pratîkê de dikin [yên weke tevahîya qanûnên Yekîtîyê tên qebûl kirin, nota wergêr]: Hemû ferman, qanûn û biryar in. Ji lîberalan vê yekê qet venaşêrin. Weke ku yek ji axaftvanên wan ê herî jêhatî, birêz Elie Cohen, rêveberê îdareya şirketa Pages Jaunes, Electricité de France-Energies nouvelles û yê Steria (2) qebûl dike "*mekanîzmaya siyasetên bazarê ferza welatên endam ên Yekîtîya Ewropî pêk anîye, nexasim neteweyên latîn (Fransa, Spanya, Îtalya) ku dixwestin siyasetên xwe reforme bikin, yên sektorên ku kontrolkirina wan zehmet bû lewra tê de sendîkalîzm xurt bû û exlaqê siyasî qedexe dikir ku guhertinên mezin tê de çêbikin.*" (3) Meriv nikare bi awayekî ji vê zelaltir bibêje…

### Awayekî xapandinê

Di vê rewşê de, gelo mentiqî ye meriv weke ku siyaseta çepgir dimeşîne di çarçoveya binesazîyên heyî ya Yekîtîya Ewropayê de bike, lewra ev binesazî ji bo ku rê li ber tiştekî wisa bigirin, hatin ava kirin? Eger meriv bersiveke neyênî bide vê pirsê, encameke mentiqî xwe ferz dike: Divê peyman werin guhertin, ji serî heta binî. Gelo çawa dibe ku ji bo paragrafeke bi tenê jî peyman tên guhertin? Bersiv: Bi bikaranîna madeyên revîzyonê ku tê de ne. Lê di rewşa heyî de ev made qanûna erêkirina tevahîya endaman ferz dike… ango têrê dike ku ji bîst û heft welatên endam bi tenê hikûmeta yekê bibêje "na" da ku prosedûra revîzekirina peymanê ya ji alîyê welatekî ve hatî peşnîyaz kirin, bloke bibe.

Ji xeynî çend îstîsnayan, partî, tevger û rêveberên çepgir, fikrên wan ji hev her çiqasî cuda bin jî (4), çavên xwe li vê kilîdkirina sazîyê digirin. Ew mentiq û fikrên xwe didominin –ango di qada fermî de– weke ku mimkin be peymaneke nû ya xwe dispêre prensîpên ji yên Lîzbonê cuda were qebûl kirin, di yekîtîyekê de ku bîst û heft endamên wê hene, di demeke kin de jî hejmara endaman wê ji sîhê bibihure. (5) Li gor rêveberên sosyal-demokrat, soza "guhertina berê" yekîtîyê ya birêz Hollande wê bi muzakerekirineke bi hikûmetên di serî de li dijî vê fikrê re pêk were da ku hinekî "mafên civakî" bi zor û zehmetî ji wan bistîne. Bi vî rengî, Lihevkirina ji bo bipêşxistin û zêdekirina hejmara kar, ya bi înîsîyatîfa birêz Hollande ji alîyê bîst û heft welatên endam ve 28ê hezîrana dawî hat qebûl kirin, qaşo Peymana Îstiqrar, Koodînasyon û Birêveberîyê (PÎKB) diguhere, her çiqas ev yek bi tenê lihevanîneke siyasî ya nikare xwe ferz bike be jî.

Li gor xwedîyên fikrên din, ku li Fransayê di nav tevgera bi navê *Front de gauche* de ne –her çiqas endamên wê di vê mijarê de xwedî heman fikrê nebin jî– û di nav Partîya Keskan de ne, divê meriv li ser avakirina tevgereke civakî ya ewropî bixebite da ku Yekîtîyê bi rengên pêşketina civakî xurt bikin. Tedbîra kilîd a vê perspektîfê, zêdekirineke mezin a budceya Yekîtîyê (niha ew %1ê Hilberîna Hundir a Nesafî [HHN] serê şênîyekî li Yekîtîyê ye) ku wê destûra cîhguhertina pereyan bide û wekhavîya rewşa aborî ya welatên endam û ya standartên civakî pêk bîne, ew ê herwiha rê li ber tevahîya şiklên *dumping*ê [ji bo berjewendîyê xwe, bi qestî kêmkirina nirxa berhemekî, yan jî ya pereyê welatekî, nota wergêr] yên navxweyî bigre.

Lê pirsgirêk ev e, ev gava mezin ya ber bi "federalîzmeke çepgir" ve utopîyek e ku encama wê dikare were pêş dîtin. Ev jî ne bi tenê ji ber mekanîzmaya sazîya li jor me behsa wê kiribû. Meriv dikare bibêje mixabin, lê heta niha, bi tenê giravên piçûk yên qadên gelemperîyê [yên li fikra herkesî vekirî, nota wergêr] yên ewropî hene. Nexasim konsepta tevgereke civakî ya ewropî xwe naspêre tu rastîyan. Rast e ku di van demên dawîyê de, Konfederasyona Ewropî ya Sendîkayan (KES) xwe hinekî ji ewro dûr xist -lîberalîzmê– wê helwêsta xwe li dijî PÎKB eşkere kir –lê çaxê meriv pirrengîya endamên wê dibîne, zehmet e bawer bike ku ew dikare bibe stûna seferberbûneke girseyî ya giştî li dijî şiklên heyî yên avahîya ewropî. Civîna meclisa wê ya giştî ku wê di 17ê çirîya pêşin de pêk were, wê bibe ezmûna biryardarîya wê, hin endamên wê (nexasim sendîkayên spanî) jê dixwazin ku berîya civîna Konseya Ewropî ya di kanûnê de, biryara xwepêşandanên mezin ên li dijî jixwekêmkirinên budceyî li tevahîya paytextan bide.

Herçî îhtîmala zêdekirineke mezin a budceya Yekîtîyê ye, hikûmetên ku weke dînan dixwazin lêçûnên budceyî kêm bikin û teserûfê bikin û herwiha –bê gûman– gelên ewropî yên her diçe zêdetir li dijî hertiştê ku ji "Brukselê" tê ne, dikin ku ev îhtîmal li derveyî rojevê be. Ango bêyî ku zext li çarçoveya heyî ya sazîyên Yekîtîyê were kirin weke ku peymaneke nû "ya çepê" mimkin be, weke şiklekê îluzyonîzmê xuya dike.

### Guherandina berê dîrokê

Rêyeke din a mimkin dimîne, ew jî bi hilbijartinan dibe: Li welatekî dîyarkirî, eger dengên gel vê wezîfeyê bide hikûmetê, qûtbûneke yekser ji siyasetên Yekîtîyê dikare pêk were, li gel bicîhkirina prensîpên mekanîzmaya neteweyî û têkîlîyên bi welatên ewropî re bi rê ve dibin. Ev wê bê maneya guhnedana qanûnen Yekîtîyê (bêyî ku jê derkeve) û avakirina di heman demê de modeleke din a ku li derveyî sînorên welêt balê bikşîne ser xwe. Prensîpa guhnedana qanûnên ewropî (6) welatekî neçar nahêle ku ji Yekîtîyê derkeve, ji xwe Peymana Lîzbonê êdî vê mimkinbûnê qebûl dike. Da ku berjêwendîyên xwe biparêze divê hikûmeteke "guhnedêr" xwedî stratejêyeke "yê lawaz li dijî yê bi hêz" be [stratejîyeke şerî ye ku tê de her du alî ne xwedî hêzeke wekhev in, nota wergêr], ev yek her çiqas bibe sedema nerazîbûna welatên din yê Ewropayê jî, divê ew hejmareke azamî ya keviran biavêje ber çerxên mekîneya hevgirtina ewropî –û divê heta mimkin e di nav Yekîtîyê de bimîne– da ku rê li ber belavbûna tedbîrên lîberal bigire. Lê berîya ku dest bi çalakîyê bike, divê pêşî paşveçûyîna xwe rawestîne, êdî hêzê ji dest nede...

Stratejîyeke bi vî rengî wê di pratîkê de çawa li kar be? Berî her tiştî bi rêya redkirina zêdekirina fermanên lîberalkirinê û yên "xirakirina" mafên civakî yên di hiqûqa neteweyî de bidestxistî; bi rêya bicîhneanîna ferzkirinên berê qebûlkirî, bi xwespartina Peymana Luksemburgê (7) ji bo ku rê li ber ferzên tên amade kirin, bigire. Wê heman tişt ji bo peymanên mohrkirî, yan yên li hin welatan erêkirî jî pêk were –di serî de peymana Mekanîzmaya Ewropî ya Îstiqrarê (MEÎ) û PÎKByê– ku armanca wan rizgarkirina bankeyan û ferzkirina tedbîrên jixwekêmkirinê yên daîmî li ser gelên ewropî ye. Wê hin kes li dijî helwêsteke bi vî rengî rabin û bibêjin, ev tê maneya binpêkirina "hiqûqa" Yekîtîyê, ev jî rast e. Meriv dikare bersiva hebûna nirxeke jê bilintir bide: Rêzgirtina ji prensîpa desthilatdarîya her miletî, ku ji alîyê mekîneya Yekîtîya Ewropî ve timî tê bin pê kirin. Bi rêya biryarên Dîwana Edaletê ya Yekitîya Ewropî (DEYE) ya Luksemburgê û bi rêya biryarên hakimên neteweyî ku temsîlên ferz ên Dadgehê ne.

Fikra ku wê vê nerazîbûnê li tevahîya parzemîna ewropî deng vede û bibe sedema krîzeke siyasî ya nedîtî, li cîh e. Di encama wê de cemidandina tevahîya tedbîrên lîberalkirinê wê pêk werin ku amadekirina wan xebata rojane ya Komîsiyona Ewropî ye. Lê belê wê ev krîz bibe sedema pevçûneke neditî di navbera du hêzan de: Li alîyekî, yek yan jî çend hikûmetên "guhnedêr" ku raya giştî û tevgerên civakî yên welatên din wê piştgirîya wan bikin; li alîyê din jî, sazîyên (Komîsyon, DEYE, Bankeya Navendî ya Ewropayê –BNE) ku tu rewabûna wan ya demokratîk tuneye, hikûmetên din wê pişta wan bigirin, lê belê ji bo wan wê pir zor û zehmet be welatîyên xwe qaneh bikin ji bo piştgirîya bi wan re xwepêşandanan li dar bixin. Hê tu caran nehatiye dîtin ku gel ji bo parastina berjewendîyên bankeyan, yan jî ji bo kêmkirina mûçe û mûçeyên teqawidbûnê tevlî xwepêşandanekê bibe.

Ev dijberî hev bûn wê di demeke dîrokî ya hesas de pêk were: Dema ku tevî lawazbûna giranîya wê ya jeopolîtîk, li gor daxwaza hin hikûmetan, Ewropa xwedî kapasîteya guhertina dîrokê ye. Eger meriv welat û komên herêman yên mezin bi rastî bîne bîra xwe, wê bibîne ku mimkin e ji parzemîna kevin (Ewropa) were ku sê şertan pêk bîne yên ku pêwîst in ji bo peşnîyazkirin û bicîhanîna modeleke alternatîf a jîyana civakî: Potansîyeleke fikrên rexnegir, hêzên civakî yên ji ber hebûna krîzê çalak bûyî, û giranîyeke mezin a demografîk û aborî. Li Amerîkaya Latîn, hêzeke navdewletî ku xwedî vê mentiq û fikra qûtbûna ji lîzberalîzme ye, ji qonaxa projebûnê gav avêt qonaxa pêkanîna di pratîkê de, ev kiryar di asteke piçûktir de be jî: Hevgirtina Bolîvarî ji bo Gelên Amerîkaya Me (ALBA). Çarçoveya herêmî guhertî be jî, bêguman ev ezmûn dikare bibe çavkanîya îlhamê. (8)

Bi heman rengî, li Amerîkaya Başûr, ji bilî ALBAyê di heman demê de Bazara Hevpar a Başûr (Mercosur) heye, meriv dikare hem hewl bide tesîrê li naveroka wê bike û hem jî xeyala di heman demê de hebûna du awayên Yekîtîya Ewropayê bike. Weke nimûne, Ewropayeke "çepgir" ku di destpêkê de wê hindikayîyeke piçûk be, belkî tenê xwedî endameke bi tenê, lê wê bikaribe mezin bibe; û Ewropayeke lîberal, weke ya niha heyî. Bivênevê, hebûna herduyan bi hev re wê pir zehmet be, û guhertinên li gor vê yekê wê werin pêkanîn, eger mimkin be guhertinên ji her du alîyan ve hatî erê kirin yên li ser mijarên ji bazara yekane heta bi tedbîrên parastina bazirganîyê. Eger tecrûbeyên çepgir bi ser ketana, ew ê bikarîyana tesîrê li welatên din bikirana û li nav Ewropayê bibana piranîyek.

Herêma ewroyê dewam bike yan jî neke, hebûna du Yekîtîyên Ewropî wê pirsa pereyekî hevpar derêxe holê. Di encama wê de du herêmên pereyî yên wekhev û lihevkirî dikarin werin afirandin, yan jî pereyekî hevpar yê ewropî (ne yekane pereyê ewrûpî) yê ku bi tenê wê karibe bi dovîzan re were guhertin, û ku xwedî rêbazên eyarkirinê yên di encama şêwirandina bi pereyên neteweyî hatin qebûl kirin. Çareserîyeke bi vî rengî pergala pereyî ya ewropî tîne bîra merivan (SPE), lê tiştê tê de guhertî ev e: Di SPEyê de, Ekuyê (9) ne weke ewroyê bû, pereyekî xeyalî bû, û pereyên neteweyî yên dikarîbûn bi dovizan werin guhertin bûn. Di vê mijarê de, li gor birêz Jean-Pierre Chevènement, kevne wezîr û senatorê erdên Bekfortê, *"bi tenê awayekî mentiqî yê paşerojê dikare hebe, ew jî biryareke terikandina yekane pereyê Ewropayê ye ya di asta ewropî de birêxistinkirî û ahengdarkirî."* (10) Lê vê jî li gotina zêde dike: *"Lê ji ber sedemên îdeolojîk û pratîk, zehmet e ev şiklê mentiqî yê paşerojê pêk were*". Gelo wê ya di konjektureke dîyar de zehmet timî wisa be? Mezintirbûna krîzê jî dikare çareserîyê pêk bîne...

Mijarên pir giran dikin ku meriv bikeve nav tiştê nenas. Berevajîyê vê, ya ku tê nasîn bixwe ew e ku divê , ji bo domandina siyasetên îroyîn berdêla wê were dan, û ev berdêl jî gelekî mezin e: Jixwekêmkirinek ku meriv nizane wê kengî biqede ku mafên civakî yên bi dehan salan bidesxistî li paş dihêle, û plankirina dayîna statûya rejîmên di bin "troïka"ya Komîsyonê/BNEyê/Fona Pereyan ya Navneteweyîyê (IMF) de ji bo piranîya welatên endamên Yekîtîyê. Di vê çarçoveyê de wexta meriv behsa demokrasîya Ewropayê, yan jî behsa fikra Ewropayê dike, divê dema bihurî bi kar bîne.

* Profesorê xwedî tecrûbe û rêz yê Înstîtuya Lêkolînên Ewropî ya Zanîngeha Paris 8, sekreterê giştî yê Bîranîna Têkoşînan.

(1) Christophe Deloire û Christophe Dubois ji ber girtîye, *Circus Politicus*, Albin Michel, Paris, 2012, rûpel 82.

(2) Brêz Elie Cohen herwiha li CNRSê birêveberê lêkolînan û li Sciences-Po profesor e. Gotara li jêr bixwîne: Renaud Lambert, "Les économistes à gages" ("Aborîzanên kirêkirî"), *Le Monde diplomatique*, Adara 2012ê.

(3) *La Tentation hexagonale (Cezba fransî)*, Fayard, Paris, 1996.

(4) Gotara li jêr bixwîne: Antoine Schwartz, "La gauche française bute sur l'Europe" "(Ewropa rê li ber çepa fransî digire), *Le Monde diplomatique*, Hezîrana 2011ê.

(5) Xirvatistan sala 2013ê wê bibe endama Yekîtîyê.

(6) Pirtûka li jêr bixwîne: Aurélien Bernier, *Désobéissons à l'Union européenne ! (Werin em guhnedin Yekîtîya Ewropayê!)*, Mille et une nuits, Paris, 2011.

(7) Ev siyaseta bi navê "kûrsîyê vala" ye ku general de Gaulle ji hezîrana 1965ê heta çileya 1966ê ji bo pêkanîna fînansmana siyaseta cotkarîyê ya hevpar dimeşand (SCH), li gor prosedûra piranîya kalîfîye [ku Konseya Ewropî ji bo her biryara xwe bi kar tîne, nota wergêr]. Bi saya lihevkirina Luksembûrgê ya 30ê çileya 1966ê serokdewletê fransî bi dest xist ku di pratîkê de, biryar ne bi piranîya dengan, lê belê bi standina tevahîya dengan werin dan, ku tê maneya bicîhkirina mafê vetoyê. Gotara li jêr bixwîne: "La France hors du consensus européen" ("Fransa li derveyî lihevkirina ewropî"), *Le Monde diplomatique*, çileyê 2007ê.

(8) Bixwîne "L'ALBA s'élargit et monte en puissance" ("ALBA mezin dibe û hêza xwe bi pêş dixe"): http://www.medelu.org/L-ALBA-s-elargit-et-monte-en

(9) "Ecu" navê kurtkirî yê European Currency Unit (Pereyê Ewropî) ye, bi fransî bû ECU.

(10) *La Newsletter de Jean-Pierre Chevènement (Newsletter a Jean-Pierre Chevènement)*, 11ê îlona 2012ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Betalkirina demokrasîyê ji bo krîzê

# Ber bi sezarîzmeke ewropî ve

Cédric Durand û Razmig Keucheyan *

**Îronîyeke digirnije, dana cesaretê yan jî kêlikê gorê? 12ê çirîya pêşîn a bihurî xelata Nobelê dan Yekîtîya Ewropayê. Ev yek dikare mirovî matmayî bihêle dema ku Bankeya Navendî ya Ewropî û Komîsyona Brukselê li dijî gelek welatên endam şerên budceyî bi rê ve dibin. Ev jihevderxistin bi her halî bang dike li hizirîneke li ser xwezaya rejîma sîyasî ya Yekîtîyê.**

“*Wexta mirov fîncaneke krîstal diavêje erdê ew dişkê, lê bi şiklekî dişkê: parçeyên fîncana şikestî li gorî meyilên sabît ên sînorê xwe, her çend mirov wan nebîne jî, ji berê ve ji ber şiklê avabûnê yê krîstalê ve dîyarkirî dişkên.*” Ev tesbîta **Sigmund Freud** di sala 1930î de li ser mijara nexweşîyên aqil kiribû (1) di mijara nexweşîyên sîyasî de jî rewa ye, ev nexweşî berî herkesî para Yekîtîya Ewropî ye (YE) avahîyeke “dîn” û “parçebûyî” eger mirov wê weke avahîyekê bihesibîne.

Krîza aborî ya sala 2007ê destpêkirî, nakokîyên di nava wê de diqewimîn derxistin holê. Wê bi taybetî nîşan da ku YEyê xwe dispart rejîmeke sîyasî ya otorîter, ku dikare pêvajoyên demokratîk bicemidîne wexta behsa lezgînîya aborî yan jî fînansî dike. Di nava van çar salên bihurî de, sazîyên ku bi temamî li derveyî kontrola gel tevdigerin, yên weke Bankeya Navendî ya Ewropî (BNE) û Komîsyona Ewropî ku – bi hevkarîya çalak a çînên desthilatdar ên welatên em ê behsa wan bikin- nexşeya rê ya gelê îrlandî, macarî, rûmî, yewnanî, îtalîyanî, spanyolî, portekîzî, fransî hwd. nivîsîn. Peymana li ser Îstîqrar, Hevkarî û Birêveberîyê (PSÎHR), kontrola budçeyî ya welatên endam û çavdêrîya Yekîtîyê li ser bankayan vê helwestê didomîne. (2) Mirov çawa dikare behsa xisleta vê şiklê birêvebirina gelan bêyî tevlîbûna gelan bike?

Da ku mirov li rêjîma nû ya Ewropî serwext bibe divê li ser her çar qonaxên krîzê bisekine û analîz bike. Her tiştî tebaxa 2007ê dest pê kir. Wê demê bankaya herî mezin a Fransayê *BNP Parisbas*, dîyar dike ku bi sedema ku nikare wan bipîve wê sisîyan ji fonên xwe yên pererazandinê bicemidîne, YE xwedî tu çavkanîyeke aborî nîne ku karibe mudaxele bike: her çend yekbûna pereyî destûr dabe avakirina bankayên ku di asta parzemînê de dixebitin, birêvebirina kiryarên wan di destê dewletan de ye. Bêyî ku li tu reforma bingehîn ya sîstema aborî were fikirîn, Bankaya Navendî ya Ewropî (BNE) hejmarke bilind a pereyan dide.

Di îlona 2008ê de îflaskirina bankaya cîhanê ya çarem ya pererazandinê, **Lehman Brothers** nîşana destpêkirina qonaxa duyem a krîzê ye. Ew sîstema aborî ya navneteweyî ber bi îflasê ve dibe û dibe sedema deynkirineke mezin (*credit crunch*). Ji dema piştî Şerê Cîhanê yê Duyem û vir ve yekem car e ku sîstema aborî ya cîhanê dikeve nava buhranê. Bersiva elîtan, berî hertiştî ji G20 û ji bankayên navendî yên ekonomîyên herî li pêş ên cîhanê hat: tevahîya pêdivîya tedbîrên kontrasîklîk [tedbîrên ji bo çareserkirina bêîstiqrarîya aborî tên girtin yên weke kêm kirina bacan, nota wergêr] yên demî qebûl dikin.

Di civîna Konseya Ewropî ya 15 û 16ê çirîya pêşîn a 2008ê de, hikûmet ji nû ve xwedî kapîtal kirina sazîyên kredîyê [ango xilaskirina wan ji krîze, nota wergêr] ku zehmetîyê dikşînin, didin zanîn û soza garantîya deynkirinên bankayan didin. Di asta Ewropî de, du sazî bi hêz dibin: *Bankaya Navendî ya Ewropî* (BNE) û *Birêveberîya Giştî ya Reqabetê* (BGR). Ew bi rastî di dema krîzê de dibin navendên birêveberîyê. Ji ber ku nexwedîyê rewabûneke hilbijartinan in, ew her çend xurt bibin, asta demokrasîyê di nava Yekîtîyê de ewqasî kêm dibe.

Qonaxa sêyem a krîzê: di dawîya sala 2009ê de, Ewropa dibe navenda krîza global. Wê demê xelekeke bêdawî ya nayê şikandin dest pê dike: zêde bilindbûna faîzên deynên dewletan yên welatên derdorê û kevîyan, giştîbûnâ tedbîrên jixwekêmkirinê, nîv–pêşketin yan jî paşve ketin. Desthilatdarîyên neteweyî ku tevlî pereyê yekane bûn, dibin hedefa êrîşên spekulatîf heke BNE red bike garantîya xwe bide wan.

### Ji Napoléon Bonaparte heta bi Mario Draghi

Gulana 2010ê. Yekem plana xilaskirina Yewnanîstanê, Atînayê dixe bin kontrola”troyka”yê: ku ji Fona Pereyan ya Navneteweyî (IMF), BNE û Komîsîyona Ewropî pêk tê. Li dûv wê, rêjeyên faîzê yên Îrlanda, Portugal, Spanya û Îtalyayê dikevin panîkê û nîşan didin ku rewşa Yewnanîstanê ne taybet e. Di heman demê de, Foneke Ewropî ya Îstîqrara Aborîyê (FEÎA) tê avakirin. Tevî ku beşek ji êlîtên parzemînê li hemberî vê yekê radibin jî, BNE qada erkên xwe fereh dike û dest bi kirrîna deynên dewletan di bazara duyem de [bazareke ku têde hiseyên heyî lê tên kirrîn û firotin, nota wergêr] dike.

Ev guhertin bi berjewendîyên fînansê re li hev dikin. **Klaus Regling** rêveberîya FEÎAyê bi dest dixe. Ew kevne-kadroyê IMFyê, yê wezareta fînansê ya alman û ya Komîsyona Ewropî ye, wî beşek ji karîyera xwe di sektora fînansa şexsî de derbas kir, di salên 1980yî de bi komeleya bankevanên alman re şuxilî, di navbera 1999 û 2001ê de li Londonê foneke spekulatîf (*hedge fund*) bi rê ve bir û weke şêwirmendekî şexsî li Brukselê xebitî. Rewşa **Jacques de Larosière** dişibe ya wî: kevne-serokê giştî yê IMFyê bû, memurekî bilind yê wezareta fînansê ya dewleta fransî bû, piştre bû şewirmendê **Michel Pébereau**, rêveberê giştî yê ***BNP Parisbas***ê, di sibata 2009ê de bû serokê grûba pisporan ku raporek li ser mîmarîya sektora fînansî ya Ewropî amade kir û da Komîsyona Ewropî. Çar ji heşt endamên vê komê girêdayî sazîyên aborî bûn yan jî hê wisa ne: Goldman Sachs, BNP Paribas, Lehman Brothers û Citigroup.

Di qada çarem a krîzê de, ku di hezîrana 2011ê de destpêdike, krîza deynên dewletên li derdor û kevîyan ên Ewrûpayê digihîje hin welatên navenda dîrokî ya Yekîtîyê pêk tînin yên weke Îtalyayê ku rêjêyên faîza deynên wê li gorî yên Almanyayê gelekî bilind bûn. Tevahîya parzemînê dîsa dikeve nava pêvajoyeke hêdîbûna bipêşketina aborî, û welatên Başûr jî dikevin nava pêvajoya depresyoneke aborî. Di heman demê de, krîz her diçe zêdetir sîyasî dibe. Alozîyên di navbera welatên Ewropî de di asteke navneteweyî de gurr dibin, lê nexasim di nava civakên ku bayê xirabûna aborîyê hêrî zêde ew dayî ber xwe: Spanya, Îtalya, Portugal û Yewnanîstan.

Rola ku Enstîtuya Fînansa Navneteweyî (EFN) di vê pêvajoyê de bi cîh tîne, pirr girîng e. Ew bi awayekî yekser têsîrê li reforma mîmarîya fînansa Ewropa dike û weke nimûne jê hat ku pêşnîyaza ferzkirina baceke nû li ser sektora bankeyan pûç bike. (3)

Dema ku di çirîya pêşîn a 2011ê de, serokwezîrê Yewnanîstanê **Georges Papandreu** daxwaza xwe ya organîzekirina referendûmeke li ser mijara plana nû ya alîkarîya aborî got, hikûmetên Ewropî gef lê xwarin. **Nicolas Sarkozy** cara yekem îhtîmala derketina ji herêma ewroyê ya Yewnanîstanê dike. Papandreu îstîfa dike û **Lucas Papademos**, ku kevne-bankevanekî li Bankaya Navendî ya li Atîna û li Frankfurtê ye, şûna wî digire û “hikûmeteke yekîtîya neteweyî” bi rê ve dibe.

Li Îtalyayê, heman tişt tê serê **Silvio Berlusconi**. Ew neçar dimîne îstîfa bike, piştî ku komîserê karên aborî yê Yekîtîyê **Olli Rehn** peyamek ji Îtalîyayê re şand pê xwest reformên aborî û bacî yên radîkal bên kirin. **Mario Monti** yê ku kopîya çîyayî ya **Lucas Papademos**, Larosière û Regling e, şûna wî girt. Monti kevne-komîserê Ewropî yê berpirsîyarê reqabetê bû û serokê ***European Money and Finance Forum***ê – “think tank”eke yê pisporên fînansî, sîyasetvan û endamên zanîngehan dicivîne, wî herwiha şêwirmendîya Goldman Sachs û Coca-Colayê jî kiribû.

Ji destê hikûmetan nehat ku li hemberî vê yekê xwe ragirin, lewra entegrasyona ewropî bi lez bû. Peymana nû ku niha tê erêkirin, çarçoveyake hişk li ser sîyasetên budceyî yên neteweyî ferz dike û wan neçar dihêle di bin kontrola Komîsyona Ewropî û ya hikûmetên din de bimînin. Prensîba ku li gorî wê “dema ku dewlet nikarin deynên xwe bidin, desthiladarîya wan bi dawî dibe” ferz dike ku welatên xwedî bernameyeke alîkarîstandinê bibin herêmên bi tevahî di bin kontrola hêzeke xurtir de. Li Atînayê, Lîzbon û li Dublînê mirovên cilên reş li xwe kirî yên “troyka”yê fermana paketên tedbîrên divê werin girtin didin û têkilîyên neo-kolonyal bi bîr tînin, yên ku serî welatên li derdorê û kevîyan ditewînin. Spanîya û Îtalya ya ku desthilatdarîya nû ya Fransayê piştgirîya wan dike, di civîna bilind a hezîrana 2012ê de bi zehmetî karibûn bikin ku sozeke nedîyar were dayîn, der barê îhtîmala siberojê hinekî sistkirina kontrola li ser van welatan ferz kirî de. Ev xeyalşikestin bi danezanên nû yên **Mario Draghi**, ku di çirîya paşîn a 2011ê de bû serokê Bankaya Navendî ya Ewropayê. Mario Draghi da zanîn ku ew ê garantîya temamî ya Bankaya Navendî li tenê bide otorîteyên neteweyî ku bi temamî serê xwe ditewînin li hemberî ferzên “troîka”yê. (4)

Bi vî rengî ji destpêka krîzê û vir ve, Ewropayê bê navber nîşanên xisletên rejîmeke otorîter dan. Hikûmetên hilbijartî yên bi darê zorê îstîfa li wan tê ferzkirin û li şûna wan bicîhkirina teknokratên ku tu rewabûna wan a demokratîk tuneye; desthiladarîyeke bi tevahî ya sazîyên qaşo “bêalî” yên weke BNEyê; tunebûna rola Parlementoya Ewropî ku serokê wê yê Alman û sosyal-demokrat, **Martin Schulz**, bê encam hewl dide rola wê bide qabûlkirin (5); betalkirina referendûman; mudaxeleya sektora şexsî di qada biryardana sîyasî de… da ku mirov vê dînamîka li dijî-demokrasîyê fêm bike, ku bi tenê helwesteke civakî ya mezin di tevahîya parzemînê de dikare wê têk bibe, pêwîst e mirov li nivîskarê dema **Freud** ê bi navê **Antonio Gramsci** binêre, ew jî analîzvanekî jêhatî yê krîza şaristanîya salên 1930î bû.

Li gorî vî ronakbîrê îtalî, di dema krîzên mezin ên kapîtalîzmê de, sazîyên girêdayî hilbijartinan yên weke parlementoyan, ji dika sîyaset û bûyeran dûr dikevin û girîngîya xwe ji dest didin. Berevajîya vê rewşê, şert û merc dikin ku *“helwesta nesabit a hêza burokrasîyê (sivîl û leşkerî), ya sektora fînansa bilind, ya Dêrê û bi giştî helwesta tevahîya rêxistinên ku ne girêdayî guhertinên raya giştî ne”* xurt bibe. (6) Di demeke normal de, tevahîya van rêxistinan bê dudilî kontrolê didin sazîyên demokratîk. Lê di dema krîzê de rewş ne wisa ye: li alîyekî, nakokîyên di nava sazîyan de ji ber hilbijratîbûna wan rewa mezintir dibin û kapasîteya wan a biryardanê ku bilezbûna rîtma sîyasetê ferz dike, lawaz dikin; li alîyê din jî, fikra raya giştî gelekî diguhere û rê li ber tercîhkirina çareserîyên radîkal digire.

Gramsci navê “sezarîzmê” li nîşanên meyilên otorîter yên rejîmên demokratîk di demên krîzê de dike. Di sedsala 19an de û di nîvê yekem yê sedsala 20an de, hêmanên sezarîst bi pirranî di nava artêşan de çêdibin - weke **Napoleon Bonapart**, **Otto von Bismarck** û **Benîto Musolînî** ku sê kesayetî ne, ku vê bûyerê temsîl dikin. Ji xwe navê sezarîzmê ji generalekî karîzmatîk yê romayê tê ku dema çemê Rubîkonê derbas dikir sînorê di navbera ya leşkerî û ya sîyasî de ji holê rakir. Gramsci pêşdîtibû ku mumkun e aktorên ne leşkerî jî vê kiryara “sezar” pêk bînin: mesela Dêr, fînans yan jî burokrasîya dewletê wisa kirin. Weke nimûne nivîskarê *Nivîsên ji girtîgehê* hişyar dike ku neteweya di sedsala 20an de ji Risorgimentoyê îtalî hat afirandin parçe parçe ye: girseyên gelî bi rastî tevlî afirandina vê neteweyê nebûn, ew bi rêya li ser hev de zêdekirina erdên bidestxistî ava bû. Bi tenê burokrasîya dewletê yekîtîya neteweyê misoger dike û bi rola “sezar”ekî radibe ku bêyî wê hêzên aborîya bazarê wê tevahîya neteweyê parçe parçe bikira.

Dînamîkên ku niha li Yekîtîya Ewropî di dewrê de ne, şiklekî sezarîzmê bi kar tînin; ne sezarîzmeke leşkerî, lê belê yeke fînansî û burokratîk. Ewropa hemaneke sîyasî ye ku desthilatdarîya wê parçe parçe ye, bi tenê burokrasîya Brukselê û mudaxeleya fînansa navneteweyî di avakirina çarçoveya aborî ya Ewropayê de û di xebitandina wê de yekbûna wê misoger dikin. Û tiştên ku “pêşketin” ji wan re tê gotin, yên di rêya entegrasyona ewropî de van sê salên dawî bidestxistî, vê xisletê zêdetir derdixin pêş.

Sezarîzm ne afirandineke Yekîtîyê ye. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, hin sazîyên ne demokratîk, dagdehên destûrên bingehîn û bankayên navêndî yên serbixwe jî tê de, li Ewropaya Rojava her çû navendîtir bûn. Hingê êlîtên parzemînê xwedî fikrekê bûn ku li gorî wê, rejîmên totalîter ê “cêwî” – nazîzm û stalînîzm – encama “zêdebûneke” demokrasîyê bûn, ji ber vê yekê jî divê demokrasî ji jirêderketina xwe were parastin. (7) Ji dema avabûna wê û vir ve, projeya ewropî dikeve nava vê mentiqê ku gel dûrî xwe dike. Lê bilezbûna hişk ya ji 2009ê û vir ve pêk tê, ev pêvajo radîkal kir: yekitîya aborî û pereyî bû rêbazeke otorîter a îdarekirina nakokîyên aborî û civakî ku di encama krîzê de derketin holê.

Lewra, yekane tercîha ku maye, êdî alîgirtinekê di pevçûna navbera avakirina ewropî li dijî vegera asta neteweyî de ferz nake, weke ku medyayên serdest û întelektuelên ewro-lîberal dixwazin bawerîya me pê bînin, lê ew tercîhek e di navbera du alternatîfên dijberî hev de: sezarîzm û demokrasî.

* Bi dorê yê pêşî dersdarê aborîyê ye li zanîngeha Paris-XIIIê û yê duyem dersdarê civaknasîyê ye li zanîngeha Paris-Sorbonne (Paris-IV).

(1) Sigmund Freud, *Nouvelles conférences d’introduction à la psychanalyse (Konferansa nû ya danasîna psîkanalîze),* Gallimard, Paris, 1984 (çapa yekem: 1933).

(2) *Bixwîne* Raoul Marc Jennar, “Deux traités pour un coup d’Etat européen” (du Peyman ji bo darbeyeke Ewropî) û “Traité flou, conséquences limpides” (Peymana nedîyar, encamên zelal), *Le Monde diplomatique,* hezîran û çirîya pêşîn a 2012ê.

(3) *Financial Times,* London, 20ê hezîrana 2011ê.

(4) *Financial Times,* 7ê îlona 2012ê.

(5) *Le Monde,* 19ê çileya 2012ê.

(6) Antonio Gramsci, *Guerre de mouvement et guerre de position (şerê tevgerê û şerê helwestê),* deqên di nav *Nivîsên ji girtigehê* de bijartî û ji alîyê Razmig Keucheyan şîrove kirî, La Fabrique, Parîs, 2012. *Bixwîne* “Gramsci, une pensée devenue monde” (Gramsci, fikreke ku bû cîhanek), *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2012ê.

(7) *Binêre li* Jan-Werner Müller, *Contesting Democracy. Political Ideas In Twentieth-Century Europe (Nerazîbûn li hemberî Demokrasîyê. Fikrên sîyasî di Ewropaya sedsala bîstan de)* , Yale University Press, New Haven, 2010.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

www.arsivakurd.org

## Sefaret, mafê penaberîyê û radestkirina sûcdaran

# Gelo Julian Assange hez ji heavy metal dike?

Maurice Lemoine *

Avakirê siteya Wikileaksê ku sala 2010ê bi sedan hezar belgeyên veşartî yên Pentagonê û yê Wezareta Karên Derve raxistin ber çavan û eşkere kirin, Julian Assange li Waşîngtonê ne bi tenê xwedî heval e. Merivê awûstralyayî, wî bêgûman karîbû bi quretî henekê xwe bi desthiltdarîya amerîkî bikira, heke ew ji biryareke binçavkirina ya ewropî netirsîyabûya, ev biryara binçavkirinê ya wezareta gelemperî ya Swêdê ye û di çarçoveya lêpirsîna wî ya li ser îdîaya destdirêjîya cinsî –ku ew red dike– yên li vî welatî ye.

Tevî ku ew li Londonê li xanîyekî di bin çavdêrîyê de dijî, bi fermaneke binçavkirinê li wir hatibû girtin, Dadgeha Bilind a Inglîstanê 14 hezîranê serlêdana wî ya dawî li dijî radestkirna wî ya Swêdê red kir. 19ê hezîranê merivê ku xwe weke mexdûrê komplo û "şideteke siyasî" dihesibîne, xwe dispêre Sefareta Ekwatorê û serî li statuya penaberîya siyasî dide, serokdewlet Rafael Correa jî vê daxwaza wî qebûl dike. Weke kesê herî eleqedar, Quito jî wisa difikire ku di dema dirêj de îhtîmal heye ku Swêd wî radestî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bike. Li gor wezîrê karên derve yê ekwatorî Ricardo Patiño *"rewşa hiqûqî eşkere nîşan dide ku* [di vê bûyerê de] *birêz Assange wê nikarîbûya bi awayekî adil bihata mehkeme kirin, îhtîmala ku ji alîyê mehkemeyeke taybet, yan jî eskerî ve were dadgeh kirin xurt bû, meriv dikare bifikire mimkin e ku zilm lê bihata kirin, rûmeta wî bihata şikandin û cezayê muebedê, yan jî cezayê bidarvekirinê lê bihata birîn».* (1)

Di 15ê tebaxê de hikûmeta brîtanî gef xwarin ku bi darê zorê bikeve Sefareta Quitoyê, û bi vî rengî Peymana Vîyanayê ya li ser têkilîyên dîplomatîk (18ê nîsan 1961ê) ku destnedana Sefaretan misoger dike, bin pê kir: *"Divê hûn pê bihesin ku Brîtanyaya Mezin xwe disipêre qanûneke heyî, ya Diplomatic and Consular Premises Act a sala 1987ê* (2) *ya ku destûrê dide em niha birêz Assange di avahîya Sefaretê de binçav bikin.(3)*" Ekwator bi awayekî hişk bersivê dide –*"Em kolonîyeke brîtanî nînin!"*- Lê London dev jê bernade: Eger gavekê biavêje derveyî sefaretê ew ê *Assangeê* binçav bikin.

Me helwêsteke nermtir a Ingilîstanê dîtibû! Belê li Londonê bû ku di 17ê çirîya pêşîn a sala 1998ê de generalê şîlîyî Augusto Pinochet hatibû bin çav kirin. Ji bo wî jî daxwazeke radestkirinê hebû ku dadgerê spanî Baltasar Garzón bi jimartina nod û yek welatîyên spanî yên mexdûrên dîktatorê qaşo dixwest wî mehkeme bike.

Odeya Lordan red kiribû ku mafê destnedana dîplomatîk bidin generalî, serokdewletê şîlîyî Eduardo Frei û hikûmeta wî ya navend-çepê bêyî ku navberê bidin, timî doza radestkirina kevne-dîktatorî kirin. Wê demê wezîrê karên derve yê sosiyalîst José Miguel Insulza, bêhenek piştgirîya vê yekê dike: *"Li Spanyayê, wê Agusto Pinochet nikarîbûya aram bihata dadgeh kirin lewra rewşa welat tevlîhev bû"*, lê li Şîlîyê ew ê bikaribe bi awayekî "bitesîrtir were dadgeh kirin". (4)

Kevne-serokwezîra brîtanî Margaret Thatcher ku girtina generalî weke tiştekî *"zalimane"* û *"neadil"* didît, dadgerê spanî Garzón bi "*tevgera bi şêwra komek marksîstan*" gunehbar dikir. (5) Ji xeynî nêzîkbûna wan ya îdeolojîk, Pinochet qencîyên pir bi rûmet jê re kirin, bi rêya di paş perdeyê de alîkarîdana wê di şerê Malvînê de ku sala 1982yê di navbera Inglîstan û Arjantînê de qewimî. Waşîngtonê bixwe jî tercîh dikir "hevalê wê yê kevin" Pinochet bişînin Şîlîyê.

Dema di çirîya paşîn a 1999ê de Dadgeha Bilind a Brîtanî radestkirina wî erê dike, "komîteyeke krîzê" ya veşartî ku Washington, London û Madrid tê de bûn, rêyeke çareserîyê dibîne: Raporek ji alîyê sê doktorên brîtanî ve amadekirî ku Londonê ew wezîfedar kiribûn, digihêje wê encamê ku ji ber *"rewşa hesas a tendûristîya wî"* Pinochet nikare derkeve pêşberî dadgehekê. Ango 3yê adara 2000ê cîhanê li sehneyeke nedîtî şahidî kir: Li ser rêya balafirgeha Santiagoyê li Şîlîyê, daketina "yê li ber mirinê" di kursîyekî bi teker de, bi awayekî xurt radibe şipê û silavê li hevalên xwe dike ku hatibûn serdana wî. Tevî ku hiqûqa Juan Guzman ewqasî hewl da ku general were radest kirin jî, ew di 10 kanûna 2006ê de mir, bêyî ku neçar bimîne bersiva pirsên li ser sûcên xwe bide. Li gor dadgerê Dadgeha Bilind ya Spanyayê Carlos Castresana yê ku sala 1996ê yekem gava gunehbarkirin û dadgehkirina wî avêtibû, nasnameya kesên ku ew xilas kirin dîyar e: *"Gelekî eşkere ye ku ew Tony Blair, José María Aznar* û *Eduardo Frei in. Wan baş dizanî heke general vegerîyaba Şîlîyê wê nehata dadgeh kirin. »* (6)

Li Amerîkaya Latîn, meriv ji bîr nake. Serokdewletê Hondurasê Manuel Zelaya di bîra merivan de ye, ew bûbû mexdûrê darbeyekê. Ew 29 ê îlona 2009ê bi dizî vegerîyabû welatê xwe û xwe spartibû Sefareta Brezîlyayê, dor li sefaretê hat girtin û dîktator Roberto Micheletti gef lê xwarin bi "jidestdana statuya wê ya Diplomatîk". Bûyerên Karakasê yên 12 nîsana 2002yê qewimîn hê di bîra merivan de ne. Erefa darbeyekê armanca wê dawînanîna li desthilatdarîya serokdewlet Hugo Chávez bû, girseyeke rasta tundraw hewl da bi êriş bikeve hundirê nûnerîya dîplomatîk a Kubayê, erebeyên wê texrîb kirin, av, eletrîk û telefona avahîyê qût kirin û avahî kirin bin muhasareyê. Birêz Henrique Capriles Radonsky –namzedê rastgiran di hilbijartinên serokdewletîyê yên 7ê çirîya paşîna bê de– qaşo wê avahîyê bide lêkolîn da ku şopa endamên hikûmetê yên li spartibûnê tê de bibîne. Sefîr Germán Sánchez Otero yê di odeyeke avahîyê de bicîhbûyî, qûretîya xwe bi van gotina dide ji bîr kirin *"Kubayê çil salan li ber xwe da li hemberî Împaratorîya herî bi hêz a cihanê, em ê di vê meseleê de nehêlin desthilatdarîya xwe bidin bin pê kirin!*". (7) Navcîtîya nûnerê Norwêcê û …vegera serokdewlet Chavêz dawî li vê êrişê anî.

Di encama vê serpêhatîyê de, dîktatorê demeke kin Pedro Carmona, hatibû sûcdar kirin, di mala xwe de hatibû binçav kirin, ji wir rêvîyabû û xwe avêtibû bextê Sefareta Kolombîyayê ya li Karakasê. Tevî giranbarîya sûcê wî, hikûmeta bolîvarî destûra birina wî heta balafirgehê dabû, ew ji wir siwarê balafireke Arteşa Kolombîyayê bû û çû Bogotayê, li wir "mafê pernaberîya siyasî" bi dest xist û tevî ku Karakas hê jî doza vegera wî dike, ew jîyana xwe li wir didomîne.

Endamên Yekîtîya Neteweyên Amerîkaya-Başûrî (Unasur), ku her şewazê fikra siyasî tê de heye, îro piştgirîya Quitoyê dike û behsa hebûna heqê desthilatdar a dayîna statuya penaberîyê ya dewletan dike. Di nav Rêxistina Dewletên Amerîkî (RDA) de, ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pir bandorê lê dike, ev piştigirî ewqasî xurt nîne. Birêz Insulza, Sekreterê giştî yê RDAyê, kevne wezîrê karên derve yê Şîlîyê, yê Ekwador bandorê lê dike, ji hindav de hişyar kir ku nîqaş nikare li ser mijara "mafê statuya penaberîyê" be, lê belê divê li ser "qedexebûna bê destûr ketina nav avahîyên dîplomatîk" be. Piştî ku bi daxwaza Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê "gefa" brîtanî li Quitoyê bi dawî anî, (8) di 24ê tebaxê de rexistin wê bigihîje "lihevkirineke meriv dikare pê qayil bibe" ya "alîkarî û piştgirîyê" bi Ekwadorê re.

Gelo Waşîngton zehmetîyê dikşîne têgehên mafê penaberîyê û radestkirina sûcdaran têbigihe? Luis Posada Carriles li Mîamîyê dijî. Karakas û La Havana doza radestkirina wî dikin ji ber ku wî sala 1976ê bombe di balafireke Cubana de Aviación teqandibû (heftê û sê kes miribûn), ji girtigeheke Venezuelayê revîya û ji ber ku sala 1997ê rêzeke êrişên terorîst li Kubayê organîze kiribû. Li Amerîkayê, hevalên wî birêz Gonzalo Sánchez de Lozada, kevne-serokdewletê bolîvyayî ku La Paz dixwaze wî ji ber sala 2003ê tepisandina gel bi rêya şidetê dadgeh bike (hingê şêst û heft kes hatin kuştin); birêz José Antonio Colina, eskerê muxalif ku berpirsîyarê êrişên bi bombe yên li dijî sefaretên spanî û kolombîyayî yên sala 2003ê –hê serê pêşî çapemenîyê ev guneh xistibû stûyê partîzanên serokdewlet Chávez; ji bo komkûjîya Mapiripánê li mîralay Hernán Orozco yê li Kolombîyayê çil sal cezayê girtîgehê hat birîn, (12ê tirmeha 1997ê). Meriv dikare vê tabloyê bi lîsteyeke bêdawî dirêj bike...

Swêd dixwaze Assange di çarçoveya lêkolîneke li ser binpêkirineke hiqûqa hevpar de bo wê were radest kirin. Armanca serokdewlet Correa ne parastina wî ji dadgeha vî welatî ye. Ew bi tenê dixwaze bê misoger kirin ku wê rojnamevanî neşînin welatekî din –ango neşînin Amerîkayê. Ji ber ku ev garantî nayê dayîn, ji xeynî dana destûreke birina wî heta bi balafirgehekê, tiştên din zehmet xuya dikin. Gelo wê qedera Assangeê bibe weke ya kardînalê komûnîst Jozsef Mindszenty, yê di navbera 1956 û 1971ê de panzdeh salan li Sefareta amerîkî ya Budapestê jîyana xwe domand? Yan wê heman tiştê ku sala 1989ê hatibû serê kevne-general Noriega, bê serê wî jî: Wî xwe spartibû nûnerîya Dêrê li Panamayê da ku xwe ji eskerên amerîkî yên welatê wî dagîr kiribûn, biparêze. Li wir neçar mabû desîbelên guhên meriv ker dikin yên hoparlorên bi hêz ku bîst û çar saetan mûzîka rockê diweşandin bibihîse. Piştî yanzdeh rojan, nikarîbû xwe bigire. Gelo di rewşeke wisa de wê şênîyên taxa bijare ya Knightsbridgeê li ser vê rêbazê çi bifikirin!

* Rojnamevan

(1) BBC Mundo, London, 17ê tebaxa 2012ê.

(2) Qanûn sala 1987ê di bin şertên pir teybet de hat erê kirin: Kuştina polîsekî bi guleyeke ji Sefareta Libyayê hatî berdan.

(3) *The Guardian,* London, 16ê tebaxa 2012ê.

(4) *Le Monde,* 3yê kanûna 1998ê.

(5) *El País,* Madrid, 7ê çirîya peşîna 1999ê.

(6) *El País,* 13ê kanûna 2006ê.

(7) Maurice Lemoine, *Chávez Presidente! (Serokdewlet Chávez!),* Flammarion, 2005.

(8) Bi tenê Kanadayê, ku endama Commonwealthê ye, ev metin mohr nekir.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 20x60cm

# «Bikêriya» dibistanê, meseleyeke siyasî û perwerdeyî

Sandrine Garcia *

Ji sala 2002'an ve, perwerdeya neteweyî bûye meseleyeke germ ji bo kar û çalakîyên yasayî : hilweşandina sazîyên zankoyî yên amadekirina mamosteyan (Instituts universitaires de formation des maîtres : IUFM) herwiha torên taybet bo alîkarîya xwendekarên destteng (RASED), venihêrîn û jinûve nirxandina rêbazên xwendinê, bicihkirina «saetên piştgirîyê» li şûna dersên sibeha şemîyan, hwd.

Rêjeya sernektin û lawazîya li zankoyê, her wekî rêza xwendekaran a li gor netîceyên wan ên di nirxandina qabilîyetên dibistana seretayî de, hergav wekî delîl têne pêş da ku meşrûîyeta wan reforman were çespandin ku dixwazin « bikêrîya/kêrhatîbûna » baştir û bilindtir bikin. Zêdekirina amraz û îmkanan da ku xwendekarên lîseyê yên ji çîn û texên nizm bi rengekî hêsantir têkevine zankoyan, û herwiha, berî vê di sala 2007'an de, pîlana serkeftina di lîsansê de ku bi destê Valérie Pécresse'a wezîra Xwendina bilind û Lêkolînê hatibû pêşxistin, ji wan polîtîkayên giştî yên warê perwerdeyê ne ku gelek ketine nav rojevê. Evên dawî bi taybetî girîngîya berbendkirina sernekeftinê û tembelîya li dibistanê nîşan didin, her ji qedemeya baxçê zarokan ve ku du saetên piştgirîkirinê hatibûne danan. Di dibistana seretayî de, wê îmkanê berbelav dikin ku jê re dibêjin « refaqeta perwerdeyî » û herwiha, bernameyên « serkeftina li dibistanê » jî lê hatine zêdekirin.

Heke tê de birreke nakokîyên girîng nebana, me dê bes raya xwe bidayê û pesend bikira ev hewla karîgerkirinê. Lewre, em dizanin ku kiryar û îmkanên pedagojîk ên li baxçê zarokan tesîreke girîng heye li ser cudatîya fêrbûn û serkeftinê, û dîsa tê zanîn ku hêj di dersa amadeyîyê de, berî her çi fêrkirineke xwendinê, newekhevîya asta xwendekaran aşkera ye. Gava xwendekar têne dibistana navîncî heke hêj jî kêmasîyên wan ên mezin hebin di vî warî de û rastnivîsa wan baş nebûbe, hingî xwendina wan her bêtir paş dikeve, bi taybetî gava ku îmkanên dayik û bavên wan nebin ku zehmetî û kêmasîyên zarokên xwe bi rê û rêbazên din çareser bikin. Lewma birêkxistina wext û çalakîyên cuda yên perwerdeyî şert e ji bo kêmkirina van newekhevîyan, lewre her ku diçe zêdetir dibin.

Lê belê, her ku şert û taybetîyên meydana xwendinê aşkeratir dibin, dayik û bavên xwendekarên «baş» (ewên ku qabilîyetên wan ên destpêkî hene di xwendin, nivîsandin û matematîkê de) rêyekê peyda dikin ji xwe re da ku zarokên wan bêtir bi wan xwendekaran re hevaltîyê bikin yên ku dişibin wan. Têketina kolejê [dibistana navîncî] jixwe bûye ew heyama ku êdî stratejîyên bicihkirin û xwejêparastinê pir beloq û acizkertir dibin. Tiştên ku êdî bi asteke destpêkî têne famkirin û hînbûn, êdî nema wisa ne : xwendekar dikevine dû fêrbûna zanyarîyên nû, lê belê herwiha bi nezerîyeyên pedagojîk ên cuda re jî nasyar dibin. Lewma di vê merheleyê de hemû şert berhev bûne da ku rewşên kêmasîyên perwerdeyî aloztir û xerabtir bibin. Ji ber vê yekê ye pêwîstîya bi sazkarî û guhartinên demokratîk ji bo dibistaneke ku hewl dide kiryar û prêzeyên pedagojîk kêrhatîtir û karîgertir bike.

Herçend dereceyên baş ên dibistana seretayî xerantî neke jî ku di qedemeyên paştir de jî zarok dê her serkeftî be, em nikarin veşêrin ku ew bi xwe merheleyeke bingehî ye. Bi yekcarî meşrû ye ku munaqeşe hebin li ser metodan, li ser wextê ku mamoste terxan dikin bo çalakîyên cuda, li ser nezerîyeya pedagojîk ku mamoste dide ber xwe ; lê belê, « bikêrî » an jî « karîgerî », weku di deqên resmî de hatîye şîrovekirin û pêşdîtin, pirrî caran wek têgeheke xapandinê an jî sergirêdanê dimîne.

Bi vî rengî, baxçê zarokan, ku ji ber pêdivîya nirxandina xêr û kêrên wê yên perwerdeyî tê rexnekirin, kêm ji dest neda gava du saetên dersên sibeha rojên şemî hatin rakirin bêyî tu delîl û mentiqeke pedagojîk. Fêrkarîya salane ji 936 saetan dakete 864 saetan. Bêguman, bi vê hilweşandinê re ji bo hinek kesan « saetên piştgirîyê » hatine danan ; pa me'naya wê guhartinê çi ye heke wextê ku bi fêrkarîyê re tê derbaskirin hêj jî dîyarker be di serkeftina perwerdeyî de ?


Heman mentiq di wan reformên li dû hev ên lîseyê de û bi taybetî di wanên herî dawî de jî têne pêş çavan, rakirin û kêmkirina saetan fêrkarîyê bo hemûyan û giştîkirina piştgirîya perwerdeyî û der-perwerdeyî bo xwendekarên destnîşankirî.

Ev hereketa ber bi du alîyan ve di rastîyê de meyleke giran îfşa dike. Wextê zarok û nûciwanan ê derveyî dibistanê bi rêyeke wisa dixine nav çarçowekirineke rastî ku qerekter û wesfê pedagojîk ê wê rê û rêbazê têra xwe ron û teqez nîne. Di navbera 1990 û 2007'an de, şeş te'mîm hatine derxistin ji bo wê, herwiha tedbîrên bi yasaya 18'ê çileya 2006'an a li ser hevahengîya civakî bi meseleyê re pêwendîdar in. Di resmîyetê de, aşkera ye ku serkeftina perwerdeyî ye armanca van sazkarî û guhartinên « refaqeta perwerdeyî », ku hatîye terîfkirin wekî « *tevahîya kiryar û çalakîyên ku dixwazin, li rex dibistanê, wan piştgirî û îmkanan dabîn bikin ku xwendekaran pêdivî pê heye ji bo serkeftina li dibistanê, îmkanên ku ew di derdora xwe ya malbatî û civakî de peyda nakin* ». Wekî ji bo nermkirina nexşeya perwerdeyî [sîstemeke dîyarkirina dibistanan e ji bo xwendekaran li gor taxa ku ew lê dijîn], hikûmet bi tenê dide dû polîtîkayeke hişk ji cerga salên 1980'yan, ku çarçoweya teorîk a wê polîtîkayê, ji hizr û pêdaçûneke pedagojîk a li ser bikêrîya metodên fêrkarîyê zêdetir xwe dispêre klîşeyan (« *evîna fêrbûnê* », « *xweşîya keşfkirinê* », hwd.).

Lê belê, îmkanên refaqeta perwerdeyî bûne mijara nirxandin û gengeşîyan, û netîceya wan nirxandinan wisa dide xuya kirin ku tu reasteqînî û maşrûîyeta wê girîngîya zêde nîne ku polîtîkayên giştî didine wan îmkanan. Weku sosyolog Dominique Glasman dibêje, (« *wisa dîyar e ku nabe em li bendê bin ku refaqeta perwerdeyî ji pedagojîya qerebûyê ya ku zemanekî li Dewletên Yekgirtî hate sepandin zêdetir û baştir encaman bide ; yanî kêm encam û pêknehatina tu daxistinekê di ferqên serkeftinê de.* » Hetta wisa difikire ku tê heye ev rêbaz « *ji ber pêşhat û pêvajoyên nepayî, bibin sebebê pîjkirina demxekirinê/stîgmatîzasyonê, carinan bibin binasê pêkhatina cudakarîyan di navbera xwendekaran de, bi taybetî heke zêde kêrhatî nebin ji bo piştgirîya li xebitînê* ».

Li pişt van nakokîyên di navbera îştixala ragihandî –baştirkirina bikêrîyê– û berfirehkirina tedbîrên ku destkeftên wê cihê munaqeşeyan e, mentiq û sebebên civakî xwe didin der. Ev rê û rêbaz dixwazin, bi rêya refaqeta perwerdeyî, destkeftên ji ber şertên malbatî yên xwendekarên serkeftî telafî bikin. Bi rengekî nihênî, ev rêbaz wê fikrê red dike ku sinif dikare bibe cihê ku zarok dikarin kilîla/mifteya « serkeftin »ê bi dest bixin – yanî wê mentiqa ku ewelîyetê dide pêvajoyên fêrkarîyê red dikin. Bi pêçevane, qanûna refaqeta perwerdeyî, li ser prêzeyên/pratîkên malbatî hatîye danan : jinûve îmalkirin û zarîkirina wî tiştê ku avantaja perwerdeyî dabîn dike ji bo çîn û texên civakî yên halxweş.

Bi vî rengî, wezîfeya pêkanîna yeksanî û demokratîzekirinê, ku bo demeke dirêj wezîfeyên dibistanê bûn, têne spartin li hinek akterên ku paşxane û binghea wan cihê gumanê ye. Herwiha, berpirsyarîya têkçûn û tembelîya li dibistanê jî dixine ser stûyê malbatan. Dîyar e ku sersebebê vê vederkirina berpirsyarîyê sebebekî aborî ye, lewre bihayê refaqetê dadixe asteke esxerî ji bo dewletê. Lê belê ne ewqas mentiqî ye : dîsa her li dibistanê ye ku zarok wextê xwe yê herî bikêr lê dibuhurînin û derbaskirina wî wextî bi çalakîyên xwendin û perwerdeyî ji wan re ji her tiştî xêrtir e. Mirov dikare bi rihetî bêje ku dayik û bavan ew maf heye ku ji dibistanê bixwazin û li hêvîyê bin ku ji bo hemû xwendekaran kêrhatî be, ku dibistan herwiha wan tiştan bike ji bo xwendekaran ku wan (dayik



Parwez Zabihi: **Bênav**, parçeyên textan li ser kitanê, 30x30cm

û bavan) bi xwe hergav îmkana (ne jî wext) kirinê nîne.

Derbarê qerebûkirina « handîkapa » hinek malbatan de, dîsa alîyên meseleyê têra xwe ron û deqîq nînin : bi rastî tiştê ku dike ku xwendekar di xwendinê de serkeftî bin ew çîrok in ku dayik û bav ji wan re her şev dixwînin, mîna ku hinek ji rêbaz û sazkarîyan ferz dikin ? Aya ev zarok *bi tenê* ji « nasyarîya » bi tişteyên çandî yên mîna kitêbê îstîfadeyê dikin ? Tê heye ku em bi rengekî xwezayî wisa bifikirin, lê belê ma gelo hingî em nakevine nav xeletîya zêdebawerbûna bi qencî û ni'metên « pedagojîya nedîyar » ?

Lêkolînên li ser prêzeyên dayik û bavan nîşan didin ku çîn û texên civakî yên navînî û raser jî carinan qet dudilîyê nakin ku derbarê perwerdeya zarokên xwe de hereketên « ofansîf » bikin : di hinek rewşan de, rehendên wan ên teknîkî jî tê de, gava zehmetî pir aşkera dibin û zorê didin wan, mesûlîyeta fêrkarîya zarokên xwe digirine ser xwe. Ne tenê kitêbin hene di destê wan malbatan de ku zarok carinan çavekê lê digerînin… belku hinek ji wan malbatan kitêbên dersan dikirin û hinek mijarên dersan zûtir fêrî zarokên xwe dikin. Gava malbat bi vê dereceya berfireh têne hisêbkirin di pêvajoya perwerdeyê de, ku gelek caran wisa ye di tedbîr û rêbazên perwerdeyî yên derveyî dibistanê de, girîngîya vî rehendê/alîyê teknîk tê mînîmîzekirin, lewre, bi rengekî ku li berevajî hêvî û menfaetên çînên nizm bin, rehendên teknîk girîngîya hêmanên bingehî yên alîkarîya der-dibistanî wernagirin.

Prensîba « perwerdeya malbatan » û ya derdorên « li rûyê çandî ve lawaz », bo numûne, di rêbazekê serdest derhat ku li sih û heft kolejan hatibû ceribandin. Desteyek ji Zankoya Aborîyê ya Parîsê (l'École d'économie de Paris), bi rêveberîya Éric Maurin, ku prensîbên navborî nirxandin, gihiştine wê qenaetê ku dê şert e ku malbat bêne têxistin bo nav pêvajoya perwerdeyê û herwiha şert e ku wan serwext bikin derheqê wê rola pozîtîf de ku tê heye ew bi cih bînin di perwerdeya zarokên xwe de. Lê belê cihê pirsyarê ye ka gelo nirxandineke wiha xwe dispêre ser çi ? Di cewher de xwe dispêre ser wê yekê ku ezmûnên navborî îşaret bi baştirbûna têkilîyên malbatan ên bi kolejê re kir, ku êdî malbat bêtir « beşdar » bûn di perwerdeyê de, û bi vî rengî wê beşdarîya wan pêşketinek bi dest ve anî di refdarên xwendekaran de. Lê belê, xeynî ev şêl û refdarên baş ên di jîyana perwerdeyî de, tesîra wê ya li ser pêvajoya fêrbûnê wekî « kêm » hatîye destnîşankirin.

Bêguman cihê xweşhalîyê ye ku arambûn û aştbûnek çêdibe di refdarên xwendekaran de, lê belê, ma gelo bi rastî jî armanca eslî ya sîstema perwerdeyê ew e ku malbatan bielimîne û dîsîplînekê bide xwendekarên « zehmet û neguhdar », di demekê de ku xwendekarên din dersên xwe fêr dibin ?


Li pişt behaneya naskirina dayik û bavan û rola wan a di perwerdeyê de, mentiqeke du-berî xwe dide der : yek, vederkirin û hinartina wezîfeyên dibistanê û du, spartina sebebên sernekeftina li dibistanê li malbatan – yanî li neyeksanîyên mîrata çandî. Ev nejidilîya beramber destnîşankirina dibistanê wekî akterê bingehî yê meseleya serkeftina li dibistanê guhartineke pirr girîng e, di demekê de ku alîkarîyên di çarçoweya RASED'ê de jî têne hilweşandin. Pêşxistina rêbazên refaqeta perwerdeyî wekî lihevhatinekê ye bi mamosteyan re, lewre armanc jê ew e ku kêşe û kêmasîyên dibistanê hewaleyî akterên derveyî sinif û dibistanê bike. Rast e ku ev lihevhatin rê nade pêkhatina dubendîyan bi mamosteyan re, lê belê divê bê pirskirin ka bi rastî kiryareke pedagojîk e an na ?

Pirsa « bikêrî » an jî « karîgerî »yê, ku polîtîkayên dewletî şaş dipirsin, hêj jî wek pirseke bingehî dimîne. Û herwiha cihê şikê ye ku ew « têkilîyên » bi zarokî re ku rêbazên refaqeta perwerdeyî li şûna ders û fêrkarîyan bi cih dike, dê têra qerebûkirin û telafîkirina neyeksanî û bêedaletîyên mîrata çandî bikin. Lê belê, li ser vê bingehê ye ku divê dibistanên giştî bi qirardarî bêne parastin. Lewre herçend « zaroknavendîtî [pédocentrisme] »yê –ku di hinek rêbaz û sazkarîyên perwerdeyî de tê pêşxistin, bi me'naya elaqeya ku tê terxankirin ji bo zarokan, ji bo rengvedan û kêfxweşîya wan, û fealîyetên wan, hwd., bêyî karîgerî û bikêrîya pêvajoya dersan û fêrkirinê– pêdivî bi qabilîyetên dîyar nebe jî, tam berevajî vê, ji bo raguhastina zanyarîyan bi rengekî herî yeksan, pêdivî bi gelek qabilîyet û pêdaçûnan heye.

* Dersdara sosyolojîyê ya zankoya Paris-Dauphineê

Wergera ji fransî : Ergîn Opengîn

www.diplomatiquekurdi.org










Çirîya pêşîn 2002

Mentiqa şerî

# Rewşa kurdan a berî şerî

Michel Verrier *

**Heke herêmek hebe ku hêvîyê ji midaxeleya Amerîkayê li Iraqê dike, ew Kurdistana Iraqê ye. Xewna Kurdên Iraqê damezrandina komareke demokratîk, laîk û federal e ku ew jî di nav çarçoveya wê de li dawîyê bigihîjin xweserîya ku berî sîh salan soza wê ji wan re hatibû dayîn. Kurdên Îranê jî li bendê ne ku pareke mezin ji desthilata navendî wergirin. Û Kurdên Tirkîyeyê ku hinek mafên xwe bi dest xistibûn, li hêviyê ne ku bigihîjin rewşeke wek a Kurdên Iraqê. Lê, hêvî carna dibin leylan (serab).**

Nêzîkî Îranê, bajarê Wanê yê bi meyîleke nerm dadikeve ber lêva gola ku bi 37 000 kilometreyên çargoşe wek behreke navxweyî ye. Aramîya ku ji dawîya şerê di navbeyna arteşa tirk û gerîlayên Partîya Karkerên Kurdîstanê (PKK) de û vir de li deverê pêk hatiye li ber çavan e û ew der, di bin dorgirtin û parastineke tund a leşkerî de ye.

**Hamdî Demîr**, birêveberê partîya alîgira Kurdan HADEPê ku rûbirûyê gefa girtinê ye, bi henek dibêje, *«artêş li vir e, hema bi tenê ji ber ku em kurd in û ev yek ne tiştekî baş e»*. Ev zelamê şêst salî, bi kincên xwe yên sê-parçeyî wek aqilmendekî ye û gotinên wî zelal û bi tesîr in.

Ji gundên herî piçûk bigire heta bajarên herî boş, xanîyên bê sêlên satelîtê tunene. Malbatên kurd yên li rojhilatê Tirkîyeyê li ***Medya TV***yê, televîzyona ku hikûmeta Enqereyê « nêzîkî PKK yê » dihesibîne, temaşe dikin. Enqere di warê leşkerî de bi ser ket. Piştî ku **Abdullah Ocalan** li sala 1999ê hat girtin û bangî PKKyê kir ku şerî rawestîne, gerîlayên ku ji destpêka sala 1980ê vir de berê xwe dabû çîya, xwe berhev kir û vekişand bakurê Iraqê. Lê, dewleta tirk a ku bi salan hewil da ku sêlên satelîtê desteser bike, şerê medyayê, şerê ekranan jî dest da. Leşker rêyan kontrol dike, lê ne asîmanan.

Bi qasî deh xwendakarên keç û xort, li odeyekê ku dîwarên wê bi berikan û wêneyên rêberên kurdan ve neqişandî ne, çayê vedixwin û qala serpêhatîya tevgera xwe ya ji bo zimanê kurdî dikin. Ew tevger ji zivistana bihorî û vir de li pêncî û sê zaningehan belav bûye. Ji wan, Huseyînê 20 salî dibêje,*«Daxwaza me zelal e : Em mafê fêrbûna zimanê kurdî dixwazin wek zimanê duwem, mîna ingilîzî, îspanyolî, farisî û erebî. Em nabêjin bila li şûna zimanê tirkî ew bibe zimanê xwendinê. Hikûmet, ji bo ku me li ber çavan reş bike, daxwaza me wisa dide nişandayîn. Li Wanê, me 2000 îmze berhev kiribûn. Me xwest ku wan pêşkêşî serokê zaningehê bikin. Lê, wî xwest ku her xwendekarek bi serê xwe wê daxwazê bike».*

## Dawîya şerê gerîla li Tirkîyeyê

Biryar pîştî du mehan hat dayîn: *«Tevgera we, xebata PKKyê ye.»* Gelek rêberên wê dozê ji zaningehê hatin avêtin û girtin û avêtin zindanê. Piştî greveke birçîbûnê ya meha gulanê, hinek ji wan ji alîyê dadgeha ewlekarîyê ya Stenbolê ve hatin mehkemekirin û li 18yê meha tebaxê hatin cizakirin. Lê di vê navberê de, Parlamentoya Enqereyê mafê xwendina bi zimanê « kêmanîyan di dengdana 3yê meha tebaxê de pejirand. Ew perçeyek bû ji jimareke qanûnên bi mebesta lihevanîna qanûn û destûrnameya Tirkîyeyê li gor *«Krîterên Kopenhag»*ê, şert û mercên ku welatên namzet divê bi cîh bînin ji bo ku bibin endamên Yekîtîya Ewrûpayê. Lê, li gorî teksta fermî, perwerdeya *«bi ziman û devokên ku tirk pê diaxivin»* –gotina qanûnê wisa ye, peyiva « kurdî » hê jî tabû ye– dê di qursên taybetî de bimaya û divîya *«ders li dijî bingeh, destûrname û qanûnên Komara Tirkîyeyê nebin û li hember yekitîya welat û milletê tirk nebin xeter»*. Bi van her du xalên dawîyê, dikarin qanûnê bêmane bikin.

Di dema sohbeta me digel wan qîz û xortên li Wanê de, ew li ser guhartina stratejîya PKKyê dipeyivin. Bi rêya Medya TVyê, piranîya wan, qonaxên guhartina di dîroka partîya serhildayan de şopandine. PKKyê şerê gerîla bi dawî anîye û li şûna wî, ji xwe re stratejîyeke pêkanîna demokrasîyê li her çar welatên ku kurd lê dijîn – Tirkîye, Iraq, Surîye û Îran – danîye. Damezrandina KADEKê (Kongreya Azadî û Demokrasîya Kurdîstanê) bi kêrî wan dihat. Ji wê koma gencan,Cemal bala xwe daye ser pirtûka ku Abdullah Ocalan li hucreya xwe ya li girtîgeha girava Îmralîye nivîsîye. Ew xort dibêje, *«Dinya tê guhertin, divê em jî li gorî dema xwe bijîn. »*

Herêma kurdan bi dehan salan di bin bireveberîya rewşa awarte de bû, ew di 20ê meha xizîrana sala 2002yê de, sê salan piştî dawîya şerê gerîla hat rakirin. Lê dîsa jî, heta çar mehên din li Dîyarbekir û Şirnexê berdewam bû. Mirov bi wê guhartinê nahese. Li Çewlîgê (Bingol), sîh komele û rêxistinên siyasî 2yê meha tîrmehê rewş wiha nirxand:*« Her çiqas birêveberîya rewşa awarte berî sê salan li vê derê hatibe rakirin jî, zordestîya li ser dezgeh û rêxistinên demokratîk berdewam e.»*

Li Wanê, rêjeya bêkarîyê ji sedî 80 ye. Bajar bi kesên ji gundên valakirî tejî ye, ew li kampan dijîn. 520 gund hatin wêrankirin ji ber ku gelê wan bi piştevanîya gerîla dihatin tawanbarkirin, ji wan bi tenê 90 gund teslîmî xwedîyên wan kirine. Ji bo yên din, hikûmeta Enqereyê dixwaze gelek ji wan gundan bike yek û xelkê wan li avahîyên nû bi cîh bike ku ji zeviyên gelekan dûr in. Gundî wê yekê red dikin û li bajarê dimînin, îcar ew ne dikarin çandinê bikin, ne jî ajeldarîyê bikin ku du çavkanîyên sereke yên debareya xelkê herêmê ne.

Mîlîsên nobedarên gundan ku ji eşîrên alîgirên Enqereyê li dijî gerîlayan hatine hilbijartin hêj li ser karê xwe ne û hinek caran erdê malbatên bêcîhûwarkirî desteser dikin û ew yek jî rewşê aloztir dike û acizîyê zêde dike.

Bîst salên şer û bi dehan salên birêveberîya leşkerî û rewşa awarte li ser herêmê, hûteke burokrasî û leşkerî pêk anîye ku eşîran û mafyayê hêlîna xwe tê de çêkirîye. Piştî bidawîhatina şerê gerîla jî, guhartin zehmet e. Ew nobedar li dijî hindê ye ku kurd li herêma xwe, an li Enqereyê di dezgehên komara tirk de bibin xwedî desthilat. Çaverê ne ku hilbijartinên parlamentoyê di 3yê çirîya paşîn de werin lidarxistin, dengder dê kîjan partîyê hilbijêrin? Ji bilî Partîya Dad û Pêşveçûnê (AKP, partîya nermrê ya îslamî) û DEHAPê, partîya bi ser kurdan ve a ku şûna HADEPa jêrgefa daxistinê girt, di lêkolînan de li pêşîyê ye, lê daxwaznameyên namzetîyê yên piranîya rêberên DEHAPê hatine redkirin. Ji ber ku ew her du bi hev re bi taybetî rêberên leşkerê tirk aciz dikin ku hemû hêz di destê wan de ye. Mudaxeleya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî li dijî Iraqê vê payîzê an zivistanê dikare rewşa li Tirkîyeyê wisa bihêle û leşker dîsa li pêşîyê bimîne. Tirsa ji têkçûna Iraqê û ragihandina dewleteke serbixwe ya kurdî li ser tixubê wê, mijûlîya herî mezin a Enqereyê ye, ku ji bo beşdarbûyîna di mudaxeleya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî li Iraqê de ku «dê her û her bibe», çar şert danîne li ber Washingtonê: ragirtina deynê leşkerî yê 4 mîlyar dolaran, dayîna pereyan ji bo sistkirina tesîra aborî ya mudaxeleyeke nû, piştrastkirina yekîtîya erdê Iraqê, redkirina dewleteke kurdî an hema bi tena serê xwe kontrolkirina herêma Kerkûkê ya kurdan, ku paytexta wan a dîrokî ye û bi petrolê mişt e.

Serhildana kurdên iraqî ya bihara 1991ê li dawîya Şerê Kendavê û koçberbûna wan a bi mîlyonan mirovan ber bi çîyayan ve, herêma Wanê serûbin kiriye. Kurdên li Tirkîyeyê bêtir bala xwe didin zorbazîya zendan a di navbera Washington û Bexdayê de. **Hamdî Demîr** dibêje, *«Heke mudaxeleya amerîkî bi tenê bi wê mebestê be ku Sedam hilweşîne û dîktatorekî din deyne şûna wî, ew ê neerênî be. Lê heke ew rê bide çareyeke demokratîk li Bexdayê, ew ê çêtir be. Wê gavê Kurdên Iraqê dê berê xwe nedin çîyayan û pena xwe neyînin vê derê...»*

Êşa kurdan sînoran nas nake, ew hevûdu hest dikin. Ji her malbat an eşîrekê, hinek endam li alîyê din ê sînorî ne. Du bira û xwişkeke Demîr jî li Îranê dijîn. Malbatên wisa pir in. Demîr dibêje, *« Jiyan li alîyê din ji wan re hêsantir e, hem di warê aborîyê, hem jî yê çandî de. Ew dikarin bi azadî bibêjin ku ew kurd in. Heta wan karî ku nûneran ji bo parlamentoya Tehranê hilbijêrin. »*

Diruşma "Kurdistana Bakur" li ser erebeyeke li paytexta Îranê tiştekî normal e. Lê mirov nikare hizra tiştekî wisa li Enqereyê bike, li wir peyiva "Kurdistan"ê bi serê xwe têrê dike ku mirovî biêxe nav belaya dadgehê.

## Hêvîyên li Îranê

Ji 70 mîlyon şênîyên Îranê, bêtir ji 10 mîlyon kurd in. Ew ji xwe xwedîyên gelek ji wan mafan bûn ên ku kurdên li Tirkîyeyê heta vê havînê ji wan bêpar bûn. Navenda Çanda Kurdî ya li Tehranê li dawîya meha gulanê ya 2002ê, yekem konferansa zanyarî li ser hînkirina zimanê kurdî li dar xist. Kesekî nêzîkî serokê Îranê **Mohamed Xatemî** di civînê de bejar bû û bangî beşdaran kir ku pirtûkekê li ser fêrkirina kurdî amade bikin.

Berpirsiyarê navendê **Behram Valadbegî** dibêje, *«Têkoşîna me demdirêj e, kurdên Îranê sala 1945ê Komara Mahabadê damezrand ku sala paştir ji alîyê hikûmeta merkezî ve hat herişandin. Em sala 1978ê beşdarî şoreşa li dijî Şahî jî bûn. Lê me dîsa jî mafên xwe nestandin. »*

Wê gavê, pêşmergeyê Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê, yê **Ebdirehman Qasimlo**, dîsa herêma xwe rizgar kir, lê bi dû re Pasdarên Şoreşê yên Îranê êrişî wan kir û ew şikandin.

Lê, her wek li Tirkîyeyê, beşeke giring ji tevgera kurdên Îranê bi temamî dest ji xebata çekdar berdaye. Valadbegî dibêje, *«Ew mijar bi nifşan ve girêdayî ye. Stratejîya me ya nû hesaba guhartinên li dunyayê dike: hilweşiyana diwarê Berlînê, têkçûna dualîtîya dunyayê, globalîzasyon û Înternetê. Ew stratejî li ser bingehê çand, fîlm, ziman û lêgerîyana demokrasîyê ye.»* Xortekî kurd ê bi navê Bextîyar ji Sineyê, dibişire û dibêje, «Me qelem danîye şûna keleşînkofê, lê şer berdewam e.» Bîst û du parlamenterên kurd li parlamentoya Îranê nûnerîya kurdan dikin. Yên ku wek namzedên serbixwe hatibûn hilbijartin û nikarin bi hev re partîyeke alîgira kurdan bidamezrînin. Valadbegî dibêje, *"Lê em dixwazin tev li desthilata merkezî bibin. Em êdî qebûl nakin ku me deynin alîyekî ».* Ew li vir bi dilxweşî li ezmûna kurdên Iraqê mêze dikin ku bûne desthilatdarên herêma xwe. Ji bo kurdên Îranê ew piçekê wek ji nû ve damezrandina Komara Mahabadê ye. Valadbegî bawer dike ku bizava Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî ji bo rûxandina **Sedam Husên**, tedbîrek e :*«Rejîma Bexdayê birayên me ji nav birine û çekên kîmyayî jî tê de tu rê nemane ku li ser wan neceribandine. Û tu garantî tuneye ku ew ê dîsa wan rêyan neceribîne. »*

Bajarê Sine (Senendej) yê 250 kilometreyan ji Tehranê dûr, paytexta herêma ku bi fermî wek Kurdistan tê zanîn a Îranê ye. Li pêşîya avahîyeke mezin a pasdaran, karbidestekî payebilind ê kurd, Keywan, dibêje, *« Ev ne dunyaya me ye, lê em neçar bûn ku qebûl bikin.»* Jina wî, ku çarşefa reş li xwe kiriye, pê re hevbîr e : *« Çek û Slovak qe nebe bi awayekî aştîyane ji hev veqetiyan. Ew bê şer ji hev vebûn. Ma çima mafê me nîn e ku em jî wisa bikin ? Em jî dengê xwe bidin, em jî hilbijêrin... ew maf e. »*

Hêza xwenîşandanên vê derê piştî girtina rêberê PKKyê cîhê matmayînê bû. Xortekî kurd dibêje, *«Li Sineyê 30 mirov mirin. Ew bûyer bi zexta gencan bû û bi sloganên bi piştevanîya **Abdullah Ocalan** dest pê kir, paşê qulipî ser azadîya kurdên Îranê û êrîşî Komara Îslamî kir.»* Hevalekî wî dibêje, *«Berî ku Amerîka Bexdayê dide ber bombeyan, bila di vir re derbas bibe û hinek bombeyan li rejîma me bide.»*

## Têkçûna dewleta Iraqê

Çîyayên rût, bajarokên bi caddeyên bi darên palmîyeyê, rêyên teng. Gava ku mirov nêzîkî sînorê Iraqê dibe, kaloteyên tanq û zîrîpûşên jibermayîyên şerê Îran û Iraqê yê di navbera 1980 û 1988ê de li ber rêya Bexda û Kîrmaşanê rêz bûne. Serbaz li pişt perjanan û torbeyên xîzî nobedarîyê dikin. Li Quasre a Sinji, sînorê Iraqê hefteyê du rojan vekiriye.

Alaya kesk û pembe ya Yekîtîya Niştimanîya Kurdistanê (YNK), partîya **Celal Talabanî** ya ku vê dawîyê tev li rêxistina Enternasyonala Sosyalîst bû li vî alîyê bakurê Iraqê, li her cîhî xwedî hêz e. Devera Kurdan a li ser sînorê Tirkîye û Sûrîyeyê jî di bin kontrola Partîya Demokrata Kurdistanê (PDK), partîya **Mesûd Barzanî** de ye. Piştî şerê bi salan ê di navbera wan her du alîyan de, rewş niha aram e. Di «Şerê xwekujîyê» de nêzîkî 3000 kes mirin. Li gor gotina serokwezîrê hikûmeta herêmê **Berhem Salih** pirsên serekî yên ku Kurdistana xweser du beş dikin, komkirina bacên gûmrikê li ser sînorê Iraq û Tirkîyeyê ji alîyê PDKyê ve û parvekirina wan in, ku ji wan pereyan para mezin digihije herêma li bin kontrola PDKyê.

Lê, xebata ji bo lihevanîna her du partîyan a ji sala 1998ê û vir de a ku London û Washingtonê çavdêrî lê dikir bi dawî hat. Şandeyên ji her du partîyan 6ê tebaxê li *Koyeyê* (Koysenceq) kombûn ji bo jinûve komkirin û xebitandina Parlamentoya Niştimanî ya Kurdistanê ku sala 1992yê hatibû hilbijartin. Paşê, 7ê îlonê, Barzanî li bingeha xwe ya li Selahedîne, xêrhatin li Talabanî kir ku ji serêdaneke bo Washington, London û Enqereyê vedigerîya. Ew tev li civîna opozîsyona iraqî bibû ku kurd, şî'e û efserên leşkerê Iraqê yên ku di van deh salan de ji welatê xwe revîbûn têde beşdar bibûn. Wan her du rêberan li hev kir ku Parlamentoya Kurdistanê li Hewlêrê kom bikin û helwêsta partîyên xwe derbarê paşeroja Iraqê, sîstema federalî, demokrasî û peywendîyên di welatên cîran û qada navneteweyî de bikin yek.

Berhem Salih dibêje, *«Hingî ku Sedam Husên li Bexdayê li ser desthilatê be û hikûmeteke demokratîk a ku Iraqî pênasînê pê dikin û kurd jî tê de hevpar in şûna wî negire, dê rewşa Kurdistana Iraqê her wekî xwe xeternak be. Hikûmeta niha ya Iraqê ji binî ve têkçûye. Ereb jî bi vê yekê dizanin û loma li ser pirsa hikûmetê bi kurdan re dihizirin. »*

Bi porê ku diweşe, bi jestên mezin û xurt, Salihê li temenê 40an li nav bajarê Silêmaniyê dijî, di kolaneke bêdeng a ku her du alîyên wê hatine astengkirin. Pêşmerge nobedarîyê lê dikin. Ew ji êrişeke adara 2002yê filitî. Piştmêrên



wî hatin kuştin. Ji bo parastinê li ber derîyê wî jimareke jîpên nû û wekî hev hatine danîn. Gava ku ew karwana jîpan bi rê ket, mirov qet nizane ka **Berhem Salih** di kîjan erebeyê de ye.

Salih ji her niha de xwe li Bexdayê dibîne û wê hizrê ku heke kurd tev li bizaveke leşkerî ya amerîkî li dijî Iraqê bibin ew ê rîskeke mezin wergirin, wek « reel polîtîka berteng » red dike. Ew nayê menaya beşdarbûna di « nexşe an macerayekê» de. Berovajî Hevalbendîya Bakur a li Afxanîstanê ya berî rûxandina rejîma Talîban, partîyên kurdan ji her niha nêzîkî sêyeka welatî kontrol dikin. *«Sala 1991ê 804 dibistanên me hebûn, hejmara wan niha ji 2700an zêdetir e. Di deh salan de, me du caran bi qasê xwendingehên ku di 70 salan de hatibûn avakirin ava kirine. Me hejmara doktoran çar qat zêde kiriye. Şertên jiyanê li vir ji ya deverên di bin kontrola Bexdayê de pir çêtir in.»* Û ew karbidestê kurd lê zêde dike: *«Kesek bi wê tirsê najî ku polîsên sîvîl dê nîvşev li derîyê wî bidin û wî ji xewê şiyar bikin.»*

Saet 6ê êvarê peyarêyên Silêmanîyê û kolanên bazarê, bi malên ku ji bazara reş ji seranserî dunyayê hatine anîn tijî ne. Buhayê dînarê Kurdistana Iraqê li hember dolarê amerîkî, 10 caran ji yê dînarê Iraqê zêdetir e. Kesên ku pereyan diguhorin gelek in. Banqeyeke navendî ya bajarî heye, lê bi sîstema banqeyê ya navneteweyî ve ne girêdayî ye.

Agahî azad e. Rojname pir in, bi pirranî bi partîyekê ve girêdayî ne. Ew partî her wisa xwedîyên televîzyon û rojnameyan jî ne. Hê zû ye ku mirov behsa rojnamevanîyeke azad bike. Lê mirov dikarin li televîzyona ku dixwazin temaşe bikin û bi dilê xwe li Înternetê binêrin. Rojnameyên PDKyê li Silêmanîyê hene. Lê ji dema şerê di navbera her du partîyan de, nûnerîyeke fermî ya partîya Barzanî li alîyê di bin desthilata Talabanî de tuneye. Nûnerîya fermî ya Talabanî ji li alîyê din nîn e.

**Komareke laîk û federalî**

Li caddeya sereken ya ku diçe bo nava bajarî, otêl û xwaringeh li tenişta wan dikanan in ên ku bi azadî alkolê difroşin. Hinek jin çarşefên reş li xwe dikin, lê gelek jinan kincên «rojavayî» li xwe kirine. Sergirtina jinan ne wek Tirkîyeyê qedexe, ne jî wek Îranê mecbûrî ye. **Salih** dibêje, *«Azadiyên mirovan pêwîst in. Ew di qanûnan de hatine rêzkirin. Divê tu îdeolojîyên resmî awayekî jiyanê li ser mirovan ferz nekin.»* Pirjinî qedexe ye. Kuştinên bi navê namûsê, kevneşopa ku rê dide mêran ku jinên malbatê yên bi têkilîyên li derveyî zewacê bikujin, niha hatine qedexekirin û *«cizayên herî giran didin wan.»* Heman rêbaz li devera jêrkontrola PDKyê jî heye.

Tirkuman, asûrî û mesîhîyên kildanî û her wisa kurdên êzidî, xwedî mafên kêmanîyên nijadî û dînî ne. Ew şert û merceke pêşveçûyîna demokrasîyê ye. Lê, heke mirov guh bide rayedarên Herême Kurdî, li navçeya Helebceyê, li ser sînorê Îranê, ***Ensar el-Îslam*** a ku bi ***el-Qaîdeyê*** ve girêdayî ye li hinek gundan xwe binecîh kiriye, (1). Ev li hember hikûmeta herêmî gefeke giran e. Azadîya bîr û ramanan, sîstema laîk, azadîya bidestxistina alkolê û serbestîya cil û bergan dibe ku rê bide rexneyên kevneperestan. Îcar nexasma li nav hejaran, ku nikarin bi awayê rojavayî ê ku rêber jê hez dikin bijîn.

Lê li zanîngehê tu tesîra îslamîyan ne xuya ye. 6000 xwendekarên xort û qîz ên zanîngehê hene. Babetên zanyarîyê bi zimanê ingilîzî ne û edebîyat, dîrok û coxrafya jî bi erebî ne. Lê ji sala 1991ê, piştî ku kurdan herêma xwe xist bin destê xwe, heta niha, xwendina bi zimanê kurdî li perwerdeya li xwendingehên pêşîn û navîn berfireh bûye. Serokê Zanîngeha Silêmanîyê **Kemal Xoşnaw** dibêje ku li ***Enstîtuya Kurdolojîyê*** ya li zanîngehê ji bo yekkirina zimanê kurdî xebat tê kirin: *"Xewna me ew e ku dest ji alfabeya erebî ya li Iraq û Îranê berdin û li şûna wê, alfabeya latînî bi kar bînin ku ji xwe ji alîyê kurdên li Tirkîyeyê ve tê bi kar anîn."*

**Celal Talabanî** dibêje: *"Piştî ku em bûn pêşmerge û me berê xwe da çîya, bi salan di nav şerî de, me her digot, 'Sala bê, em ê li Kerkûkê bin.' Lê em şaş bûn. Lê vê carê, ez jê bawer im: Sala tê, em ê li Bexdayê bin."*

Bi gotina sekreterê giştî yê YNKyê, dewra Sedam Husên bi dawî tê. Lê heke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî biryara hilweşandina rejima li Bexdayê dabe jî, hê biryar nedaye ka kengî û çawa wê bike. Rêberê kurd dibêje, *«Ji ber ku ev her du xal nehatine zelalkirin, ne mimkûn e ku em bibêjin ka em ê tev li mudaxeleyê bibin an na.»* Talabanî pê de diçe û dibêje: *«Sedam Husên bi temamî ji gelê Iraqê bizdîyaye, ew nikare bi tu awayan sîstemê veke. Li Bexdayê ne ji bo sêlên satelîtê, ne jî bo înternetê destûr heye. Peyiva Serokî qanûn e, her çend e ku ew li dijî hukmê destûrnameya dewletê be jî. Ev bi temamî hukmê bi terorê ye. Heke tu pê razî nebî,ew ê te bi dar vekin.»* Ji 3 mîlyon heta 4 mîlyonan Iraqî, karmend, leşker, rewşenbîr, naçar bûne ku ji ber dîktatorîyê ji welatê xwe birevin.

Talabanî pêşbînîyê dike ku Iraq li paşerojê bibe komareke laîk, demokratîk û federalî. Ew dibêje, *«Em dixwazin ew dewleta nû bi rêya dîyalogê, bi rêyên aştîyane, wekî ku li Ewrûpaya Rojhilatê çêbû, pêk were.»* Parlamentoya Bexdayê li vê dawîyê serokatîya Sedam Husên bi 7 salan dirêj kir. Qaşo hilbijartin dê 15yê çiriya pêşîn werin kirin. Talabanî dixwaze firsendeke dawîn bide rejimê, bangî serokê iraqî dike ku *«desthilata bi yek partîyê bi dawî bîne, rê bide hikûmeteke ku nûnerîya hemû gelê iraqê dike û rê veke ji bo hilbijartinên azad.»* Lê heke ew pêşniyar were redkirin, wê çaxê *"mudaxeleya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dê bivê-nevê be."*

Bizaveke wisa dê bi êrişên hewayî dest pê bike û ew ê zorê bide ser stûnên dawîn ên rejimê, bingehên Nobedarên Komarî, piştmêrên Sedam Husênî. Bi hesaba berpirsiyarê peywendîyên navneteweyî yên YNKyê **Se'dî Pîre**, *«heke wisa be, dibe ku ew du, herî zêde sê hefteyan karibin li ber xwe bidin.»* Kurd bawer dikin ku leşkerê edetî yê Iraqê dê rejimê li hember êrişa Washingtonê neparêze. Ji dema Şerê Kendavê bêtir serbaz ji leşkerîyê birevin û gelek bêtir yekîneyên leşkerî serî hilbidin.

Li gorî opozîsyona Sedam Husênî, wê gavê, ew ê karê Iraqîyan, kurd û ereb her du, hêsan be ku rejimê ji nav bibin. Hêza wê heye ku bi kêmî ve 200 000 çekdaran rake û dixwaze nehêle ku hêzeke mezin a bîyanî were ser erdê wê. Sedî Pîre dibêje ku piştî ku wan paytext û bajarên mezin xistin destê xwe, *«rewş dê hinekê wekî rewşa Almanyayê ya piştî şerê duwem ê cîhanê be.»* Ew 15 salan li Avûstûryayê bû û li karûbarên Almanyayê şareza ye. *"Divê em bibêjin ku endamên Partîya Baas bi awayekî din dê nikaribin xwe xilasbikin. Ew ê bikevin bin qanûna nû ya ku em ê bipejirînin.»* Talabanî dibêje, *«heke rejîma Sedam were hilweşandin, azadî û demokrasî dê were. Her kes dê dengê xwe bide û paşê em ê biryarê bidin. Tekilîyên me yên baş hene bi hemû alîyan re: bi komunîst, sunî, şî'e, nasirî û liberal û demokratan re. A ku gel parçe parçe dike û wan radike singê hev, hikûmeta Bexdayê ye. »*

Rêberê YNKyê bawer nake ku li başûrê Iraqê dê herêmeke tundrê were damezrandin. *«**Mihemed Bakir el-Hekîm**, serokê Civata Bilind a Şoreşa Îslamî, dê sûkên ku alkolê difroshin nede girtin û xelkê xwe neşîne Kurdistanê.»* Wî rêberê şî'e piştevanîya xwe bo sîstema parlamenter diyar kiriye. Û bi ser de jî, gelek şî'e ji radîkalîzmê dûr in. Talabanî dibêje ku niştimanperest û Partîya Komunîst li alîyê şî'eyan li başûrê Iraqê pir bi hêz bûn. Ew li dawîyê dibêje:*«Bêguman, xewna kurdan her tim Kurdistana yekgirtî ye. Lê ev nedîtina rastîyê ye. Ji bo wê, divê hem Iraq, hem Tirkîye, hem jî Îran biguhere. Xewna me Iraqeke demokratîk e. Ka bila pêşîyê ew xewn bibe rastî.»*

Erdhejeke wisa dê welatên cîran biceribîne. Heke kurd xwe bigihînin desthilata li Bexdayê, ew ê doza kurdan li Îran û Tirkîyeyê xurt bike. Damezrandina herêmeke xweser di nav Iraqeke federal de dê ji wan re bibe nimûne. Ew yek Enqereyê ditirsîne ku wî mafî bi xwe ra dibîne ku tev li jinûve damezrandina Iraqê bibe, bi taybetî herêma Kerkûkê, li ser navê kêmanîya tirkuman a ku li wir dijî. Li Silêmanîyê dibêjin, *«Ew ê bibe berpirsîyarîya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî ku rê nede ku Kerkûk bibe Qibriseke nû ».*

Li alîyê din, Îran li ber bi rejima Bexdayê nakeve, ku Dewletên Yekbûyî li dema şerê ku her du welat wêran kiribûn piştevanîya Iraqê kiribû. Heke rêberên Îranê bi endîşe bin ku ew ê piştî Iraqê bibin armanca din a di lîsteya Amerîka de jî, peywendîyên wan bi kurd û şî'eyan re hene ku dê bibin xwedîyên para mezin a hikûmeta nû ya Bexdayê. Û **el-Hekîm** ji salên 1980yî heta niha li paytexta Îranê dijî û lê bisteh e.

Li wê herêmê, li şûna rejima Sedam Husên damezrandina hikûmeteke hevpeymana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî, bi şerê Afxanîstanê re, dê were meneya jinûve belavkirina kartên lîstîkê. Wê çaxê Amerîka dê kontrola *de-facto* ya çavkanîyên petrolê yên Iraqê bi dest xe û rola hevpeymana serekî vejîne ku heta niha ya Erebîstana Seûdî bû. Ew ev lihevhatina bûyeran e ku berjewendîyên stratejîk yên Washingtonê û doza demokrasîyê ya kurdan tîne berhev û wê hêvîya kurdên Iraqê geş dike ku vê carê li per şîpê dê dîsa terka wan neyê kirin. Îcar gelo ew xewn e, an rastî ye?

* Rojnamevan, Berlîn

(1) Rêberekî Ensar el-Îslamê, Mele Kirêkar, meha îlonê ya sala 2002yê li Holandayê hat girtin.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Tugan Kilic



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser kitanê, 30x30cm

## Wênesazê vê hejmarê



## Parwez Zabihi

Parwez Zabihi (60) ji bajarê Bokan ê Rojhilatê Kurdistanê ye. Ji sala 1986ê heta 2007ê li paytexta Îngiltere li Londonê jîyaye û xebitîye.

Hunermend Zabihi, di navbera salên 1986 û 1989ê de li dibistana Huner û Dîzaynê ya Central St. Martin *(Central St Martin School of Art and Design)* xwendiye. Dûre, ji 1994ê heta 1996ê li zankoya Central School of speech and Drama (CSSD) perwerdahîya huner, wênesazî û dîzaynê dîtîye. Di salên 2005 ta 2006ê de jî li Koleja Kensington and Chelsea mamostetî kiriye. Ji sala 2007ê ve li Hewlêrê mamosteyê huner e û dersên li ser hunera brîtanî ya salên 1830 heta 1850 dide.

Hunermend Zabihi di wêneyên xwe de ji bilî tûwalê carna kitanê jî bikartîne. Wênesaz, di wêneyên xwe yên xuyangî de ku wan bi boyaxa rûnî dixemilîne cîh dide dîmenên xwezayî.

Hunermend Zabihi, heta niha li gelek welatan û li gelek pêşangehên navdar ên wek; Zamwa Gallery Suleymanî Kurdistan, Dixon Gallery London, Chelsea Gallery (Solo show) London, King's Cross Gallery ( Installation), Shorditch Gallery London ( Installation), Cable Street Gallery London, Whitechapel Open London, The Nunary London, Kalendburg Library Gallery Denmark û li Holbek Library Gallery Denmark wêneyên xwe pêşkêşî hunerhezên kurd û ewropî kirine.

Zabihi, ji bilî wênesazîyê perwerdahîya wênekêşîyê jî dîtîye û dûre di heman warî de ders daye kursîyeran. Herweha Zabihi ji bo markayên wek Nike, Uniqlo, Janet Ragger şêwirmendîya reklamê kiriye.

Wênesaz Zabihi, zimanên kurdî, farisî û îngilîzî baş dizane.

Ji bo têkilîdanînê;
parwezzabihi@gmail.com

Li Sûrîyê serhildan dewam dike, di heman demê de li cîhana ereb hikûmetên demên guherînê pêk tên û bi cih dibin. Li her deverî îslamîst û li pêşîya hemûyan Birayên Misilman – yên ku dema wan a mezinbûnê heta bi salên 1970yî diçe – ev yek heta li qraltîyên Kendavê jî dibe sedema hin fikaran. Li Fasê desthilatdarî di bin kontrola qrêl de bi rê ve diçe. Li Misrê ji wan hat ku pişta artêşê bidin erdê, lê belê dîsa jî ji hingê ve ew bi gelek zehmetîyan re û bi mixalefeta çalak a beşekê ji civakê re rûbirû dibin. Li Tûnisê, Ennahda, partîya ku hikûmeteke koalîsyonê pêk anî, divê bi liberrabûn û mixalefeta sendîkaya sereke ya welêt re rûbirû bibe.

## Li ser agirên "Bihara Erebî"

# Sendîkaya ku mixalefeta tûnisî ji nû ve bi gewde dike

Hèla Yousfi *

Deh mehan piştî ku ***Ennahda*** bû desthilatdar, (1) Sidi Bouzid, bajarê ku "şoreşa rûmetê" lê dest pê kiribû dîsa bû qada çend xwepêşandanên kesên doza heqên xwe dikirin yên weke cotkar, karkerên avahîsazîyê û bêkaran. ***Yekîtîya Giştî ya Kar a Tûnisî*** **(UGTT)** piştgirîya van çalakîyan kiribû. Di 14ê tebaxa 2012ê de banga greva giştî kiribû, bi vê jî doza tedbîrên pêşketina herêmî û berdana wan bêkaran kiribû ku di xwepêşandanên polîsan bi şiddetê tepisandî de hatibûn binçavkirin. Buroya herêmî ya Ennahdayê bi xwe, peşnîyaz kir ku sendîka û rêxistinên wê dûrî siyasetê bimînin û serxwebûna xwe biparêzin.

Hatina hemberî hev a Ennahda û UGTTyê 25ê sibata 2012ê dest pê kir, hingê qederê pênc hezar kesî li Tûnisê ji bo bersivdana banga navenda rêxistinê tevlî xwepêşandanekê bûbûn. Protestovanan gilî û gazin dikirin ji ber mîlîtanên Ennahdayê çopan diavêjin ber derîyên avahîyên sendîkayê, ev bûyer piştî helwesteke civakî ya karkerên şaredarîyê ku yek ji çînên herî xizan a Tûnisê ye, qewimîbû.

Sekreterê giştî yê UGTTyê, birêz **Houcine Abassi** xwe wisa îfade kiribû *"Ew dixwazin dengê me bifetisînin da ku ew bi tenê biryara paşeroja me bidin. Ew dixwazin me bitirsînin da ku nehêlin em doz û heqên xwe biparêzin, lê em ê li ber xwe bidin û serê xwe netewînin".* Li gorî **Nureddîn Arbawî**, endamê buroya birêveber ya Ennahdayê, UGTT ji alîyê hêzên rejîma kevn ve ku bi israr dixwazin rê li ber kiryarên hikûmetê bigirin, tê manîpulekirin.

Pevçûn 1ê gulana 2012ê di xwepêşandanekê de ku diviyabû armancên civakî û aborî yê şoreşê bi bîr bîne, gihîşt asta herî bilind. Slogana sereke ***"kar, azadî, rûmet"*** nedihat bihîstin, ji ber dengê zêde bilind ê partîzanên Ennahdayê yên ku li alîyekî din diqîriyan "***Bi can û bi xwîn, em ê te biparêzin ey hikûmet!***».

Sami Suihli, sekreterê giştî yê sendîkaya bijîşkan bi bîr dixe ku ev astengkirin ne cara yekem e ku pêk tên: *"Kampanyaya ku UGTT bû armanca wê bi Ennahdayê re dest pê nekir. Rêxistin herwiha bûbû armanca hikûmetên demî yên guhertinê yên piştî bidawîbûna desthilatdarîya kevne-serokdewlet Bin Elî* [ Zîne El-Abidîn ] *de hatî bicîh kirin; Li gorî wan UGTT timî bû gunehbar û berpirsiyarê krîza aborî û ya anarşîya li welêt belav dibe. Ew dixwazin pişta UGTT bişkînin ji ber ku yekane tevgera li dijî-desthilatdariyê ya birêxistinkirî ye."* (2)

Pêncsed û hivdeh hezar endamên wê hêza wê pêk tînin, yekem hêza sendîkayî û demeke dirêj herwiha yekane sendîkaya Tûnisê bû. (3) Karê wê bi piranî eleqedarê sektora gelemperî ye û xwedî bîstûçar yekîtîyên sendîkayî yên herêmî, nozdeh rêxistinên sektorî û bîstûyek sendîkayên bingehîn e. Ew gelek meyilên sîyasî yên cihê reng tîne cem hev û endamên wê li tevahîya herêman û di gelek çînên civakî de – karker, karmend, bijîşk, û hwd. hene. UGTTya ku stûna navmalê ya tevgera neteweyî ya serdema kolonyalîzmê bû, di jiyana sîyasî de timî bi roleke eslî rabû. Ji navendeke sendîkayî û wêde ew dişibe rêxistinekê ku lê dozên civakî bi awayekî dîrokî ji dil û nêz ve girêdayî sloganên sîyasî û neteweyî ne. Ne weke li dewletên din ên ereb bû, berevajî beramberî sazîya dewletê ew timî xwedîyê serxwebûnekê – li gorî serdemê gelekî yan jî hindikî – bû.

Ji dema serxwebûna sala 1956ê ve, di nava sendîkayê de du meyil hene: meyileke ku adeta bi navê "burokrasîya sendîkal" temsîl dike ku serî li ber desthilatdariyê ditewîne û meyileke din a berxwedanê. Ew di dawîya demên krîzê de serdest dibe û hin federasyonên mîna yên perwerdeyê yan jî yê postexane û teleragihandinan û herwiha hin yekîtîyên herêmî xwecihî jî kontrol dike. Burokrasîya sendîkal her çend dudilî be jî, federasyon û baskên UGTTyê pişta piranîya helwestên civakî girtin. Tevî ku qusûrên wê hene – navendîbûna hêza biryardanê, kêm temsîlkirina jinan û sektora taybet an jî kêm temsîlkirina hin herêman weke ***Sahel***ê – ew di grevan de, di kombûn û xwepêşandanên bûyî sedema reva dîktatorî de bi roleke diyarker rabû. Wê bi awayekî xurt destek da dagirkirina meydana ***Kasbah***ê, ku di mehên çile û sibata 2011ê de herdu hikûmetên demî yên guherînê yên pêşî ji desthilatdarîyê xistin.

Ev dîrok destûrê dide mirovî ku pevçûna di navbera ***Ennahda*** û navenda sendîkayî li ser statuya karkerên şaredarîyê baştir fêm bike. Ji cudatîya fikran a li ser bersiva ku divê bidin daxwaza gel wêdetir şerekî siyasî ye yê diqewime. Bi vî rengî di 28ê gulana 2012ê de, serokwezîr **Hamadi Jebali**, di mijara cemidandina lihevkirinên ji bo memûran, di nîqaşeke li ser kanaleke televîziyonê de got, *«Divê her yek ji me li gorî helwest û armanca xwe tevbigere. Divê hertişt neyê mubalexekirin: hikûmet ne dijminê memûr û karkeran e. Em ji vê teorîya têkoşîna çînan bawer nakin. Kesên bêkar zarokên me ne; ne hewce ye em lihevkirinên civakî bikin, ne hewce ye ji bo bilindkirina maeşan zext li ser hikûmetê were kirin, niha tiştên din hene ku ji bo me li pêş in.»* û wisa dewam dikir: *«Armanca wan serîtewandina li hikûmetê ye, nivîsên wan danezanên sîyasî ne, ne civakî ne, ew dixwazin rê li ber me bigirin! Ev hikûmet hêza xwe dispêre rewabûna xwe ya ji hilbijartinan û ji dengê gel tê. Em ê paşve gavê neavêjin.»*

Gelo Ennahda dixwaze UGTTyê bixe bin kontrola xwe, çawa ku partîya-dewletê ya bi navê *Civata Destûra Bingehîn ya Demokratîk* (CDD) di dema **Bin Elî** de desthilatdar kiribû? Tevlîbûna endamên ku di xizmeta fikra îslamîstan de ne, bi taybetî yên ji sektora taybet tên, vê îddiayê piştrast dike. Dîsa jî, buroya birêveber a nû ya UGTTyê, ku di kanûna 2011ê de di kongreya li ***Tabarka*** de hat hilbijatin, şahidîya serketina lîsteya jêre "lihevkirina çepê" tê gotin, kir û bi dengekî bilind xwedî li serbixwebûna xwe derket.

Ji ber ku UGTTyê şûna partîyên muxalîf ên ku ji wan nayê bi rola xwe rabin girtiye, pevçûn gurtir dibe. Wê biryar da ku wê têbikoşe *"bi civaka sîvîl û bi gelê tûnisî yê pirrengî re, ne tenê ji bo parastina girseya karkeran lê herwiha ji bo parastina komar û saziyên wê jî"*. Kombûnên girseyî ku navenda sendîkayî organîze kiribûn ji bo parastina azadîyên şexsî û gilîkirina şîddeta komên piçûk ên selefîst yan jî şîddeta polîs, carinan zêdetir in ji xwepêşandanên civakî. Rêveberên UGTTyê ku her carê rewabûna dîrokî ya rêxistina xwe bi bîr dixin, îddia dikin ku di demên krîzê de ew ê bi biryardarî bi roleke sîyasî rabin.

Di 30ê gulana 2012ê de, alîkarê sekreterê giştî yê UGTTyê birêz **Samir Cheffi**, di televîzyonê de bersiva axaftina serokwezîrê navbirî da û got: *"Em rêxistineke mezin a neteweyî ne ku tevlî têkoşîna neteweyî û civakî bû; UGTT nikare peyameke bi vî rengî qebûl bike. Ev nîşana tunebûna kapasîteya çareserkirina pirsgirêkan e. Ji dema avakirina sazîya me ya sala 1946ê û vir ve em bi rola xwe baş dizanin û em wê bi cîh tînin. Em dev jê bernadin."* Di 18 hezîrana 2012ê de UGTTyê banga avakirina "konseyeke neteweyî ji bo dîyalogê" kiribû ku ji siyasetvan û tevahîya rêxistinên civaka sîvîl pêk tê, armanca wê jî çareserkirina pirsgirêkên aborî, civakî û ewlekarîyê ya welêt bû.

Bi vî rengî di siyasetê de hêdî hêdî du bend çêdibin. Mixalefet ji hin rêxistinên mîna rêxistina lîberal, Partîya Demokrat ya Pêşketinê (PDP) ên ku bi Afekê re bûn yek û navê Partîya Komarperest li xwe kirin, tevgera kevne endamên Civata Destûra Bingehîn a Demokratîk (CDD ) û rêxistinên din ên "demokrat" ku di tevgera ***Nidaa Tounis*** (Banga Tûnisê) de li derdora kevne-serokwezîr **Béji Caïd Essebsi** kom bûn. Par wan UGTT gunehkar dikir bi *"belavkirina anarşîyê li nav welêt"* û niha jî bi partîyên çepa tundrew ên weke ***Watad***ê (Tevgera Welatperwerên Demokrat) yan jî bi Partîya Komunîst a Karkerên Tûnisî (PKKT) re tevdigerin û piştgirîya UGTTyê dikin.

Êdî du fikrên sabît li hemberî hev têdikoşin. Li gorî partîzanên hikûmetê *"UGTT ji alîyê burokrasîya xwe ve ji bo armancên partîzanî yên safî tê manîpulekirin û bikaranîn, eger ew ji xeynî bicîhanîna rola xwe ya sendîkal tevlî tiştên din nebûya, wê jê re baştir bûya"*. Li gorî yên li hemberî vê fikrê radibin, *"divê UGTT serbixwe be û divê di nava siyasetê de bi roleke çalak rabe, weke helwesteke dij-desthilatdarîyê"*.

Di dîroka wê de, daxwazên civakî û aborî yên UGTTyê timî girêdayî helwesta wê ji bo serbixweyî li hemberî desthilatdarîyê bûn û bi vî rengî xwe derdixistin pêş di axaftina kadroyên sendîkayê de. (4) Rast e, mîlîtan û rêveberên sendîkayê seferber bûn ji bo parastina mafên karkerên şaredarîyê yan jî ji bo muzakerekirina zêdebûna maeşan; ew carinan bi ser ketin jî, weke dawî anîna li karên demî di hin sektoran de, weke mafê betlaneyê, yan jî dayîna prîmeke mehane 70 dînarî (34 euros) ji memûran re. Lê ji rêxistinê nayê ku tu rêya alternatîf a aborî û civakî pêşniyaz bike li hemberî bernameya neolîberal ya eşkere ku ***Ennahda*** dimeşîne, da ku bi vî rengî welatê xwe rizgar bike ji krîzê. Tunebûna nîqaşên li ser qanûna fînansê ya di 10ê gulana 2012ê de qebûlkirî, nîşana vê yekê ye.

Hevgirtinên di navbera lîberalan û hin rêxistinên çepa tundrew de yên ji bo piştgirtina UGTTyê wê demê bi rengekî din derdikevin pêş. Mamoste û mîlîtanê birêz **Mohammed Kammoun** vê nakokîyê baş rave dike: *"Weke sendîkalîstekî ji rêzê, em westîyane. Li şûna ku em bi pirsgirêkên xwe re mijûl bibin, weke pirsgirêka jinûve birêxistinkirina navxweyî, weke pêşniyazkirina çareserîyên aborî yên alternatîf û hwd, em diho li dijî CDDyê* (Civata Destûra Bingehîn a Demokratîk) *têdikoşîyan, îro jî li dijî Ennahdayê em têdikoşin. Em asê mane di navbera Ennahda û enîyeke fereh a muxalîf de, ev bereya muxalif mumkun e li derdora birêz **Essebsi** xwe bi rêxistin bike û wextê me tune ye ku em rêyên din pêşniyaz bikin."*

Bi awayekî giştîtir, êrîşên sîstematîk li dijî UGTTyê û çalakîyên civakî yên cihê dike ku pirsa helwesta êlîtên sîyasî li hemberî pirsgirêkên aborî û civakî derkeve pêş. Elîtên siyasî ji bo krîmînalîzekirina çalakîyên civakî yên doza mafên xwe dikin, timî amade ne, lê dema divê van pirsgirêkan bikin mijara sereke ya guftûgoyan hingê zehmetîyê dikişînin. Di rewşeke ku siyasetvan bala xwe bi tenê didin pevçûna di navbera "îslamîst" û "demokratan" de, armancên girêdayî bidestxistina desthilatdarîyê yên herî li pêş in û pirsgirêka civakî piçûk tê dîtin. (5) Enîya gel ya bi hevkarîya Partîya Komunîst a Karkerên Tûnisî (PKKT) re nû hatî avakirin û têde PKKT weke qehreman tê nîşandan, hewl dide şûna vê valahîyê dagire û xwe weke alternatîfeke li hemberî vê dubendîyê nîşan bide, bi vê slogana sereke *"Ne Essebssi, ne jî Jbalî, şoreş a yên xwedî rûmet in"*.

Li hemberî xirabûna rewşa aborî, seferberîyên civakî li hema bêje tevahîya welêt didomin. Polemîkên li ser mijara îhtîmala teybetkirina şîrketên dewletê di hin sektorên weke av û elektîkê de yan jî teybetkirina medyayê, aloziyan hartir dike.

Pêvajoya demkin ya guherîna siyasî ya ku gelek pirsgirêk têde hene, tabloyeke bi vî rengî derdixe pêş: partîyeke desthilatdar a ku meyldar e heman modela aborî ya neo-lîberal bi şiklekî din – ku ji yê berê baştir xuya dike - ferz bike û mixalefeteke ku hê jê nayê çareserîyeke alternatîf pêşniyaz bike di vê mijarê de, ku di heman demê de zehmetîyê dikşîne ji bo domandina hebûna xwe li derveyî UGTTyê. Di dema nîqaşên germ ên li ser qedandina pêvajoyeke di 23yê çiriya pêşîn a 2012ê de, (6) birêz **Abassî** 19 îlona buhurî di danezaneke li rojnameya *Alchourouk* çapkirî de îddia kir ku ya li herî pêş di rojeva siyasî de birêxistinkirina hilbijartinên wê bê ye.

Weke hêzeke tewazuna li welêt û weke stargeha çalakîyên civakî – weke ku sendîkalîst hez dikin bibêjin- gelo wê UGTT karibe ji armancên demkin bibihure û doza daxwazên siyasî û neteweyî bike xwedî projeyeke rastî ya aborî û civakî ku layiqî şoreşekê ne ku slogana wê "***kar, azadî û rûmeta neteweyî***" ye?

* Dersdar e li Zanîngeha Paris-Dauphine. Nivîskara *L'UGTT au cœur de la révolution tunisienne / UGTT di nava şoreşa tûnisî de*, Editions Mohammed Ali Hammi, Tunis, wê di çileya 2013ê de were çapkirin.

(1) Ennahda di hilbijartinên 23yê çiriya pêşin a 2011ê yên meclîsa avaker de bi % 37ê dengan bi ser ket. Ew bi Kongreya ji bo Komarê re (KK) û bi Foruma ji bo kar, demokrasî û azadîyan (FKDA) re "troyka"yê pêk tîne ku niha di hikûmetê de ye.

(2) Ji ber hevdîtinên di navbera çileyê 2011ê û gulana 2012ê de hatine girtin.

(3) Kevne-endamekî UGTTyê, Habib Guiza, sibata 2011ê Konfederasyona Giştî ya Karkerên Tûnisî (KGKT) ava kir. Di 1ê gulanê 2011ê de Yekitiya Tûnisî ya Kar hat damezrandin, damezrênerê wê Ismaël Sahbani ye ku di salên 1990î de sekreterê giştî yê UGTTyê bû.

(4) Sadri Khiari, *Tunisie. Le délitement de la cité. Coercition, consentement, résistance (Tunis. Jihevdeketina bajêr. Ferz, qebûlkirin, berxwedan),* Karthala, Parîs, 2003.

(5) Choukri Hmed û Hèla Yousfi, "Pour la chute du régime de Tunis" (Ji bo xistina rejîma Tûnisê), *Libération,* 29ê gulana 2012ê.

(6) Piranîya mixalefetê xwe dispêre biryar-qanûna li ser hilbijartina endamên Meclîsa Neteweyî ya Destûra Bingehîn (MNDB) ku li gorî wê divê Destûra Bingehîn a nû saleke piştî dema hilbijartinan were amade kirin û difikirin ku piştî 23yê çiriya pêşîn a 2012ê rewabûna qanûnî ya sazîyên dewletê yên heyî bi dawî dibe (Meclîsa Destûra Bingehîn-Hikûmet- Serokdewletî).

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Ji serokdewlet Muhammed Morsî hat ku artêşê marjînal bike. Lê belê divê ew bi mixalefetên din re jî û bi wê reddê re ku Birayên Misilman di nava beşeke civakê de dibin sedem rûbirû bibe.

# Ji dîktatorîya eskerî ber bi dîktatorîya dînî ve?

Alain Gresh



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 30x60cm

Birayên Misilman kî ne? *"Komeke biçûk a ji rêya rast derketî ne"*. Şoreşa li Misirê? *"Bêyî piştgirîya Îranê ew ê nikarîbûya pêk bihata û destpêka lihevkirinên nû yên Sykes Picotê ye."* (1) Hilbijartina birêz **Mihemed Morsî**? *"Mixabin ew tercîh kirine."* Weke gelek wezîfedarên fermî yên herêma erebî, general Dahi Khalfan Al-Tamin jî ku birêveberê polîsê Dubayîyê ye, bi rêya Twitterê radigihîne: "*Eger Birayên Misilman hewl bidin ewlekarîya Kendavê bixin tehlûkeyê, ew ê di nava xwîna birije de bixeniqin*."

### "Artêş bi tenê pilingekî ji kaxezê bû": ev peyv li ser rêyên Qahîrê bi ser ket

Tevahîya havîna sala 2012ê, "polîsê sereke" yê Dubayîyê êrîşên li dijî Birayên Misilman qat bi qat zêde kirin û navê "*rêxistina gunehbar ku dawîya wê nêzik e*" lê kiribû (2), wî peşnîyaza desteserkirina pereyên rêxistinê û qutkirina fînansmanên wê kiribû. Desthilatdarîya Mîrîtîyên Ereb yên Yekbûyî – ku Dubayî beşek jê ye – nêzîkî şêst endamên Birayên Misilman dadgeh kirin, bi sedema ku komployekê li dijî rejîmê digerînin û bi vî rengî dilê general Dahi Khalfan Al-Tamin nehiştin.

Rojnameya *El-Şerq El-Ewset* milkê malbata Mîrê warisê text yê Suûdî yê bi navê Salman e. Tevî ku ev rojname li rojava gelekî navdar e, asta serbixwebûna wê li hemberî sîyaseta Erebîstanê biqasî ku tunebe ye. (3) Roja piştî mêrasîma sondxwarinê ya Morsî, 30ê hezîrana 2012ê serredaktorê wî **Abdul Rahman Al-Rashid** behsa gumanên xwe dikir – ango behsa gumanên malbata El-Suûd dikir (4). Gelo wê serok dewletê nû yê Misirê bi rastî li dijî terorîzm û El-Qaîdeyê têbikoşa? Gelo wê rola navbênkarîyê ku serokdewletê kevn Husnî Mubarek di mijara Filîstînê de pê rabûbû bigire ser milê xwe û bidomîne? Tevî ku ew li hember destwerdana li welatên xerîb radibû, gelo wê bi rastî piştgirîya mixalefeta Sûrîyeyê bike? Gelo wê alîyê Qral Abdullahê II. bigire li hemberî protestoyên ji alîyê baskê urdunî yê Birayên Misilman ve birêvebirî? (5) *"Tevî ku Îran demeke dirêj hevkarê saxlem ê Birayên Misilman bû jî, gelo wê serokdewletê misirî bi hênceta ku welatên Kendavê jî heman tiştî dikin, têkilîyên dîplomatîk ji nû ve deyne bi Tehranê re? Gelo wê li hemberî zêdebûna çalakîyên îdeolojîk û dînî yên Îranê ji dema dawînanîna li desthilatdarîya Mubarek û vir ve bêdeng bimîne, desteka ku Tehran dide komên herêmî yên dixwazin şîîtîyê li Misirê belav bikin yê yekê piştrast dikin? Jixwe El-Ezharê* [rêxistina sereke ya îslama sunî li Qahîreyê] *li ser vê têsîrê ku mumkun e li Misirê şerekî mezhebî pêk bîne, hişyar kir. »*

Çend hefte bi şûn ve, meha îlonê heman rojnamevanî daxwaza Qahîreyê ya tevlikirina Tehranê - ligel Rîyad û Enqereyê - di nava komeke ji çar dewletan pêktê ya bi çareserkirina krîza Sûrîyeyê hatî wezîfedarkirin, şermezar dikir. (6) Wextê wezîrê karên derve yê suûdî di 17ê îlonê de civîneke ve rêxistinê boykot kir, vê yekê tukes ecêbmayî nehişt.

### Destûra bingehîn a nû, referandûm, parlemana nû... Avahîsazîyeke mezin pêk tê

Delîlên bawerîpêneanînê bi vî rengî û gelekên din ku di çapemenîya Kendavê de hatin dîtin, li Rojavayê zêde bal nekişandin ser xwe, belkî ji ber ku ew bi fikra hevpar a qebûlkirî li hev nakin: fikra hevgirtineke mezin ya îslama sunî ku tê de mîrên Kendavê û tevgerên îslamî dibin yek ji bo ku sîstemeke dînî ya hişk û şerîetê ferz bikin. Weke ku nêrîna muhafazekar a îslamê dikarî berjewendîyên sîyasî, rikberîyên dîplomatîk, cudatîyên neteweyî û nelihevkirinên stratejîk ji holê rake.

Hin bûyerên dîrokî vê xeyal û fantazmê piştrast dikin, her çend sedema wan ji dînî zêdetir sîyasî be jî. Di salên 1950 û 1960î de, bi milyonan kadroyên Birayên Misilman ku li Misirê, li Sûrîyeyê, li Cezayirê yan jî li Iraqê zilm û zor li wan bûbû, koçberî Kendavê bûn, nexasim li Erebîstana Suûdî. Weke ku entellektuelekî misirî yê nêzî Birayên Misilman bi bîr dixe, *"Seferberîyeke ciddî nebû. Wê demê, rêxistin hatibû parçekirin û xwedî birêveberîyeke baş hatî amadekirin nebû. Rast e ku mîlîtanên li Erebîstana Suûdî bi cih bûyî bi hezaran kadro dan vî welatî. Ew di şerê li dijî neteweperstîya ereb de li têsîr bûn, nexasim li dijî ya serokdewletê misirî Cemal Abdel Nasir û li dijî çepê jî bi kêr hatin"*.

Dagirkirina Afganîstanê ji alîyê Sovyetê ve, di kanûna 1980yî de, bû sedema yekitîya welatan ji bo têkoşîna hevpar li dijî komunîzmê. (7) Wê demê Birayên Misilman, ku ji alîyê tevgerên îslamîst ve hatibûn seferberkirin zêde deng dernexistin û bi tenê alîkarîya insanî dan Afganîstanê (8). Bi hezaran kesên ji dil tevlîbûyî ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û *Central Intelligence Agency* (CIA) piştgirîya wan dikir û qralîyetên petrolê ew fînanse dikirin, çûn Afganîstanê da ku li dijî Artêşa Sor şer bikin. El-Qaîde wê ji vê serferberbûna "şervanên azadîyê" yên afganî bihata avavakirin.

Gelo "bihara erebî" gava sêyem a vê yekbûna pîroz e? Ev fikra cazib rastîyên nazik li paş dihêle, yên di dema piştî şerê sar de çêbûyî yên weke qutbûna Birayên Misilman ji qralîyeta suûdî di destpêkê salên 1990î de di dema dagirkirina Kuweytê de. Ji sala 2002ê û vir ve , wezîrê karên hundir yê Sûrîyeyê ku xwedî hêz e, mîr Nayef, di rojnameyekê de ku li vê mîrîtîyê tê çapkirin nerazîbûna xwe ji rêxistinê bi hûrgilî tîne ziman: (9) *"Birayên Misilman sedema piranîya pirsgirêkên cîhana erebî ne û gelek zirar dane Erebîstana Suûdî. Me zêde destek da vê tevgerê û me ew cîhana erebî xira kir."*

Mîr bi bîr dixist ku wî di dema krîza Kendavê ya 1990-1991ê de heyetek qebûl kiribû û di wê heyetê de **Reşîd Xannûşî** (îro serokê Ennahdayê ye) yê tûnisî, **Hesen El-Tûrabî** yê sûdanî, **Abdul Mecîd El-Zindanî** yê yemenî û **Necmettin Erbakan** ê tirk hebûn. Tevahîya endamên heyetê endamên tevgera Birayên Misilman bûn. *"Me ji wan pirsî: 'gelo hûn dagirkirina Kuweytê qebûl dikin' Wan jî bersiv da ku ew li hêvîya bihîstina fikra me ne. Lê piştre ew çûn Iraqê û dan zanîn ku piştgirîya dagirkirina Kuweytê dikin, vê yekê em ecêbmayî hiştin."*

Lê mîr hewl dida sedema din ya hêrsa xwe ya ku mîrên din yên herêmê jî hîs dikin veşêre: bicîhbûna Birayên Misilman di nava civakên Kendavê de û tevlîbûna wan a li çalakîyên nerazîbûnê yên ji dema şerê Kuweytê û vir ve li qralîyetê diqewimin. Lewra nêrîna sîyasî ya Birayên Misilman li ser dewleteke îslamî – belê ew jî doza dewleteke îslamî dikin lê ew dixwazin wê li ser bingeha hilbijartinan ava bikin - ne weke fikra dewleta îslamî ya qralîyetê ye, ku xwe dispêre dilsozîya bêqusûr bi malbata qralîyetê ya suûdî. Jixwe malbata qraltîyê tercîh kir fînansmanê bide tevgerên selefîst ku dilê wê rihet dike bi redkirina ketina nav sîyasetê û bi banga ji bo destekdana deshilatdarîya bi cîh bûyî, ew desthilatdarî çi bibe bila bibe - weke banga destekkirina Mubarek ku yek ji malbatên qraltîyê ye.

Qutbûna di navbera Rîyad û Birayên Misilman de sala 2000î hê kûrtir bû, bi beşdarbûna Birayên Mislimanan li "xeta berxwedanê" ya li hemberî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê, ew bi saya Hemasa fîlîstînî tevlî vê helwestê bûn û li gel Îran, Sûrîye û Hîzbullahê tevgerîyan.

Û piştre şoreşên ereb rola heryekî ji nû ve dîyar kir. Erebîstana Suûdî û Mîrîtîyên Ereb yên Yekbûyî li hemberî wan radibin. Li gorî wan biserketina tecrûbeyên Birayên Misilman li Misirê yan jî li Tûnisê mizginîyek nîne, xebereke qet nebaş e. Birêveberên wehabî, ku têkilîyên gelek baş bi Mubarek re danîn û ku derîyên xwe lê vekirin ji kevne serokdewlet Zîn El-Abidîn Bin Elî re piştî reva wî - ew reddikin wî vegerînin welatê wî tevî ku desthilatdarîya nû ya Tûnisî dixwaze jî - ew Birayên Misilman gunehbar dikin bi dev ji wan berdana û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê gunehbar dikin bi bitenêhiştina wan. Qraltî bû navenda helwesta li dijî şoreşê û wê serhildana Bahreynê ya adara 2011ê tepisand. Li hemberî pêla nerazîbûnê ya li Urdunê ku Birayên Misilman bi awayekî çalak tevlî bûbûn, Rîyad pişta qral Abdullahê II. digire (10)

Tevî vê yekê, yekem serdana Morsî li derveyî welêt – weke serokwezîrê Tûnisê Hamad Jebali ku endamê Ennahdaê ye - di 11ê hezîrana 2012ê de li Erebîstana Suûdî bû. Sedema vê serdanê ne hevgirtina "îslamî" bû, lê belê li ser navê reel-sîyasetê pêk hatibû ku di têkilîyên navneteweyî de serdest e. Pereyên Rîyadê ji Misirê re gelekî pêwîst in – wê 1.5 mîlyar dolar bidest xistin û soza 2.5 mîlyarên din jî stand. (11) Li aliyê din jî, zêdetirî 1.5 mîlyon welatîyên wê li qralîyetê dijxuilin û pereyan dişînin ji malbatên xwe re, ev pere têrî lihevderketina mesrefên welêt dike. Herçî Erebîstana Suûdî ye, tedbîrên ku digire çi dibin bila bin, ew nikare xwe ji welatê herî girîng yê Rojhilatê Nêzîk qut bike.

Dîplomatekî misirî wisa rave dike *"Serdana Morsî tevahîya pirsgirêkan çareser nekirin"*. Ango tu tişt çareser nekir. Gelek mijarên alozîyê hê dimînin, weke muameleya bi misirîyên li qraltîyê re, yan jî weke pirsa divê çi ji pererazandinên suûdî li Misirê were kirin. Di nîsana 2012ê de, piştî xwepêşandanên ku binçavkirina Ahmed Al-Gizawy li qraltîyê şermezar dikirin, ew parêzerek bû ku dihat gunehbar kirin "pê re narkotîk hebû" , qraltîyê xwest ku sefîrê xwe yê li Qahîrê vegerîne welêt. Di tebaxa 2012ê de, Essam El-Iryan, yek ji birêveberên sereke yên Birayên Misilman (ew belkî siberojê bibe serokê Partîya Azadî û Edaletê ku Birayên Misilman ew ava kirin, li benda 19ê çirîya pêşin bin) ku bû şêwirmendê serokdewlet, li ser hesabê xwe yê Twitterê ji Sefareta suûdî dixwest ku *"li ser sûc, biryara dadgehê û şert û mercên binçavkirina xanim Nagla Wafayê zêdetir agahîyan bidin." X*anima navbirî welatîyeke misirî ye ku ji sala 2009ê û vir ve ji ber lihevnekirineke aborî ya bi mîrekî re, girtî ye, cezaya pênc sal heps û pênc sed derbên qamçîyan lê hatibû birîn. (12)

Mijara pererazandinên qraltîyê li Misirê alozîyê mezin dike. Hezîrana 2011ê, nivîseke ragihandinê ya mîrê pir dewlemend ê bi navê Walid Bin Talal dide zanîn ku wî ji çar paran sisîyê sed hezar donum erdên bi saya sîstema bertîlxwarîyê ku di dema serokdewlet Mubarek de serdest bû bi erzanî kirîbû "dide gelê Misirê". (13) Bi vî awayî wî xwe ji pirsgirêkên bi hiqûqa misirî re derketin holê xilas dikir. Tevî ku Qahîre û Rîyad hewl didin alozîyên ku ew dibin sedem aş bikin, dadgeha misirî lêkolînên din jî dan dest pê kirin ku berjewendîyên suûdî dixin ber lêpirsîne û buroyeke taybet di wezareta pererazandinê ya misirî de bi armanca çareserkirina lihevnekirinên bi Erebîstanê re hat vekirin. (14)

Rîyad herwiha acîz dibe ji vegera Qahîrê a ser dika dîplomasîyê, belê di dehsala bihurî de Misir paşve ma bû, ew pir caran li dûv qraltîya wehabî, bi awayekî giran dimeşîya. Serdana **Morsî** ya ber bi Çînê ve ku berî hertiştî pêkhat - ev jî îşareta bi dawîhatina li dema danûstandinên bi tenê bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re dike - û piştre çûyîna wî ya Îranê gumanên Rîyadê piştrast kirin. Çûyîna wî a Tehranê kir ku razîbûna raya giştî ya misirî bi dest bixe, ji ber ku wî serê xwe li hemberî zextên Amerîkayê netewand misirî pê serfiraz bûn. Jixwe raya giştî ya misirî herwiha guh nade axaftinên birêveberên Kendavê yên li dijî Îranê û li dijî şîîyan. Lê belê da ku hêrsa Erebîstanê raneke, birêz Morsî neçar ma lîstîkeke pir zehmet bilîze: ew bi tenê çend saetan li paytexta Îranê ma, wî weke ku hatibû plankirin nekir û hevdîtina bi Rêberê Şoreşê re pêk neanî û red kir ku behsa ji nû ve destpêkirina têkilîyên dîplomatîk ên dualî bike. Piştî bibîranîna Cemal Abdel Nasir – şaşîyeke mezin e wextê mirov pê zanibe ku di salên 1950 û 1960î de kenve reîsê Birayên Misilman bi awayekî hov tepisandibûn - axaftina Morsî li ser Sûrîyeyê hişk bû û banga dûrxistina ji desthilatdarîyê ya Beşar el-Esad kir, tevî ku wî mudaxaleyeke ji derve ku Erebîstana Suûdî doza wê dikir, red dikir jî.

Herçî **Xannûşî**, birêveberê tunisî yê ***Ennahda***yê ye, ew demeke dirêj li Londrayê ma; di dema dirêj a li derveyî welêt derbasbûyî de wî ev bajar tercîh dikir û ne Rîyad. Di dema hatina wî ya li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya qanûna 2011ê de, wî da zanîn ku "bihara erebî" wê dawîyê li mîrîtîyên Kendavê bîne; bersiva bi henekî ya vê peşdîtinê di rojnameya suûdî ya bi navê *El-Rîyad* hat nivisîn, (15) têde pirsa gelo ev pêşdîtin behsa mîrîtîya Qetarê jî dike, dihat kirin, Qetar piştgirekî girîng e ji bo Ennahdayê.

Lewra têkilîyên di navbera Qetarê - ku weke Erebîstana Suûdî xwe endamê wehabîzmê dihesibîne, (wehabîzm dîtinek e ku birêkûpêkbûna jîyanê li gorî qaîdeyên Îslamê dixwaze),

www.arsivakurdi.org

xwe li Kendava ereb ferz kir – û Birayên Misilman de saxlem in. Tevî ku ne xwedî artêşekê ye, ne jî xwedî dîplomatan e, ne jî xwedî têra xwe sîxuran e da ku karibe bi roleke çalak ya herêmî rabe, Mîrîtîya Qetarê difikire ku dikare bi rêya mezheba Birayên Misilman sîyaseta xwe bimeşîne. Rezervên wê yên dolarên bê fon yekane avantaja wê pêk tînin. Ji mîrîtîya Qetarê hat ku ji salên 1970ê ve Yûsif El-Qaradawî yê li ser erdê xwe, bi kar bîne. Bi saya bernameya xwe ya bi navê "şerîet û jîyan" li ser kanala televîzîyona qatarî Al-Jazirayê, Yûsif El-Qaradawî bû yek ji waizên herî navdar ê herêmê. Birayên Misilman El-Qaradawî yê ku berê endamê tevgerê bû, weke referanseke dînî dibînin – ew herçend xweserîya xwe biparêze jî û pirr caran sekterbûna baskê misirî ya tevgerê rexne kiribe jî.

## Ji bo ku mirovan qaneh bikin êdî ji bo Birayên Misilman têrê nake ku bi tenê bibêjin "Îslam çareserî ye"

Piştî nêzîkbûneke demdirêj bi Hizbullahê, Sûrîye û Îranê re – tevî ku têkilîyên saxlem bi Dewletên Yekbûyî re diparastin – Qetarê ji dema bihara ereb û vir ve tercîh kir ku xwe bispêre serketina Birayên Misilman. El Cezîre, kanaleke bi tevahî ji alîyê mîrîtîyê ve tê fînanse kirin, gelek temaşevanên xwe û çend rojnamevanên xwe ji dest dan; nexasim li Misirê û carinan li Tûnisê jî ew bi tenê bû dengê Birayên Misilman. Çûyîna mîrê Qetarê li Qahîreyê, di tebaxa 2012ê de di dema Remezanê de û pererazandina wî ya 2 milyar dolarî li Bankaya Navendî ya Misirî ji bo alîkarîya çareserkirina pirsgirêkên welêt, hevkarîya herdû welatan piştrast dike.

Lê gelo mirov dikare behsa hevgirtineke stratejîk bike? Alozîyên nû yên di navbera Ennahda û Qetarê de derketî holê yên li ser kapasîteya tevgerê di pêkanîna îstîqrara welêt de dibe sedema gumanan û fikra hevgirtineke stratejîk pûç dike.

Berevajîyê fikra general **De Gaulle**, ku bi fikrên zelal ber bi "rojhilata tevlihev" ve diçû, ev herêma cîhanê ne sirr e, mirov dikare bi heman konseptên sîyasî ku di tevahîya cîhanê de rewa ne, analîza wê bike. Lê divê mirov qebûl bike wan di pratîkê de bi kar bîne. Bi vî rengî hemû baskên Birayên Misilman fermanên birêveberekî qaçax ê li Mekeyê veşartî ku qaîdeyên ji dogmayên îslamê îlhama xwe girtî dixwîne, bi cîh nayînin: stratejîya ku ew taqîp dikin li gorî berjewendîyên neteweyî yên her yekî ji wan xwe eyar dike, weke ku sîyaseta birêz Morsî li hember Îsraîlê yan jî Xezzayê nîşan dide, ev yek jî bû sedema xeyalşikestineke di nava Hemasê de.

Selefîst xwe li vê tabloyê zêde dikin- ketina wan a nava sîyasetê li Misir û li Tûnisê tê maneya ku wê tevgerên ku selefîst timî red dikirin, armancên nû bidin ber xwe; (16) weke nêzîkbûna Qetarê bi Erebîstana Suûdî re, mîrîtî her çend gumanan ji welatê cîran bike jî; yan jî weke pirsgirêka tehlûkeyên li ser qraltîya urdunî hene – ew êdî red dike alîkarîyê bide serhildêrên Sûrî bi Qetarê re organîze bike, lewra guman tên kirin ku Qetar îmtîyazan dide Birayên Misilman. Ev mesele zehmetîya sîyasetkirina li herêma misilman nîşan didin ji bo yên ku difikirin dikarin xwe bi tenê bisipêrin Quranê (dînê hevpar).

(1) Di encama van lihevkirinan de ku di dema Şerê Cîhanê yên Duyem de bi awayekî veşartî di navbera Fransa û Inglîstanê de hatin mohrkirin, Rojhilatê Navîn hat parçekirin û di navbera herdû hêzan de hat parvekirin

(2) Ji bilî berhemên din jêdera li jêr bixwîne: "Dubai police chief warns of Muslim Brotherhood, Iran threat" (Serokê polîsê Dubaîyê der barê Birayên Misilman, tehlûkeya Îranê de hişyar dike), *Egypt Independent,* Qahîre, 26ê hezîrana 2012; malpera Al-Sharq, Doha, 6ê îlona 2012ê; Al-Arabîya TV, Dubaî, 9ê îlona 2012ê.

(3) Mohammed El Oifi, "Voyage au cœur des quotidiens arabes" (Ger û geşta li nav rojnameyên erebî) , *Le Monde diplomatique,* kanûna 2008ê.

(4) Abdul Rahman Al-Rashed, "What will Mursi do?" (Wê Mursî çi bike?) , *Al-Shark Al-Awsat,* London, 2yê hezîrana 2012ê, www.asharq-e.com

(5) Hana Jaber, "Vers un printemps jordanien?" (Ber bi bihareke urdunî ve?), *Le Monde diplomatique,* tebaxa 2012yê.

(6) *Al-Chark Al-Awsat,* 19ê îlona 2012ê, di nava *Mideast Mirror* de behsa wê hat kirin , London, 19ê îlona 2012ê.

(7) Christian Parenti, "Retour sur l'expérience communiste en Afghanistan" (Vegera li tecrûbeya komunîst li Afganistanê), *Le Monde diplomatique,* tebaxa 2012ê.

(8) Stéphane Lacroix, "Osama bin Laden and the Saudi Muslim Brotherhood" (Usama bin Laden û Birayên Misilman ên suûdî), Foreign Policy, 3 çirîya paşîna 2012ê.

(9) Ingilîziya metnê li ser malpera rojnameyeke heftane ya fermî ya suûdî li ser înternetê bi înglîzî hat wergerandin, Ain-Al-Yaqeen, 6ê kanûna 2002yê: http://www.ainalyaqeen.com/issues/20021206/index.htm

(10) Hana Jaber, "Vers un printemps jordanien?" (Ber bi bihareke urdunî ve?), *Le Monde diplomatique*, tebaxa 2012ê.

(11) *Ahram Online*, 19ê îlona 2012ê.

(12) *Al Watan,* Qahîre, 2yê îlona 2012ê.

(13) Reuters, 11ê hezîrana 2011ê. *Bixwîne* Alain Gresh, "L'Egypte en révolutione" (Misir di nava şoreşê de), *Le Monde diplomatique,* tîrmeha 2011ê.

(14) "Saudi-Egyptian ties get big boost" (Têkîlîyên Suûdî-Misirî gelekî mezin dibin), Arab News, Cidde, 14ê îlona 2012ê; "Through special office, government to protect Saudi investors" (Bi saya buroyeke taybet, wê hikûmet pererazandinêrên suûdî biparêze), *AlMasry AlYoum*, Qahîre, 4ê îlona 2012ê.

(15) "Ghannouchi crée la polémique en Arabie saoudite" (Xannûşî polemîkê dike li Erebîstana suûdî), BusinessNews.com, Tûnis, 15ê kanûna 2011ê.

(16) Parçebûna partîya Nûr ku niha pêk tê, Li Misirê ew partîya mezintirîn ya selefîst e, nîşana zehmetîyên ku partî pêre rûbirû ye di wexta ketina wê ya nav sîyasetê de û herwiha nîşana zehmetîyê ye di dîyarkirina fikreke sîyasî ya "selefîst" a bi îstîqrar de.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

### Farhad Hached

Sendîkavanê tûnisî ye, 14ê sibata 1914ê ji dayik bûye, Farhad Hachet damezrênerê Yekîtîya Giştî ya Karkerên Tûnisî (UGTT) bû, sala 1946ê. Ew ji rêxistina Konfederasyona Giştî ya Kar (CGT) vediqete, lewra ev rêxistin bersivê nade daxwazên karkerên kolonîyan. UGTT bi rêya grev û xwepêşandanan, nexasim jî sala 1952yê, piştî girtina Habîb Bourguîba – serokkomarê Tûnisê yê siberojê – û ragihandina rewşa awarte, wê veguherîya hêmaneke çalak a ji bo serxwebûna neteweyî. UGTTyê wê yekser hevsarê şerê sîyasî bigirta destê xwe. Hached 5ê kanûna 1952yê ji alîyê sîxurên fransî ve hat kuştin. Ew ê bibûya mohreke jêneçe li ser UGTTyê bi têkelkirina şer û têkoşînên civakî, neteweyî û sîyasî.

### Pêş-agahîdêrên înternetê

"Mînakên wan lihevçêkirinan gelek in ku li cîhana erebî û deverên din afirênerîya bikarhêneran piştrast dikin, belê ji vê û wêde kapasîteya wan a pir mezin a di demeke pir kin de "qebûlkirina" daneyên nûker ên teknîk jî piştrast dikin; çawa ku mînaka karkerên koçber ên ku di nîvê duyem ê salên 1990î de li bakurê Derya Spî diçûn înternet kafeyan da ku bi malbatên xwe re bidin û bistînin, ji bo vê jî protokolên pêşî yên telefonvanîya IPyê – ev amûreke elektronîk bû ku bikarhênerên welatên pîşesazîya xwe temam kirî wê pirr paşê pê bihisîyana, nexasim jî bi Skypeê… - bi kar dianîn. Ev rehetîya mirovan matmayî dihêle ya asîmîlasyon û adaptasyonê ya karkeran e ku para bêhtir nexwende ne û dibe ku ew bi xwe yan jî birayên wan ên ciwan tevlî serhildanên ereb ên sala 2011ê bûbin.

(Yves Gonzalez-Quijano, *Arabités numériques / Erebîtîya Dîjîtal,* Sindbad, Parîs, 2012.)

### "Orîyentalkirina şoreşa misirî "

Di gotareke li ser malpera Jadaliyya de weşandî, Rabab El-Mahdi nêrîna li şoreşa misirî ya ku gelek sazîyên çapemenîyê yên rojavayî weke şoreşa ji alîyê "*mirovên weke me ve*", birêvebirî nîşan dan, radixe ber çavan û lê eşkere dike, ev sazî wekî din dibêjin "*Misirîyên çîna navîn ên temenê wan di bin 30 salan de. Yên ku gelek ji wan xwedî girêdanek û yan jî gelek girêdanên bi rojava re ne*" şoreş bi rê ve birine. Li gorî British Broadcasting Companyê (BBC), Gene Sharp, nivîskarê *From Dictatorship to Democracy / Ji Dîtatorîyê ber bi Demokrasîyê ve* (Albert Einstein Institution, East Boston, Massachusetts, 1994), "zilamê li pişt hilweşandina hikûmeta misirî" ye. Dîsa jî El-Mahdi rave dike ku piranîya kesên tevlî serhildanê bûne qet tiştek der barê Sharp de nebihîstine; ew ji çînên jêr ên civakê ne û dijminê bandor û hebûna rojavayî ya li welatê xwe ne.

("Orientalising the Egyptian Uprising / Oriyentalkirina Serhildana Misirî", 11ê Nîsana 2011ê, www.jadaliyya.com)

### Bi hejmaran misilman


Zanyarîyên ku tên dayîn timî misoger û esseh nînin, lê belê hejmara misilmanan li seranserê dinyayê 1.5 milyar tê qebûlkirin (ango % 22yê nufûsa dinyayê). Misilman serê pêşî li pêncî û heft welatên endamê Rêxistina Hevkarîya Îslamî ne (RHÎ) li van welatan misilman piranîyê pêk tînin – ji bilî kêm îstisnayan. Dewletên misilman ên nufûsa wan herî zêde Îndonezya (200 milyon misilman), Pakîstan (174 milyon), Bengladeş (145 milyon) û Hindistan (ew li vî welatî hindikahîyek in ku hejmara wan 160 milyon e) in. Dewleta ereb a ku herî zêde misilman lê hene Misir (78 milyon) e. Li deverên din ew di rewşa hindikahîyan de ne weke li Peravên Diranê Fîlan (% 36ê nufûsê), li Rûsyayê (% 12ê nufûsê), li Montenegroyê (% 17ê nufûsê), li Fransayê (% 5ê nufûsê).

### Wahabîtî

Sala 1744ê **Muhammed Ibn Saûd**, mîrekî herêmî yê ji Necdê –herêmeke li nîvgirava erebî – bi reformatorekî misilman ê bi navê Muhammed Ibn Abdel Wahab re hevgirtinek mohr kir, bi gotinên oriyentalîstê fransî Henri Laoust ji bo ku "*bi zora sîlehan jî be, gotina Xwedê*" bi ser bixe. Piştî du hewldanên kurt ên sedsala 19ê, endamekî malbata Saûd ê bi navê Abdel Azîz sala 1901ê bajarê Rîyadê bi dest xist. Wî dê beşeke mezin a nîvgiravê fetih bikira ku di navê de bajarên pîroz Meke û Medîne jî hene. Qraltîya Suûdî ya bi vî rengî damezrandî wê doktrîna Ibn Abdel Wahab biparêze: şîroveyeke Îslamê ya hişk a xwe disipêre yekîtîya Xwedê, redkirina nûkerîyê û redkirina şefaetan. Qraltîyê wê ev nêrîna li Îslamê îxracî seranserê cîhana misilman bikira, nexasim piştî sala 1973yê ku hatinên ji petrolê yên qraltîyê pir zêde bûn û destûr dan welêt sazîyan li seranserê cîhana misilman finanse bike û dema ev jî dikir xwe disipart "îxrackirina" bi hezaran waizî.

### Qetar

Emîrtîyeke piçûk a Kendavê ye ku li ser 11 400 kîlometro kareyan ava ye û hejmara şênîyên wê 1.3 milyon e, ji van jî bi zorê % 25 xwecih in. Berê di bin wesayeta brîtanî de bû û sala 1971ê serxwebûna xwe bi dest xist. 27ê hezîrana 1995ê darbeyeke eskerî mire warisê text Hamad Ibn Xelîfe yê ku bavê xwe ji text xist, kire melik. Mîrtî yekê ji baregehên sereke yên amerîkî li herêmê dihewîne. Hêza wê bi xêra rezervên wê yên harîqulade yên gaza xwezayî heye ku destûrê didinê petro-kîmyaya xwe bi pêş bixe, Kupaya Cîhanê ya Futbolê ya sala 2022yê bikire û bi awayekî gelekî zêde pereyan razîne li derveyî welêt, ji Lagardère heta bi EADS û Volkswagenê. Doha cihê kanala televizyonê Al-Jazirayê ye, desthilatdarî vê kanalî ji serî heta binî finanse dike.



Parwez Zabihi: **Bênav**, Behîv û gûz li ser kitanê, sersala 2005, 40x40cm

www.arsivakurdi.org

# 1967, têkçûna ku her tişt guhert

Eric Rouleau

Eric Rouleau, rojnamevanê Le Mondeê ye û eleqedar e bi guhertinên berîya û piştî şerê hezîrana 1967ê li Rojhilata Nêzik. Di pirtûka xwe ya nû de, Dans les coulisses du Proche-Orient / Li pişt perdeya siyaseta Rojhilatê Nêzik (Fayard), ew behsa derketina holê ya îslama sîyasî ya piştî têkçûna ereban dike, û dûre behsa awayê çêbûna hevkarîya di navbera Birayên Misilman û serokdewlet Enwer El-Sedat de dike.

Wê demê gelek çavdêran bawer dikir ku rejîm difetîsî (1). Nasir ê ku rastî baştir didît, yekem civîna desteya wezîran, 19ê hezîranê bi axaftineke ku bi zehmetî dihat bihîstin da destpêkirin û got: "rejîm têkçû; yeke din îro ji dayik bû." wî bi qest negot ku dema mirina rejîmê 5ê hezîrana 1967ê bû. Wê rojê tevahîya hêzên neteweperest ên çepê, nasirî, baasî, sosyalîst û komunîstan ku bi têkçûna leşkerî û bi krîza sîstema sîyasî hatibûn gunehbarkirin, şermezar û xwelîser bûbûn. Tunebûna van meylên laîk di jîyana sîyasî de kir ku valahîyeke mezin çêbibe û destûr da îslama sîyasî di demeke kin de vê valahîyê tije bike.

Wê demê sehneyeke nedîtî bala min kişand: hejmara kesên diçûn mizgeftan ewqasî bilind bûbû ku cîh li wan nedima, êdî yên ku nikarîbûn bikevin hundir nimêja xwe li kolan û rêyên li pêşîya mizgeftê dikirin, li ser hejmareke bêdawî ya sicadeyên li erdê raxistî nimêj dikirin, wan çûn û hatina erebe û mirovan asteng dikir. Bûyereke bi temamî normal e: dîn dibe stargeha kesên bêhêvî mayî û dibe sedema peydabûna hêvîyê. *El Îslam hûwa el-hal* ("Îslam çareserî ye"), ji ber ku tu pêşniyaza din jê baştir tunebû, ev slogana îslamîstan pişt re bi kar anî, bê navber belav bû û kir ku bawerî pê were anîn. Bi ser de jî misilmanên ku ez bi wan re diaxifîm, bawer dikirin ku sedema serketina Îsraîlê pir girêdayîbûna wan bi adetên xwe yên dînî û bawerîanîna wan bi pirtûkên pîroz ên hebûna dewleta wan li Fîlîstinê rewa dikin, bû. Li gorî wan sedema têkçûna misilmanan, dûrketina wan a ji dîn, qebûlkirina îdeolojiyên laîkperest, nasirî, baasî, yan jî sosiyalîzm û komunîzmê bû.

Nasir berîya herkesî ev guhertina di nava civakê de diqewime dît. Bi awayekî ku kes li bendê nebû, wî hezar girtîyên endamên Birayên Misilman azad kirin, girtiyên ku du salan berîya wê bi sedema komployeke tolhilandina kuştina rêberê wan **Seyyid Qutb**, ku teorîsiyenê cîhadê bû, ji alîyê desthilatdariyê ve hatibûn hepskirin. Di heman demê de Nasirî bi rêveberên wan yên li derveyî welêt re dialog dabû destpêkirin ji bo pêkanîna "yekitiya neteweyî". Ji ber ku karê yekane partiya Nasirî hatibû sekinandin, mezheba Birayên Misilman yekane hêza siyasî bû ku xwedî rêxistineke birêkûpêk û dînamîk bû. Ferman dan kanalên radyo û televîziyonê da ku bi awayekî sîstematîk ayetên Quranê biweşînin û heta ji destê wan tê waîzên muhafezekar derxin ser ekranan. Fonên suûdî ber bi deşta Nîlê ve herikîn, avakirina mizgeft, mektebên Quranê û komeleyên îslamî fînanse kirin; wan bi awayekî yekser yan jî neyekser alîkarîya afirandina bingeha terorîzmê kir. Welatên din yên herêmê jî ji comerdîya wehabîyan sûd wergirtin. Bi vî rengî cîhana ereb dewamî kirasê xwe guhert. (…)

[Enwer El-] Sedat (2) dizane ku Îslam, ya ji dema felaketa 1967ê û vir vê dîsa bûyî mode, wê di demeke kin de cihê ji aliyê îdeolojîya sosyalîzmê ve vala hatî hîştin tije bike. Lewra **Sedat** ders û fêrkirinên Pêxember bi kar tîne da ku civak û dewletê hêdî hêdî îslamîze bike. Ji bo bigihîje armanca xwe ew xwedî dîrokeke baş e: ew di mektebeke Quranê de fêrî xwendin û nivîsandinê bû, wî pirtûka pîroz ji ber kiriye, çend caran li ser hev çû hecê, li pêşberiya birrên kamerayan ew bi hurmet xwe ditewîne li kêleka kesên ji rêze. Wêneyên wî yên di çapemeniyê de derketî, birîna li ser eniya wî derdixin pêş, ev birîn ku dişibe libeke mewîja hişkbûyî (bi erebî navê *zebib* lê tê kirin) nîşan dide ku ew enîya xwe gelekî dibe secdê wexta nimêjên xwe yên rojane dike. Herwiha navê "serokdewletê dîndar" li "Bavê Neteweyê" tê kirin. Pîrozkirinên dînî û waezan bernameyên radyo û televîzyonê dadigirin. Perwerdeya dînî di bernameyên perwerdeyê yên dibistanê de weke "dersa bingehîn" cîh digirin. Guhertina civakî sala 1980yî temam dibe bi zêdekirina xaleke li Destûra bingehîn, ku li gorî wê Îslam dînê dewletê ye û ku şerîet çavkanîya sereke ya îlhamê ye ji bo hiqûqê.

Cara yekem di dîroka nûjên û di dîroka kevn a welêt de dewleteke oldar dibe deshilatdar. Pratîka laîkbûnê di dema **Nasir**î de êdî bi tenê bibîranînek e. Da ku bingeha desthiladariya xwe xurt bike divê **Sedat** hevgirtinên sîyasî pêk bîne. Ji ber ku nikare vê yekê bi çepê re bike, ji dema ku desthilatdarî bi dest xist û pêve wî bi awayekî xwezayî xwe nêzîkî Birayên Misilman kir. Wî bi sedan endamên rêxistinê yên ku Nasir ew dayî girtin, azad dike û bi birêvebirên wê re dialogê datîne. Difikire ku bi bibîrxistina – mirovan jixwe pê dizanî- heyranîya xwe û qedrê mezin ê ku ji avakerê mezhebê **Hassan Al-Banna** re digire wê bikare dilê Birayên Misilman xweş bike. Sedat ew di sala 1940ê de nas kiribû û bi bîr dixe ku gelekî mînetdarê wî ye ji bo xerca ku **Hassan Al-Banna** di dema girtîbûna wî de dida malbata wî. Lê belê Birayên Misilman nikarîbûn ji bîr bikin ku hin tişt hene yên ku Sedat di bibîranînên xwe de bi qest behsa wan nake, weke îdamkirina gelek kadroyên payebilind ên rêxisitinê bi gunehbarîya organîzekirina reşkujîyeke li dijî Nasirê di 1954ê de. Kevne kesayetê ku reîs diparast (Sedat) yek ji hakimên dadgeha "şoreşgerî" bû û ev dadgeh ji bo ji holê rakirina mezheba Birayên Misilman hatibû damezrandin.

Tevî gumanên jê dikirin jî rêveberên îslamî weke ku destê serokdewletî dirêjî wan dike qebûl dikin, nîşan didin; bazara tê pêşnîyazkirin bi her şiklî ji wan re bi fêde ye: Sedat ji bo tunekirina reqîbên hevpar alîkarîya wan dixwaze, nasirî û komunîst ên di hin qismên civakê yên weke karker û xwendekaran de hê xwedî hêz in. Birayên Misilman wê xwedîyê wan îmtîyazan bin (yên ku ji helwestên din re qedexe) ku destûrê didin wan têsîra xwe belav bikin. Wexta çend salan piştre Sedat daxwaza xwe ya aştîya bi Îsraîlê re pêk anî, ev hevakarîya mentiqî bi dawî bû.

(1) Cemal Abdel Nasir û "sûbayên azad" di 23yê tîrmeha 1952yê de desthilatdarîyê bi dest dixin. Reîsê misirî dibe rêveberê herî navdar ê herêmê, ew axaftineke neteweperest a pan-ereb (ku yekîtîya welatên ereb dixwaze) bi sîyaseteke pêşxistina Misirê ku xwe dispêre mezinbûna pîşesazîyê tevlihev dike. Bi vî awayî ew hevgirtineke xurt bi Yekîtîya Sovyetî re pêk tîne.

(2) Enwer El-Sedat ku warisê Nasirî ye yek ji "sûbayên azad" bû. Ew kesayetekî ne li rêza pêş bû, mirina reîs di 30ê îlona 1970yê de kir ku ew wezîfeyên herî bilind bi dest bixe. Ew xwe nêzîkî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dike û înfitaha (vekirina) aborî dide destpêkirin. Sala 1977ê ew diçe Qudsê û rê li ber mohrkirina peymana aştîyê bi Îsraelê re vedike.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 13x18cm

# Hikûmeteke fasî di bin kontrola qraltîyê de

Wendy Kristianasen *



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 20x20cm

Li Rabatê Partîya Edalet û Bipêşketinê ev cara yekem e ku welêt bi rê ve dibe. Li ser mijarên civakî ji qrêl bêhtir muhafezekar e, lê belê ew rewatîya qraltîyê naxe ber lêpirsînê.

"*Fas ne demokrasîyek e, lê 'bihara erebî' pêşketineke bi rastî* [ya ber bi vê armancê ve] *ye. Ji bo welatê me ew şoreşek e!"* **Mustafa Ramîd**, wezîrê adaletê yê hikûmeta koalîsyonekê ye ku cara yekem e ji aliyê îslamîstekî bi navê **Abdelilah Benkirane** û partîya wî ya *Adalet û Pêşketinê* (PAP) ve tê birêvebirin, bawer nedikir tiştekî wisa biqewime. Heta wê demê, Ramid endamekî serhildêr yê partîya îslamîst bû ku doza reformên siyasî weke şertê tevlîbûna hilbijartinan dikir.

Bi xwepêşandanên cihana erebî re di heman demê de xwepêşandanan dest pê dikir, 20ê sibata 2011ê bi hezaran kes daketin kolanên Rabatê, Kazablanka û Marakeşê. **Melik Muhammedê 5.** di 9ê adara 2011ê de bi wawayekî jîr bersiv da û da zanîn ku reformên cihê wê pêk werin. Di 17ê hezîranê de wî peşniyaza *Destûreke Bingehîn* dikir, ku ew neçar dihişt serokwezîrekî di nava endamên partîya xwedî pirranîya parlementerî de bibijêre û erka betalkirina parlementoyê jî bide wî. Melik herwiha biryara fermîkirina zimanê ***berberî*** da û ev ziman li yê erebî zêde kir. Di 1ê hezîranê de ev peşniyaz ji alîyê % 98.5ê hilbijêran ve hat qebûlkirin, hejmara fermî ya tevlîbûna vê referedumê – ya ku li ser nîqaş hene – gihîşt nêzîkî % 73ê. Di 25ê çirîya paşîn de, di hilbijartinên giştî yên pêşwext de PAPê piranîya nisbî bi dest xist (ji 325 kursîyên parlementoyê bû xwedîyê 107an).

Rast e ku bersiva bi lez ya melîk, pêşî li serhildanekê girt (1), lê dîsa jî gelo mirov dikare bibêje ku li Fasê tişt guhertine? **Benkirane** sala 2007ê rave dike ku armanca wî "azadî û demokrasî bû, lê di nava sînorên hin xetên sor de" - nexasim jî xeta serdestîya melik . Çapemenî her çend hinekî azadtir be jî, civak her çend hişyartir be jî, ev xetên sor hêj li cihê xwe ne. Em niha dikarin behsa bertîlxwarinê bikin, ji xeynî yên di nava cemaetên melik de diqewimin: di nava burokrasîya qesrê de bicîhkirina nas û hevalên xwe (makhzen) yan jî pênc caran ji berê zêdetirbûna dewlemendîya meliktîyê – ku gihişt 25 milyar dolaran – bi saya kontrolkirina kanên fosfatê yên welêt, mijarên bi vî rengî hêj tabû ne.

Îslamîst di rastîyê de xwedî hêzeke çawa ne? Di çarçoveya koalîsyona pêkhatî de, PAPyê ku endamê Tevgera Birayên Misilman e, ji sîhûyek wezîran bi tenê xwedîyê duanzdehan e. Aborî di destê **Nizar Baraka** de ye, endamê Partîya rastgir Istîqlalê (ku berê desthilatdar bû); karên derve, yên hundir û yên tûrîzmê hersê girêdayî "wezîrên mêşmirî" [yên tu hêza wan tune ye, nota wergêr] ne ku *makhzenê* ew wezîfedar kirî û di pratîkê de xwedîyê hêzê ne. Bi vî rengî di dema serdana xwe de, Wezîra Karê Derve ya ya amerîkî **Hillary Clinton** adara 2012ê, berîya ku wezîfedarê fermî bibîne, hevdîtinek bi şewirmendên melik ên karên derve re pêk anî. Tevî ku ew şêwirmendên navbirî, weke kevne wezîrê karên hundir **Ali Al-Himma**, yek ji armancên sereke yên Tevgera 20ê Sibatê bûn. Zanîna ku melik hêj artêşê, hêzên ewlekarîyê û îstixbaratê bi rê ve dibe, tu kesî matmayî nahêle; ew herwiha serokê konseya wezîran û yê konseya zanyaran e jî, û ew berpirsiyar e ji kontrolkirina mizgeft û îmaman.

Ji xeynî reformên Destûra Bingehîn, xwepêşandêran doza nan û kar jî dikir. Lê krîza malî ya ewropî, kêmbûna turîzmê û bernegirtina zevîyên genim, derbeke hişk li welêt xistin, li Fasê ji her du xortan yek bêkar e. Ango îslamîst li hikûmetê ne, lê hêz ne di destê wan de ye. Ramid li xwe mikur tê – ew yek ji kêm wezîran e ku li tiştan mikur tê – ku *"di nava koalîsyonê de pirsgirêk hene": "bêyî partîya ku divê em koalîsyonê pêre pêk bînin, me karîbû zûtir û bi awayekî bikêrhatîtir dest werda.* (2)" Lê dîsa jî ew xwedî hesteke erênî ye: *"dîroka me baş dest pê kir û hêvîdar im wê baş bi dawî bibe."* Ew amade ye reformkirina sîstema hiqûqî bi xwe bi rê ve bibe: *"di nava xwe de dabeşkirina erk û wezîfeyan bi awayekî demokratîktir pêk hat – lê belê dîsa jî bi rengê fasî bû."*

Mezintirîn avantaja PAPê hebûna Benkirane ye, zilamekî navdar, karîzmatîk, yê bi axaftina xwe ya eşkere û deqerû ji destnedaye û ku bi zimanê erebîya Fasê – bi *darija*yê - xwe îfade dike. Wexta ew berê xwe dide guhdarên xwe yên rû bi rû yan jî li peşîya bi hezaran kesî dipeyive, ew awirên hişk vedide weke ku di konferansa PAPê ya hezîrana 2012ê de kiribû. Çavdêrekî ku meyildarê fikra lîberal, yê jê nayê bawer kirin ku sempatîya wî bi PAPyê hebe, rêzê jê re digire, lewra ew yekem kes e yê ku bi awayekî fermî gotî, êdî nabe zêde fînansekirina pêdivîyên sereke bidomîne û lazim bû buhayê mazotê were zêdekirin, *"wî bi awayekî eşkere ji fasîyan re got, alternatîfeke din tuneye. Jê hat ku vê mijara zehmet bide qebûlkirin ji ber ku li ber çavên gel ew xwedî rewatîyê ye".*



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 20x20cm

Gelo PAP rewşa xwe çawa dibîne? Sekretê giştî **Sliman Elotmanî** wisa bersivê dide *"hilbijartinên 2011ê nişana destpêka pêvajoyeke demkin a guhertina demokrtîk in, karkirina bi sendîkayan, bi civaka sîvîl û bi melik re wezîfeya PAPê û ya partiyên din e. Armanca me di pratîkê de pêkanîna Destûra Bingehîn a nû ye, ku heta niha bi tenê parçeyek kaxez e."* Ew weha dirêjîyê dide gotina xwe*: "Mala xwedê ava, bihara erebî em xilas kirin! Lê dawî li jiyana xwe anîna **Muhamed Buazizi** her çend bûbe sedema hilweşîna rejîma tunisî jî, li Fasê rewş guhertî ye. Zilma li Tûnisê hebû li vir tune ye, ne jî şerekî navxweyî ku bû sedema du sed hezar kuştinan çawa ku li Cezaîrê qewimîbû. Li vir rewabûna rejîmê nikare bikeve ber lêpirsînê. Tevî ku kêmasîyên me hebûn û yên demokrasîyê jî hebûn, PAPê nexwest rewabûna rejîmê bixe ber lêpirspinê. Em li çareserîyeke ku di nîvê rê de li nava herdû tiştan bibe, digerîyan.*"

Ev daxwaza lihevkirinê bu sedema gelek rexneyan, nexasim yên rêxistina herî bi têsîr a meliktîyê, Al-Adl Wal-Ihsan ("Adalet û Qencî"), tevgereke îslamîst ku hebûna wê nehat qedexekirin lê herweha nehat qebûlkirin jî. Wê PAP bi erzanî firotina îdealên xwe gunehbar kir. Rêxistina Al-Adl Wal-Ihsan, ku di bin birêveberiya Şêx Abdessalam Yassin û ya keça wî Nadia Yassin - nûnera wî - de ye, rewabûna meliktîyê qebûl nake. Ew tevlî Tevgera 20ê Sibatê bû, lê xwe paş ve kişand. Endamê konseya sîyasî ya rêxistinê, **Hicham Attouch** weha rave dike: "ev xwepaşvekişandineke taktîkî bû. Tevger bi komên piçûk ên çepgir ku hewl dan rêveberîya wê bi dest bixin, baş nehat birêvebirin."

Salek piştî serketina PAPyê ya di hilbijartinan de, gelê Fasê bi çavên guhertî li hikûmeta xwe dinêre. Rexneyên herî hişk ji komeke çalak ya kadroyên bajarî tê, ew xwedî fikrên pêşbir û laîk in – her çend piranîya wan misilmanên dîndar bin jî. Piranîya rexneyan li ser mijara pirsgirêkên civakî ne, nexasim li ser mijara statuya jinan in. Hebûna jineke bi tenê di birêveberiya PAPyê de, xanim **Bassima Hakkaoui** ku berpirsiyara hevkarîya jinan, ya malbat û ya pêşketina civakî ye, ji bo wan ne tiştekî tesadufî ye. Gelo maneya vê çi ye, eger em zanibin ku xanima wezîr ya navbirî duyem jina wezîrê adaletê (yê polîgam) ye? Ev gumanbirin eleqedarî reforma Qanûna Malbatê (*Moudawana)* ye, ku di dawîyê de sala 2004ê bi daxwaza melik ê ku mafên nû dan jinan (3) hat pêkanîn. Lihevkirina li ser *Tunekirina Tevahiya Şêwazên Cudakarîya* li dijî jinan (Convention on the Elimination of All Forms of Discrimination against Women, CEDAW), sala 1993ê ji alîyê Fasê ve hatibû mohrkirin, lê bi şertê ku li dijberî adetên şerîetê ranebe. Sala 2008ê, bêyî ku haya parlemanê pê bixe, melik da zanîn ku ev şîroveya wî "*betal bûbû*".

**Muhamed Tozy** pisporekî tevgerên siyasî ye, ew armancên zehmet ên li pêşîya PAPyê rave dike: *"Burjuwazî û burjuwazîya piçûk ku di heman demê de muhafazekar û gelêrî ne, dengên xwe dan wî; lê niha divê ew werin seferber kirin. Entelektuelên bajarî endamên PAPyê rexne dikin ji ber ku ew kesên ku xwe gihandin armancekê ne, ew xelkê gundî ne* [ango ne endamên çîna burjuwayê ne]. *Ya rastî ev e ku hêza wan ji nêzîkbûna wan a bi gel re tê, lê ev yek bi saya kokên wan ên gundî pêk tê û bi saya îdeolojîya wan pêk nayê."* Weke li deverên din jî, li wir îslamîst baş organîze kirî ne, *"Lê pirsgirêka wan ev e ku divê welêt modernîze bikin, tevî ku divê bingeha xwe ya muhafazekar biparêzin û ku ew bi xwe bi timamî li dijî her şêweyê modernbûna civakî ne".*

* Serredaktora weşana bi zimanê inglîzî ya Le Monde diplomatique û nivîskara *Voyages au cœur de la planète islam* (Gera di nav dilê cihana Îslam de), Editions du Cygne, Parîs, 2011.

1 Nicolas Pelham, "How Morocco Dodged the Arab Spring" (Fasê çawa xwe ji bihara erebî xilas kir) , New York Review of Books Blog, 5ê hezîrana 2012ê.

2 Partiyên din yên koalîsiyonê ev in : Istîqlal, ku bi roleke pir girîng rabû di pêkanîna serxwebûna welêt de; Tevgera neteweyî ya gel, partîyeke ku ji dewlemendên gundî pêk tê û Partîya Pêşketin û Sosiyalîzmê (PPS, kevne-komunîst).

3 Berhema li jêr bixwîne: "Débats entre femmes en terre d'islam / Nîqaşên di navbera jinan de li ser erdên îslamê" û "Femmes, le droit au divorce s'installe / Jin, mafê veqetînê xwe bi cîh dike », *Le Monde diplomatique,* nîsana 2004ê û tebaxa 2007ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

www.diplomatiquekurdi.org

Piştî ku du mehan artêşên deryayî yên filîpînî û çînî li hember hev rawestîyan, niha êdî li alîyê Japonyayê û giravên Senkaku/ Diaoyuyê dijberî zêde û berfireh dibin. Di nîvê çirîya pêşîn de di dema manewrayên eskerî de Artêşa Deryayî ya Çînî xwe nêzî peravên li ser wan nehatî lihevkirin kir, di heman demê de kêştîya hilgir a balefirên Amerîkî "USS-George-Washington"ê li Derya Başûrê Çînê hêza xwe nîşan dida.

Alozîya di navbera Çîn, Japonya, Koreya Başûr, Vîyetnam û Filîpînan de

# Şerên neteweperestîyan li Derya Çînê

Stephanie Kleine-Ahlbrandt *

Ev çend meh in, alozîyên di navbera hikûmetên li Derya Çînê de bênavber gurr dibin. Di nîsana 2012ê de, parazvanên peravan ên filîpînî gef xwarin ku ew ê guleyan bibarînin li kêştîyên masîgirîyê yên çînî yên li deryayên mijara lihevnekirinê yên li çîyayê beravê ***Scarborough***ê. Di hezîranê de, Vîyetnamê biryara vekirina rêyên deryayî yên nêzîkî giravên ***Spratly*** û ***Paracels***ê dide; Çîn vê yekê rexne dike û dide zanîn ku ew ê vê koma giravan a mirov lê tunene dagir bike. Di îlonê de, alozî li ser giravên bi navê ***Senkaku*** li Japonyayê û ***Diaoyu*** li Çînê derdikevin holê. Lewra hikûmeta Japonî daxwaza xwe ya neteweyîkirina çend giravên piçûk ên volqanî ku kes li wan nîne, dabû zanîn. Bi cezayên aborî, bi xwepêşandanên li dijî Japonyayê li çend bajarên mezin bi şandina parazvanên peravan ber bi cihê mijara lihevnekirinê, Pekînê bersiv da. (1)

Mezinbûna alozîyên nîşana sîyaseta nû ya Çînê ya "weke bersiv, xwe dana pêş" e ku di her derfeta lihevnekirinê de li ser xeta sînor hêza xwe nîşan dide û hewl dide statukoya erdî li gorî berjewendîya xwe biguhere. Ev helwest qûtbûnek e ji sîyaseta normalkirinê ya serokkomar **Deng Xiaoping** ya dawîya salên 1970yî ye ku armanca wê dawîanîna li pevçûnên desthilatdarîyê û avakirina têkîlîyên biratîyê bi welatên cîran re bû. Wî ev yek wisa terîf dikir: *"Nîşandana desthilatdarîya me, dana alî ya alozîyan, ketina rêya pêşketineke hevpar."* Sala 2000î, wezîrê karên derve **Tang Jiaxuan** ev stratejî didomand : *"wexta şert û merc destûrê nadin dîtina çareserîyeke demdirêj ji pirsgirêkeke erdî re, axaftinên li ser armancên desthilatdarîyê dikarin werin paşvexistin da ku pevçûnê aş bikin. Maneya* [vê yekê] *ne dev ji desthilatdarîyê berdan e. Armanc bi tenê dana alîyekî ya pevçûnê ye ji bo demeke dîyar.* (2) »

Derya başûrê Çînê bi çavkanîyên hîdrokarburê [petrol û gaza xwezayî] û bi çavkanîyên avê dewlemend e, xwedî pirr rêyên deryayî yên herî zêde tên bikaranîn yên cîhanê ye, ev cîhek e ku berjewendîyên Çînê, yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û yên welatên Başûr-Rojhilatê Asyayê li rasta hev tên: Vîyetnam, Filîpîn, Malezya, Bruney tên hemberî hev.

Herçî welatê Çînê ye, hejmareke bilind a aktorên sîyasî û aborî ji bo berjewendîyên xwe sûd ji van alozîyan wergirtin, vê jî kir ku hikûmet dengê xwe neke. Pirhejmara şirketên çînî ku li ber derya başûr xwe bi pêş dixin, li welatên cîran weke *"neh hûtên ku hêrsa deryayê radikin tên nirxandin"*. (3) Di nav yên ku wisa dinirxînin de, hikûmetên herêmî, hêzên deryayî, wezareta hawîrdorê, şirketên dewletê, hêzên ewlekarîyê, gumrik yan jî wezareta karên derve hene.

Hikûmetên herêmên li ber deryayê li ***Hainan***, ***Guangxi*** û ***Guangdong***ê li bazarên nû ji bo malên şirketên wan hilberandî digerin - serketina şirketên wan, serketina wan di nava sîstema sîyasî de mîsoger dike. Heta ku ew dilsozîya xwe bi Partîya Komunîst re xirab nekin, di warê îdareya karên xwe yên bazirganîyê yên herêmî de, ew xwedî derfetên fereh in. Meşandina sîyaseteke pêşketinê bi ya ferehkirina xweserîya rayedarên herêmî, çavbirçîtî xurt kirin. Lewra hikûmetên herêmî destûr dan masîgirên xwe da ku di deryayê de dûrtir biçin cîhên mijara lihevenekirinê, vê jî rêya ferzkirina modernkirina kêştîyên masîgiran û bi ferzkirina xwedîbûna wan a sîstemên navîgasyonên bi satelîtê vekir. (4) Li pêş bûna, dayîna destûrên masîgirtinê ji kêştîyên herî mezin re jî helwesteke bi vî rengî pêk tîne.

Hikûmeta Hainanê herwiha pirr caran hewl da tûrîzmê li giravên Parecels bi pêş bixe, tevî protestoyên dijwar ên Vîyetnamê (5) "pêşî bikin, pişt re bifikirin », wisa xuya ye ku ya ku rayedarên herêmî dixwazin bikin ev e di têkilîya xwe ya bi Pekînê re. Ew di enîya şerê aborî de kevirên xwe heta karibin dûrtir bi cîh dikin û bi tenê wexta desthilatdarîya navendî nerazî dibe xwe paş ve dikşînin.

Di heman demê de, rikberîya di navbera herdû polîsên deryayî yên herî bi lez ên welêt de – polîsê çavdêrîya deryayê ku girêdayî wezareta erd û çavkanîyan e û rayedarîya parastina qanûnên li ser masîgirîyê ku girêdayî wezareta cotkarîyê ye – bi bilindbûna hejmara kêştîyên wan û bi dûrtir çûyîna wan ber bi cîhên mijara lihevnekirinê, xwe nîşan dide. Her du ajans ku dixwazin piştgirî û îmtîyazên wezaretên girêdayîyê wan in bi dest bixin, hewl didin sînorên mafên xwe ferehtir bikin da ku budceyên mezintir bi dest bixin. Ji bo herduyan, dest avêtina mafên erdî û deryayî yên mijara pevçûnê ne, beşek ji stratejîya mezinkirina prestîja navxweyî ye. Li alîyê din, dewleta çînî difikire ku bikaranîna îdareyên sîvîl jêre bi fêde ye, lewra ev yek îhtîmala pevçûneke yekser ya leşkerî ji holê radike.

Lê her çend bikaranîna parêzvanekî polîsê deryayî ji bikaranîna kêştîyeke şerî kêmtir zirarê bide jî, zêde bikaranîna wî weke rêbaza desthilatdarîya neteweyî tenê dikare hejmara rûnan zêde bike. Kêştîyên masîgirtinê jî her diçe zêdetir bi rola nîşandana alayên welêt li deryayê radibin û alozîyên bi avahîyên welatên cîran ên li peravê deryayê re zêdetir bi tehlûke dikin.

Tevî ku hêzên deryayî yên Çînê xwe li deryaya Başûr zêdetir nîşan didin, ew heta niha bi tenê bi roleke piçûk rabûn. Eger qezayek rûbide yan jî bûyerek biqewime, temsîlên wan yan paş ve dimînin yan jî bi derengî xwe digihînin cîhê bûyerê, bi vî rengî ew dihêlin ku rayedarên herêmî pirsgirêkê kontrol bikin. Bi ser de jî bi awayekî veşartî mezinbûn û modernîzekirina hêzên deryayî yên Çînê, dibe sedema zêdebûna alozîyan, lewra ev yek welatên din neçar dike ku ew jî hêzên xwe yên leşkerî yên deryayî mezin bikin.

Ya normal ew e ku wezareta karên derve bi roleke sereke rabe. Lê di pratîkê de, tu otorîteya wê nîne. Çavdêrekî ku pişta kûlîsan li Pekînê dibîne, bi henekî îdîa dike ku, wezîrê wezîfedar **Yang Jiechi**, *"xwedî hêzeke ji ya alîkarê şewirmendê dewletê yê bi navê Dai Bingguoyê kêmtir e"*.

Ji dema ku yên bi rastî xwedî hêza dewletê ne – wezareta bazirganîyê, ya fînansê û ya ewlekarîya dewletê, û herwiha Komîsîyona neteweyî ya bipêşketin û reformê – desthilatdarîya sîyaseta derve xistin destê xwe û vir ve, pirsgirêk hê mezintir bû. Ev rola fîguratîyê wezareta karên derve aciz dike, lewra dengên ku bang li dîplomasîya çînî dikin da ku li gorî mezinahîya têsîra aborî û herêmî ya welêt berpirsîyarîyên xwe bigire ser milên xwe, zêdetir dibin.

Hikûmet herçend meyldarê sûdwergirtina ji hesta neteweyî ya gel be jî, ev lîstik dikare wê bi bin bixe. Di destpêka sala 2012ê de, wexta wezareta karên derve xwest alozîyan aş bike û rave kir ku qet nîyeta Çînê ya bidestxistina tevahîya derya Çînê ya başûr nîne. Ev înîsîyatîf bû sedema nerazîbûneke hişk di raya giştî de ku bi dehsalan jêre berevajîyê vê yekê hatibû pirrcarîkirin. (6) hejmareke mezin a bikarhênerên înternetê banga paqijkirina partîya komûnîst dikin ya ku ew guneh bar dikin ku di navê de *"xayîn"* û *"bertîlxurên"* ku *"xwîn û xweydana gel dimijin"* û *"berjewendîyên Çînê bi erzanî difiroşin"* hene. (7) Tirsa rêveberan ew e ku kîndarîyên bi vî rengî belav bibin û bibin sedema alozîyên ku mumkin e zirarê li îstîqrara welêt bikin.

Herçî desthilatdarî ye, ew bêdudilî heyfa xwe hiltîne. Bûyerên ku di nîsana 2012ê de qewimî nîşana vê yekê ne. Di destpêkê de, dema masîgirên çînî bi awayekî neqanûnî ketin nav avên wê, Filîpînê bi rêya şandina kêştîyeke leşkerî bersiv dabû. Ev ji Çînê re dibe derfet da ku mafên xwe yên milkiyeta çîyayê ber deryayê bi bîr bixîne, komek kêştîyên ewlekarîyê bişîne herêmê û bikaranîna vê herêmê ji masîgirên filîpînî re qedexe bike. Îxracata mêweyên hêremên tropîkal ku ji Filîpînê tên û tûrîzm tên sekinandin. Bi rêya bidestxistina kontrola çîyayê ber deryayê yê Scarboroughê û astengkirina bikaranîna herêmê li Filîpînîyan, Çînê, di pratîkê de rewşeke nû ya sûdê jê werdigire, afirand.

### Tokyo tê gunehbarkirin ku ji bo Washingtonê dixebite

Dema Vîyetnamê qanûnek erê kir a ku rêyên deryayî yên nû vedike li giravên ***Spratly*** û ***Paracels***ê, Pekînê bi qasî di bûyera Filîpînê de destê xwe giran kir. Desthilatdarîya ku hêrsa wê rabûbû, di cîh de avakirina herêmeke bi navê ***Sansha City*** ku di bin kontrola birêveberîya wê de ye û bicîhkirina garnîzoneke leşkerî îlan kir. Da ku piştgirîya vê yekê bike, *China National Offshore Oil Corporation* (CNOOC)ê destûrên bikaranîna çavkanîyên petrolî li ser neh sîteyên ku li herêma aborî ya bi tenê ya Vîyetnamê de bicîhbûyî ne da, lê ev sîte ji berê ve ji alîyê şîrketa Petro Vîyetnamê ve tên xebitandin.

Hewldanên vîyetnamî û filîpînî ji bo ku vê mijarê bixin di rojeva çilûpêncem civîna wezaretî ya Rêxistina Neteweyên Asyaya Başûr-Rojhilat (RNABR, bi îngilîzî ASEAN) ya hezîrana 2012ê pêkhatî, ji ber destwerdana Kamboçyaya ku civîn organîze dikir, têkçû – vê jî kêfa Pekînê anî. Zehmet e mirov di van bûyeran de nîşana stratejîyeke çînî nebîne ku armanca wê *"çareserkirina her pirsgirêkê bi awayekî cihê û di van alozîyan de yeko yeko biserketin e »*. (8)

Tevî ku wisa xuya dikir ku alozîyên li derya Çînê ya başûr gihabûn asta xwe ya herî bilind jî, vê havînê, krîzeke din di meha îlonê de li rojhilatê Çînê da der, lewra hikûmeta japonî da zanîn ku wê bibe xwedîyê giravên ***Senkaku-Diaoyu*** yên heta niha di destê bazirganekî pirr dewlemend yê japonî de bûn. (9) Desthilatdarîya japonî vê yeke bi daxwaza astengkirina walîyê neteweperest yê Tokyoyê rave kir. Japonyayê herwiha ev yek bi daxwaza xwe ya qedandina vê operasyonê berî serokdewletê nû yê bi navê **Xi Jinping** bibe desthilatdar, rave kir da ku "şeqamekê li rûyê wî nexin" berîya ku li ser textê xwe rûne. Pekîn bi awayekî hişk bersiv dide.

Li vî alîyê Asyayê, neteweperestî ji herêma derya Başûr zêdetir têsîrê li lihevnekirinên li ser sînoran dikin û wan gelekî har dikin. (10) Ji ber hovîtîya di dema dagirkerîya japonî de, alozîya li ser statuya giravên ***Senkaku-Diaoyu*** dibe sedema kîneke ji tevahîya alozîyên din ên li ser erdê qat bi qat zêdetir. Bersivên pir hişk ji alîyê Koreya Başûr ve jî tên, ji ber alozîya li ser girava – ku japonî navê ***Takeshima*** lê dikin û Koreyîyên Başûr navê ***Dokdo*** lê dikin. Hejmareke zêde ya japonîyan xwe di bin tehdîtê de hîs dikin ji ber mezinbûna hêza "hûtê" çînî, ew ditirsin ku mezinbûna wî zirarê li desthilatdarîya wan bike.

Berê ji Çînê dihat ku hesta netewperest a gel manîpule bike, lê têsîra li gel dike êdî kêm bû. Belavbûna teknolojîyên nû yên agahdarî û ragihandinê cîhekî nû afirandin ku dengê li dijî-japonîbûnê lê deng vedide, ev yek dike ku ev deng karibe textê desthilatdarîyê bihejîne. Nerazîbûna neteweperst ku fikra bibinketina hikûmetê di tekoşîna li dijî Tokyoyê de xurt dike, xwe zêde dike li hesta bêhevîmana li hemberî bertîlxwarînê, li tunebûna sîstemeke parastina civakî, li pirsgirêkên girêdayî tunebûna ewlekarîyê û li pirr zêdebûna buhayên xanîyan.

Bi ser de jî, nifşê berê di Şerê Cîhanê yê Duyem de li dijî leşkerên japonî şer kirîbû û piştgirîya helwesteke ji bo aştîyê rewa dibîne, hêdî hêdî winda dibe. Li gorî beşeke dîplomatên niha hefsar di destê wan de, eger Çîn di warê aborîyê de ji Japonya û ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bibihure, ew dikare vê yekê di demeke kin de pêk bîne, wê êdî pêwîst nebe serê xwe bi aşkirina dilê hêzên dijber biêşîne. Bala wan her diçe zêdetir diçe ser têkilîyên çîno-amerîkî û her diçe kêmtir diçe ser têkîlîyên çîno-japonî. Li gorî gelek berpirsîyaran, Tokyo bi tenê taşeroneke Washingtonê ye. Ew dibêjin, sîyaseta derve ya japonî girêdayî stratejîya asyayî ya Dewletên Yekbûyî ye, ku armanca wê rê girtina li ber mezinbûna hêza nû ya çînî ye. (11)

Bersiva Pekînê da bidestxistina japonî ya giravên ***Senkaku-Diaoyu*** hê hişktir bû bi danezana ku wê Çîn cezayên aborî li Japonîyayê bibire û wê manevrayên fereh yên leşkerî bimeşîne, manevrayên deryayî, hewayî û yên barandina fuzeyên stratejîk jî di navê de. Bi ser de jî, desthilatdarîyê belgeyeke hiqûqî amade kir ku xeteke sînor dîyar dike ya ku mirov nikare jê bibihure û ya ku giravên navbirî *de facto* [di pratîkê de] dixe bin kontrola birêveberîya çînî. Bêyî bi xwe ve girêdana erdan a fermî, çîn pişta xwe rast dike jî bo kêştîyên xwe yê polîsî bişîne herêmeke di bin kontrola notirvanên japonî de bû – ev jî îhtîmala rûdana bûyerên nû mezin dike. Mezinbûna neteweperestîyan, pêşbazîya budceyên leşkerî, tunebûna rêveberîyeke herêmî û lawazbûna demên guhertina sîyasî tehlûkeya ketina nava xeleka şeran li derya Çînê mezin dike; di van salên dawî de lawazbûna sazî, çerx û pêvajoyên ku belkî karîbûn vê hilkişîyana ber bi jorê ve hinekî hêdî bikin, vê tehlûkeyê hê mezintir dike.

* Berpirsîyara beşa Çîn û Asyaya Bakûr-Rojhilat a International Crisis Group li Pekînê.

(1) "Dangerous Waters" (Avên bi tehlûke), *Foreign Policy*, Washington, DC, 17ê îlona 2012ê.

(2) «Nîqaşê li alîyekî bihêlin û bipêşketina bihevre bidin ber xwe», wezareta karê derve ya Komara Gel a Çînê, 17 çirîya paşîn a 2000î. Bigire li ber «Rûpelê spî li ser bipêşketina aştîyane ya çînê», Buroya agahdarkirinê ya Konseya Dewletê, 6ê îlona 2011ê.

(3) « Stirring up the South China Sea (I) » (Tevdana Derya Başûr a Çînê (I)), *Asia Report,* n° 223, International Crisis Group, Pekîn, 23yê nîsana 2012ê.

(4) Ev sîstem herwiha destûrê didin hêzên leşkerî yên çînî mudaxaleyê bilêztir bikin eger pevçûnek biqewime, weke ku li çiyayê ber deryayê Scarborougê qewimî. *Binêre li* "Fish Story" (çîroka masîyan), *Foreign Policy*, 25ê hezîrana 2012ê.

(5) "Stirring up the South China Sea (I)" (Tevdana Derya Başûr a Çînê (Î)), berhema li jor navborî.

(6) Konferanseke çapemenîyê ya nûnerê wezîrê karên derve, birêz Hong Lei, 29ê sibata 2012ê. Weke nimûne *binêre li* "Half of China's territorial waters are in dispute and eight neighbor countries have raised unreasonable demands" (li ser nîvê milkê deryayî yê Çînê nehatîye lihevkirin û heşt welatên cîran dozên nementiqî kirin), *Outlook Weekly*, Delhi, 15ê nîsana 2009ê.

(7) "How the elite traitors sell out China's interests in the South China Sea" (Çawa xayînên elîtê berjewendîyên Çînê bi erzanî difiroşin li Derya Başûr a Çînê), 1ê tîrmeha 2011ê, www.china.com ; "South China Sea traitors, enemies of the people, eternal infamy" (xayînên Derya Başûr a Çînê, dijminên gel, şermeke bêdawî) , *Nansha Islands Forum*, 15ê gulana 2012ê.

(8) Ev peyv di gelek metnên çapemenîya çînî de tê dîtin. *Binêre li* "Yu Zhirong : 'Establish Sansha City to teach Vîyetnam a lesson'" (Yu Zhirong : Sansha Cityê bi cîh bike da ku dersekê bidî Vîyetnamê) , *Global Times*, Pekîn, 25ê hezîrana 2012ê.

(9) Christian Kessler, "Iles Senkaku-Diaoy, aux origines du conflit sino-japonais" (giravên Senkaku-Diaoy sedema şerê çîno-japonî ye), Planète Asie, Blogên Diployê, 25ê îlona 2012ê.

(10) "China and Japan's simmering island row is threatening to boil over" (girava Çîn û Japonîyayê ya ku dikele, niha li ber fûrînê ye)", *The Guardian*, London, 20ê tebaxa 2012ê.

(11) "Nationalism in Japan: Beware the Populists" (Neteweperestî li Japonyayê: hay ji populîstan hebin) , *The Economist*, London, 6ê çirîya pêşîn a 2012ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

## Gava ku hûqûqa navneteweyî pevçûnan gurr dike

Her çend bûyerên li Derya Çînê di van du salên dawî de qat bi qat bibin jî, piraniya şerên li mijara milkîyeta erdan di dema piştî Şerê Cîhanê yê Duyem de dest pê kirîbûn. Lihevkirina Neteweyên Yekbûyî li ser Hiqûqa Deryayê (LNYHD) ya sala 1982ê hatî mohrkirin, bû sedema ji nû ve gijbûna alozî û pevçûnan. Ev lihevkirin, Herêmên Aborî yên Taybet (HAT) yên fireh (650 kîlometre) bi cîh dike, heta li deverên hinekî dûrî avên nêzî peravan (heta 22 kîlometreyan dûrî peravan). Ev lihevkirin destûrê dide dewletekê da ku çavkanîyên enerjîyê, avê û hwd. bi kar bîne. Pêkanîna wê bi dirêjiya dehsalekê domand. Sala 1996ê, Japonyayê û dûvre jî Çînê ew mohr kir; niha 192 neteweyan ew qebûl kiriye – Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hê jî wê mohrkirinê red dikin

Weke ku lêkolînêr **Gavan McCormack**, pisporê navdar ê Japonyayê, dinirxîne *"Her çî karên deryayê ne, yek ji têsîrên vê lihevkirinê xurtkirina mafên Japonyayê weke hêza girîng a cîhanî bû. Newekhevîya rewşa Çînê gelekî berbiçav e. Bi vî rengî herdu welatên ku xwedî heman dirêjîya peravan in (30 017 kîlometre li Çînê, 29 020kîlometre li Japonyayê) dûrî hev dikevin. (…) Japonya xwedîyê HATeke bi 4.5 milyon kîlometre kare ye, ev yek dike ku Japonya di lîsteya rêjeyên cîhanê de nehem welatê xwedî HATeke fereh be – ango pênc caran ji Çînê bêhtir, ew bi tenê xwedî 879 666 kîlometre kare ye û di rêjêya cîhanê de ew welatê 31. e, di navbera Maldives û Somalîyê de."* Li gorî **Mc Cormack**, welatê Çînê ku di bin zexta *"êrîşên hêzên emperyalîst de ye [brîtanî, fransî, amerîkî, japonî] û ku xwedî pirsgirêkên navxweyî ye, di pêvajoya dabeşkirina Pasîfîkê de ya sedsalên 19 û 20an, nebû xwedîyê tu rolekê."* (1)

Bi mezinbûna hêza xwe, Çînê dest bi xistina ber lêpirsînê ya vê dabeşkirinê kir. Berîya her tiştî di kaxezên fermî yên welêt de. Û sala 2009ê bi awayekî eşkere ev yek kir, dema ku lîsteya daxwazên xwe li pêş Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) raxist. Herêma deryayî ku tê xwestin – ya bi navê nedîyar "avên ji nû ve bidestxistî" - ya bi "xeteke ji neh xîşkan pêk tê" hatî sînordarkirin, piranîya Deryaya Çînê ya Başûr pêk tîne. Eger em wisa bihesibînin ku armancên Pekînê yên li ser giravên ew doza wan dike bi cih werin, hingê desthilatdarîya welêt wê di warê hûqûqî de bihata qebûl kirin û sînorên wê dê ji yên niha xwestî bi gelekî wêdetir biçûyana.

Li alîyekî din, Vîyetnam û Filîpîn, mumkuniyeta hebûna kanên petrolê û dewlemendîyên deryayî cazib dibînin, bi helwesteke her diçe hişktir tevdigerin. Tevî ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hêzên xwe ji nû ve lê zêde dike, lêçûnên eskerî yên welatên Asyaya Başûr-Rojhilat (ANASE) meyldarê bilinbûnê ne. Tehlûkeyên vê herêmê her diçe zêdetir dibin.

(1) Gavan McCormack, "Troubled seas: Japan's Pacific and East China Sea Domains (and Claims)" (Deryayên bi Pirsgirêk: qadên deryayî (û daxwazên) yên Pasîfîka Japonyayê û Rojhilatê Çînê) , *Japan Focus*, Tokyo, îlona 2012.

Serokkomarê Fransayê François Hollande 13ê çirîya pêşîn a derbasbûyî ji bo civîna bilind a Rêxistina Navneteweyî ya Fransîaxivîyê (OIF) li Kînşasa bû, wî bi awayekî eşkere navbera dûrîyê ya di nava xwe û hevpîşeyê xwe yê kongoyî Joseph Kabila de parast. Tevî ku Kabila otorîtarîzma xwe piştrast dike jî, dîplomatên navneteweyî berîya hertiştî gazinan jê dikin, ji ber ku jê nayê otorîteya dewletê li Kivuyên di nava şer de bi cîh bike.

## Çavmiçînka Dîplomatîk li Kongoyê

# Kî bi rastî doza aştîyê dike li Kivuyê?

Juan Branco *

Li Kampalayê, tebaxa 2012ê. Paytexta Ugandayê dibe sehneya yek ji wan baloyên bi maske yên ku wisa xuya ye dîplomat pisporê wan in. Di Konferansa Navneteweyî li ser Golên Mezin (KNGM) de (1) ya ji aliyê **Yoweri Museveni** ve hatî organîze kirin, serokdewletên Kongo û Ruwandayê, **Joseph Kabila** û **Paul Kagamé**, lihevkirineke sexte li ser krîza ku ji 1996ê û vir ve Kîvuya Bakur (Komara Demokratîk ya Kongoyê, KDK) dide ber xwe.

Aloziya li Kîvuya Bakur, bi kuştina bi sedan eskerên, ku kevne serhildêrên nû tevlî arteşê bûyî, ji bihara 2012ê û vir ve, ji nû ve mezin bû. M23 (kevne rêxistina bi navê Konseya Neteweyî ya Gel, KNG) tevgereke nû ya serhildêr e ku piranîya wê *tutsî* ne – Ruwanda li pişt perdeyan piştigirîya wê dike – wê di nava çend hefteyan de kontrola pirranîya heremê bi dest xist û bû sedema kuştina bi hezaran sîvîlan û ya ji nû ve çalakbûna mîlîsên ji bîr kirî.

Tevî ku rewşeke wisa xetereke ji bo aştîya herêmê ye, rêveberên KNGMyê (Konferansa Navneteweyî li ser Golên Mezin), ku bi nemumkinbûna lihevkirinan dizanin, amadekarîya pêkanîna lihevkirineke xapînok dikin a avakirina "hêzeke bêalî ya navneteweyî". Armanca wê ya pêşî aşkirina desthilatdarîyên ewropî û amerîkî ye, ew gumanan dikin ji îhtîmala derketina şerekî ku xwe veguherîne şerekî herêmî. Rastî ew e ku Kongolî û Ruwandî xwedî fikrên bi tevahî cuda ne der barê mijara vê hêza navneteweyî de ya ku qaşo wê ji nû ve aramîyê bîne herêmê. Li alîyekî Kongolî hêzên navneteweyî weke rêbazeke muzakerekirina li ser wezîfeya Mîsyona Neteweyên Yekbûyî ji bo Îstîqrara Komara Demokratîk a Kongoyê (Monusco) dibînin, ew mezintir hêza misogerkirina aştîyê ya wezîfedar a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) ye. Kongolî dixwazin erka êrîşbirinê bidin wê. Herçî Ruwandî ne, ew lihemberî vê hêzeke herêmî tercîh dikin ku têde rengên ruwandî hene, li şûna hêzeke bêalî. Ew doza parvekirina kontrola *kîgalî* li ser Kîvuya Bakur dikin, ji bo Kinşasayê mirov nikare li vê yekê bifikire.

Krîza Kîvuya Bakur daye ber xwe, bi tenê dubare kirina pevçûnên bênavber e, ku ji dema komkûjîya Tutsîyan a sala 1994ê û vir ve di navbera herdû cîranan de diqewimin. Ev pevçûn herwiha ji dema bersivdana li komkûjîyê û vir ve ya Bereya Welatparêz a Ruwandî (BWR) ku Kagamé wê bi rê ve dibe didomin, vê bûyerê bi miliyonan Hutuyên ruwandî neçar hiştibûn birevin û li welatê cîran Zaîrê (ku wê bibe KDK) bibin koçber. Zaîre ya mareşal **Joseph Mobutu** ku ji hev de dikeve, hewl nedabû vê herîkîna mezin a mirovan kontrol bike. Di nava yên koçkirî de gelek kadroyên "Hutu Power", ku *interhahawme*-ê komkûjer pêk tînin hebûn [*interhahawme* mezintirîn mîlîsa Ruwandîye, nota wergêr]. Ew bi lez veguherîn mîlîsên xwedî çêkan, yê herî navdar hêj Hêzên Demokratîk yên Azadkirina Ruwandayê (HDAR) ye. Di wê demê de, şîddet û xizaniya kampên dêw yên penaberan ku her şiklê çekan li wan hene û daxwaza bi dest xistina dewlemendîya dêw ya Kongoya Kigalî û Kampalayê, bûn sedema rewşeke tevlihev ya ji teqînê re amade ku pevçûnên ji bo desthiltadariyê li Zaîrê bi xwe hartir kirin. Bi vî rengî sala 1996ê , muxalîfê kongoyî **Laurent-Désiré Kabila** (1941-2001) xwe spartibû daxuyanîya BWRyê û komên ugandî yên şerkirina lî dijî mîlîsên hutuyî bi armanca bidestxistina Kivûyan, rûxandina rejîma **Mobutu** û bidestxistina desthilatdariyê sala 1997ê. Ev bûyer bû sedema qutbûna **Laurent-Désiré Kabila** bi Kigalî re û kir ku duyemîn şerê Kongoyê zûtir pêk were. (2)

Îro, Kigalî hêj piştgiriya tevgereke sîyasî-eskerî ya weke M23yê dike ji bo bidestxistina çavkanîyên xwezayî yên Kongoyê û di heman demê de ji bo misogerkirina avakirina baregeheke eskerî li hemberî komên çekdar ê hutuyî yên ku her diçe lawaztir dibin. Li aliyekî din, KDK bê dudilî xwe dispêre piştgirîya mîlîsên weke EDARê yê Mudacumura ku ji aliyê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (DCN) ve bi dayîna fermana nehsûcên şerî tê gunehbarkirin.

Tişta ku serokdewlet **Kabila** 11ê nîsana bihûrî kir, nimûneyeke baş a oportunîzma wî ye. Wê demê serokdewletê Kongoyê bi awayekî baş plankirî da zanîn ku dixwaze **Bosco Ntaganda**, yê navê "termînator" lê tê kirin, bixe girtîgehê. Mirovê navbirî kevne-rêveberê tevgera serhildêr a tutsî KNGê ye ya ku Ruwanda pişta wê digire. Ew sala 2006ê ji aliyê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ve ji bo pêkanîna sûcên şerî û sûcên li dijî mirovatîyê hatibû gunehbarkirin. Lê vê yekê rê li ber serokdewlet Kabila negirt ku 23ê adara 2009ê, wî bike generalê arteşa Kongoyî (FARDC), ev yek ê bi kêra lihevkirinekê bihata, li ya plana ji nû ve tevlîkirina endamên KNGê di nava arteşa fermî de. Di hilbijartinên kanûna 2011ê de yên ku li ser rewatîya wan nîqaş hene, **Ntaganda** bi roleke diyarker rabû – muxalîfê sereke **Etienne Tshisekedi** red dike serketina Kabila nas bike – û bi vê jî piştrast dike ku Kivuyan di hilbijartinan de "rêya baş" neqandîye.

Dengdana gelên herêman ku di serketina dawî ya Kabila de diyarker e, rasta tehdît û her şiklên şîdetê tê. Hejmara bilind a ji rêderketinên ku pêvajoya hilbijartinan asteng dikin, pêvajo ji aliyê Yekîtîya Ewropî ve bi dayîna bi qasî 250 milyon ewroyan tê fînansekirin, dikin ku yên ku pereyan bi deyn didin biqeherin û dengê xwe bilind bikin. Di heman demê de "civaka sîvîl" gilîyê şîddet û hebûna tevnên bertîlxur ên di vê pêvajoyê de avabûyî dikin. (3)

### Pîvanên tevgera baş

Wexta Kabila "sed sedemên" ji bo girtina **N'tganday**ê yeko yeko dihejmêre, ew hewl dide dersên tevgera baş bide "civaka navneteweyî", û tu tedbîrê nagire ji bo di pratîkê de vê yekê pêk bîne. Lê belê herkes şûna N'tganda li Gisenseyî û Gomayê lê dijî nas dike, li wir berpirsiyarên Monuscoyê timî rastî wî tên li qadên tennîsê yên hotela *Ihusi*yê. Piştî danezana serokdewlet, ew azad e bireve û biçe Masisiyê ku lê baş tê parastin û ew ê sûdê ji "agirbesteke" pênc rojan ya mirovan matmayî dihêle werbigire, berîya ku ji nû ve vegere Ruwandayê – Li wir 6ê gulanê, bi hevkariya Laurent Nkundayê, ku ew jî ji aliyê DCNyê hat gunehbarkirin û bi Sultani Makenga re, kevne-alîkarê wî yê askerî yê ku niha nûnerê fermî yê tevgerê ye, wî M23 ava kir.

Tevî ku serokdewletê ruwandî berpirsiyarîya xwe di pêkhatina krîzê de red dike, ew bi biryardarî zend û bendan badide ji bo li dijî wê têbikoşe. Serokdewlet girêdayî sûdwergirtina ji çavkanîyên xwezayî yên Kivus û Ituri ya neqanûnî ye, ew qederê ji çar paran yekê Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) ya welatê wî pêk tînin. Serokdewlet hewl dide ku tevayî xwe qut bike ji EDARyê û ji meha sibatê û vir ve, ew di pişt perdeyan de piştgirîya avakirina M23yê dike, berpirsiyarên tevgerê dihewîne, mirov û materyalan ji tevgerê re peyde dike. Tevî ku delîlên saxlem ên vê piştgirîyê (4) dibin sedema nerazîbûna navneteweyî û herîkîna alîkarîyên navneteweyî yên ku debara Kigalî bi wan dibe dixin tehlûkeyê, di vê çarçoveyê de Ruwanda hewl dide demê bi dest bixe û avakirina hêzeke navneteweyî li Kampalayê qebûl dike. Ew baş dizane ku ev tişt xeyalî ye. Ruwanda herwiha hewl dide agirê rexneyên ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê deng veditin vemirîne, lewra sefîrê DYAyê gefan dixwe li rêveberên ruwandî bi dadgehkirina wan a li DCNyê. Ev bûyer dibe fersend ji Franseyê re da ku ji 2ê tebaxê vê M23yê û tevahiya piştgirîyên wê li derveyî welêt şermezar bike, lê belê bi awayekî vekirî behsa Ruwandayê nake, lewra têkilîyên Fransayê bi Ruwandayê re ji komkûjîya 1994ê ve ne baş in. (5) Wisa xuya ye ku bi awayekî îzolebûyî, Parîs meşandina dîplomasîyeke bi taybetî nerm tercîh dike li hemberî "welatê hezar çîyayan".

Li alîyekî din jî, Afrîkaya Başûr biryar da ku wê sûdê ji cîvîna bilind a Civaka Pêşketina Afrîkaya Navîn (CPAN) ya li Maputoyê (li Mozambîkê) tê lidarxistin werbigire, KDK endamê vê rêxistinê ye ku sala 2005ê tevlîbûna Ruwandayê red kiribû û 19ê tebaxê piştigirîya ku Ruwanda dide tevgera serhildanê şermezar kiribû. Ev biryareke derengmayî ye, diyar e hewldaneke Pretoria ye ji bo ku xwe nêzîkî Kigalî bike. Amadebûna Kagamé di pîrozkirina sedsala Kongreya Neteweyî ya Afrîkî (KNA) de sembola vê biryarê ye. Têkilîyên di navbera herdû welatan de xira bûbûn piştî ku hezîrana 2011ê li Johannesburgê generalekî ruwandî yê mişext hat kuştin. Bi biryara CPANê, Afrîkaya Başûr li helwesta xwe ya adetî vedigere û piştigirîyê dide Kongoyê, hevkara xwe ya dîrokî. Ew behna Kabilayê fereh dike, piştî gelek mehên îzolebûneke nesabit li ser dika sîyaseta parzemînê.

### Xeteke êrîşkar

Belê, tevî çalakdarîya bênavber ya wezîrê karên derve **Raymond Tshibanda**, Komara Demokratîk ya Kongoyê zehmetîyê dikşîne da ku hevkarên xwe yên adetî tevlî doza xwe bike – ji xeynî danezana daxwaz û şermezarkirinên ji bo xelk bibîne. Wisa xuya ye ku Angola, endama Konferansa Navneteweyî li ser Golên Mezin e, wext bi dest dixe li hemberî Kinşasayê ku alîkarîya lezgîn jê dixwaze. Tevî vê yekê, serokdewletê Afrîkaya Navîn **François Bozizé** zêde mijûl e bi serhildana çadî ku welatê wî daye ber xwe. Bozizé herwiha bi serhildaneke ciwanan re jî rû bi rû ye; tirsa wî ji komployekê bû sedema ku ji kar derxistina wezîrê wî yê malî ku nevîyê wî bû. Di heman demê de, pirsgirêka **Faustin Munene**, generalekî ku Kabila li Brazzavillê weke "penaberê sîyasî" hewandibû, têkilîyên di navbera KDKyê û Kongo-Brazzavilleê de xira dike.

KDKya lawazbûyî, stratejiyeke navcîtîyê xiste dewrê ku armanca wê girankirina zexta insanî li ser Kigalîyê ye. Lewra, rêxistin û sazîyên çapemenîyê yên navneteweyî ji meha nîsanê ve bala xwe didin ser jirêderketinên dijminên fermî yên serokdewletê Kongoyê. Bi vî rengî ew hîleyên hibijartinê û gelek gunehbarkirinên elaqedarî bertîlxwarina derdora serokdewletê kongoyî didin jibîrkirin. Tevî ku tewazûna hêzê bêguman bi kêrî M23yê tê, wisa xuya ye ku vê stratejîyê destûr da wî kontrola paytexta herêmê, Goma di destê xwe de bigire. Di rewşeke bi vî rengî de, Kinşasa bêhna xwe fireh dike ji bo ji nû ve birêkûpêk kirina hêzên xwe yên askerî û ji bo xwe nêzîk kirina mîlîsên herêmî.

Di 2009ê de, peşnîyaza serokdewletê fransî **Nicola Sarkozy** ya dabeşkirina îdareya rêveberîyê ya çavkanîyên herêmê di navbera KDK û Ruwandayê de ji aliyê Kinşasa ve weke xeletîyekê hat nirxandin û bi tevahî hat redkirin. Lê belê ji dewleta Kongoyî nayê ku desthilatdarîya xwe ferz bike li beşeke mezin ya erdê welêt. Çavkanîyên xwezayî yên *Kivus* û *Ituri*, ku armanca her şiklê qaçaxçîtîyê ne, bi awayekî sîstematîk tên talankirin. Zêr, elmas, kasîterît û heta bi uranyûmê, îdareya fermî bi tenê hejmareke pir kêm a dewlemendîyên ji kanan derxistî qeyd dike. Di heman demê de, tevlîkirina kevne-tevgerên serhildêr li nava artêşa fermî di çarçoveya pêkanîna lihevkirinên ji bo aştîyê de û gurçûpêç kirina wan bi îmtîyazên mezin bû sedema rêzeke jirêderketinan ku bi kêrî zêdebûna hejmara serhildanan hat. Li herêmeke ji alîyê aborî ve paş de mayî, şîddet bû bikêrhatîtir rêbaza domandina jîyan û bipêşketinê, heta ji bo avakirina paşerojeke neteweyî jî. Edaleta navneteweyî ku hêvîyê temsîl dike û ku xuya ye ew bi tenê dikare dawîyê li xeleka şîdetê bîne, heta niha bi kêr nehat, lewra di pratîkê de ew bi tu awayî nehat bicîh anîn.

Raste e ku Yekitiya Afrîkayê xwedî helwesteke êrîşkar e li hemberî Dadgeha Ceza ya Navneteweyî, ji dema ku hezîrana bihurî ku **Nkosazana Diamini-Zuma**, jineke ji Afrîkaya Başûr li şûna **Jean Ping**ê gabonî weke serokê komîsyona wê hat hilbijartin û vir ve.

Têkilîyên di navbera Yekitî û Dadgehê de, ku ji destpekê ve aloz in, hê xirabtir bûn bi biryara Dadgehê ya girtina serokdewletê sûdanî **Omar El-Beşîr** ji ber pêkanîna komkujîyekê: Yekîtîyê ji welatên endam xwest ku bi DCNyê re hevkarîyê nekin, çawa ku wê di dema gunehbarkirina **Qedafî** de kir. Ev têkçûn nîşana xisleta piralîtîya afrîkî ye, ew gelek caran ji tevneke înfrasîyasî ya piştgirîyên şexsî nabihure.

Komara Demokratîk ya Kongoyê ku qada lîstîkên hêzên herêmî ye, demekê ya hêzên kolonîal bû jî û tevî kanên xwe yên bêdawî li gorî HDIyê [*Human Development Index / Pîvana Bipêşketina Insanî: Ev pîvaneke Neteweyên Yekbûyî ye ji bo welatan li gorî îstatîstîkên dirêjahîya temenê mirov, perwerde û hatina madî bixe rêzê; nota wergêr*] welatê herî lawaz ê cîhanê ye, dîsa kete nav krîzeke bi şîdet a siberoja wê nediyar e. Li gorî Doktorên Cîhanê, ji 1997ê ve şer bûbû sedema kuştina di navbera sê ta deh milyon mirovan û bûyerên ji meha gulanê ve diqewimin bûn sedema koçberbûna zêdetirî pêncsed hezar mirovan û ya "şewbeke destavêtinê". Tevî ku sê civînên bilind ên ***Konferansa Navneteweyî li ser Golên Mezin*** li pey hev pêk hatin jî bêyî ku tu encam ji wan were bidestxistin, ji meha tebaxê û vir ve, êrîşên etnîk ji nû ve derdikevin holê. Wisa xuya ye ku beşdarên civînê bi tenê li ser mijarekê li hev dikin: serê xwe qet bi çarenivîsa gelên herêmê naêşînin.

* Lêkolîner, kevne-alîkarê taybet ê Dozgerê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî.

(1) KNGM ya navenda wê li Bujumbura (Burundî), avahîyek e ku sala 2000î Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) û Yekitîya Afrîkî saz kir, ew foruma sereke ya dîplomatîk a Herêma Golên Mezin yên Afrîkayê ye. Yanzdeh dewlet endamê wê ne: Angola, Burundi, Komara Afrîkaya Navîn, Komara Kongoyê, Komara Demokratîk ya Kongoyê, Kenya, Uganda, Ruwanda, Sudan, Tanzanîya û Zambîya.

(2) Şerê Kongoyê yê yekem sala 1996ê dest pê dike û bi rûxandina rejîma serokdewlet Mobutu sala 1997ê bi dawî dibe. Laurent-Désiré Kabila şûna Mobutu digire û navê Zaîreyê diguhere, dike Komara Demokratîk a Kongoyê (KDK). Neh welat ketibûn nava şerê duyem ê Kongoyê (1998-2002): KDK, Angola, Namîbya, Zîmbabwe û Çad li alîyekî; Ruwanda, Uganda û Burundî li alîyê din.

(3) Berhema li jêr bixwîne : Tristan Coloma, "Congo, la société en campagne" (Kongo, civaka li gundewarîyê), *Le Monde diplomatique*, kanûna 2011ê.

(4) Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî, zêdekirina li rapora demî S/2012/348 ya koma pisporên KDKyê, 27ê hezîrana 2012ê, www.un.org/ga/search/view_doc.asp?symbol=S/2012/348/Add.1

5 Ji sibata 2012ê ve ji dema redkirina Kigali ya naskirina Xanima Hélène Le Gal ve ku di vê navberê de bû şewirmenda Afrîkayê ya François Hollande, sefîrê Fransayê li Ruwandayê tune ye.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

www.diplomatiquekurdi.org



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60x30cm

# Dîktatorên nepoşman

Laurie Fachaux

Ev heft yan jî heşt hezar kesên windabûyî berdêla serketinê bûn." Ev gotinên ku îşaret bi mexdûrên cûntaya leşkerî ya ji 1976ê heta 1983yê desthilatdar bû dike, ji devê girtîyekî 86 salî derdikevin: ji devê dîktatorê bi navê **Jorge Rafael Videla**, ku îro ji ber pêkanîna gunehên li dijî mirovatîyê cezayê muebbedê lê hatîye birrîn. Ew bê dudilî îddia dike ku "her şev ew bi dilekî rehet radizê".

Di hucreya xwe ya biçûk ya girtîgeha leşkerî ya ***Campo de Mayo*** de, nêzîkî Buenos Aîres, di bin îşareta xaçê ya bi diwêr ve daliqandî de li ser "textekî xewê yê erzan bi lihêfeke bordo ya baş danî ber hev", yê ***de facto*** (*di pratîkê de*) kevne-serok bû (ji 1976 heta 1981ê), rojên sêşemê (wî rojên din ji jina xwe re vediqetandin) hevdîtin bi rojnamevanê arjantînî **Ceferino Reato** re pêk dianîn. Ev neh hevdîtînên ku bîst saetên axaftinên di navbera herdûyan de pêk tînin, di berhêma bi navê *Disposición finale* (1) de hatine komkirin. Ev berhem bi awayekî mirov matmayî dihêle, darbeya 24ê adara 1976ê û şerên ji bo desthilatdarîyê yên di nava cûntayê de diqewimîn, rave dike. Ew herwiha behsa piştgirîya ku piranîyeke mezin ya çîna patronên arjantînî dida dîktatorîyê dike, yan jî behsa girtîbûna jina bî ya general **Juan Domingo Perón** ê ku darbeyê dawî li desthilatdarîya wî anîbû ya bi navê **Isabel** jî dike. **Videla** wisa rave dike "*Navê wê Perón bû, eger azad bûba ew ê bikarîba helwestên sîyasî û sendîkayî li dijî hikûmeta leşkerî seferber bikira."* Tiştekî nû, yê Reato navê *"hûtê mezin"* lê dike tunekirina bi hezaran muxalîfên "nayên ser rê" ye ku ew qebûl dike – Ew behsa her mîlîtanê çepgir, sendîkalîst, rahib, yan jî rêveberên sîyasî dike, yên ku li dijî rejîma wî têdikoşîyan.

Lê birêz **Videla** tişta di dilê wî de mayî dibêje. Ev kesên ku "*pêwîst bû bimirin da ku em di şerê li dijî serhildanê de bi ser bikevin* (…) *me ne dikarî guleyan li wan bibarînin, ne jî wan dadgeh bikin*". Rast e kuştina mîlîtanên Euskadi ta Askatasuna (ETA) û endamên Bereya Şoreşgerî ya Welatparêz li dijî Faşîzmê (EŞWDF) îlona 1975ê li Spanyaya Franco, bûbû sedema skandaleke navneteweyî. Li gel vê yekê jî, tepisandina gel a dîktatorîya Şîlîyê dibû sedema "nerazîbûneke cîhanî". Leşkerên arjantînî, ku bi îhtîmaleke mezin xwestin îmaja xwe xirab nekin, rêbazeke din bijartin: "*tedbîra dawî*", "*du peyvên pirr leşkerî yên dihatin maneya jiholêhilanîna tiştekî ji ber ku nikare were bikaranîn"*, **Videla** bi vî rengî behsa bûyerê dike. Navê kiryarê diguhere lê armanc weke xwe ye: ji balefirekê laşan diavêjin deryayê û winda kirina laşên din (2) …Ango kurt û kurmancî xwe ji wan kesên ku ew acîz dikirin (ku carnan rêveberên şîrketên dewletê gilîyên wan dikirin) xilas dikirin, lê heta ku mumkin bû ev yek bi awayekî veşartî pêk dianîn.

Reato du çîrokên şahîdîyê yên rojnamevanan û yên kevne-leşkeran li van mikurhatinan zêde dike. Ev çîrok yan bi tevahî yê şahidan jêre gotibû, yan di nivîsên rojnameyî yan jî pirtûkên kevn yê nivîskar de behsa wan hatibû kirin. Agahîyên di van hevdîtinan de komkirî bi kêrî analîza hûrgilî ya di çarçoveya dîrokî de tên wê çarçoveya dîrokî ya ku destûr da ku cûntaya leşkerî desthilatdariyê bi dest bixe. Di axaftina xwe de, **Reato** ku dûrî her şiklê manîkeîzmê ye û bêyî ku bikeve nava teorîya, dike ku gerîlayên şoreşger û terorîzma dewletê nikarin rûbîrû biaxivin, ew behsa berpirsiyarîya **Isabel Perón** û ya gerîlaya Montonerosê dike: weke nimûne erîşbirina ser alaya pîyadeyê, 5ê çirîya peşîna 1975ê, bû sedema rêzeke qanûnan ku **Videla** navê *"destûra kuştinê"* lê dike, wî ev destûra kuştinê da artêşê. Ew piştre pesnê vê yekê dide.

Tevî ku Videla gazinan ji "*bikaranîna zêde*" ya şiddetê dike jî, kevne-dîktator "*ji tu tiştî poşman nabe"*. Ew hebûna planeke revandina sîstematîk a zarokan înkar dike, lê, li xwe mikur tê ku *"timî pê dizanî ku hin zarok dihatin revandin, hinek jî dihatin firotin"*. Pişt re wisa didomîne, *"wexta zarok didan malbateke ku nikarîbû bibe xwedîyê zarokan, hingê ev tişt bi niyeteke baş dihat pêkanîn."*

Axaftinên Videla yên hevkarê wî yê şîlîyî tîne bîra mirovan, ew jî xwedî tu hesta poşmanîyê nebû. Di *El dia decisivo* (Roja diyarker) de ku sala 1979ê çap bû (3), **Augusto Pinochet** jî – di 2006ê de mir – xwedî fikra ku darbeya 11 îlona 1973ê yekane rêbaza "xwe rizgarkirina ji zilma doktrîneke belavker" ya bi "afyona komunîst" hatî zexm kirin bû: ango behsa rejîma serokdewletê ku bi awayekî demokratîk hatî hilbijartin; **Salvador Allende** dike (1908-1973), sembola wî di xwepêşandanên xwendekarên şîlîyî de tîmî tê dîtîn. Pînochet pesnê xwe dida ku *"ew kesê pêşî bû yê ku pişta rejîmeke marksîst da erdê"* - li gorî wî ji demokrasîyê nedihat ku li dijî wê têbikoşe"…



Parwez Zabihi: **Bênav**, Qaçên li ser kitanê

(1) Ceferino Reato, *Disposición final (Tedbîra dawî)*, Sudamericana, Buenos Aires, 2012, 316 rûpel, 99 pesos ên arjantînî.

(2) Li ser vê mijarê mirov dikare romana tijî agahdarî ya Philip Kerr bixwîne, *Une douce flamme (agirekî nerm)*, Le Livre de Poche, Parîs, 576 rûpel, 2012, 8.10 ewro.

(3) Augusto Pinochet, *El dia decisivo (Roja diyarker)*, Editorial Andrés Bello, Santiago du Chili, 1979.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Parwez Zabihi: **Bênav**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 10x10cm

# ÇAND Û HUNER

## Keleşê Reş û Newaf Mîro

Feryal Guladawîya*

Romana em behsê dikin, romana yekem a **Newaf Mîro** ye. Newaf Mîro kurdekî êzdî ji Wêranşarê ye, li Almanyayê dimîne. Yek ji sedemên hilbijartina me ya vê romanê jî êzdîbûna nivîskar û mijara romanê ye. Ji ber mijara xwe ev pirtûk xwe weke romaneke dîrokî dihesibîne û trajediya êzdîyan ku di sedsalên hivdeh yan jî hijdehan de di bin fermandarîya paşayên Osmanîyan de di komkujîyên li dijî nemisilmanan de cîh digirtin, vedibêje.

### Leheng

Çîroka romanê li derdora lehengê sereke **Keleşê Reş** û diya wî ava bûye. Serpêhatîyên wan ji destpêka zarokatîya Keleş ve dest pê dikin. Jixwe pirsgirekeke ji vir derdikeve ku tu lehengên din jî tune ne, roman hemû li derdora lehengê sereke digere. Nivîskêr bi tenê ev leheng baş daye nasîn, lehengên din ên ne girîng û lehenga duyem ku di çîrokê de bi roleke girîng radibe, qet nehatine nasandin û bi tenê bi tevlibûna xwe ya di dialogan de xuya dikin. Mesela li ser diya Keleşê Reş, Xatûnê em bi tenê dizanin ku jineke bî ye û hew.

Nivîskêr pir kêm behsa wê kiriye û wextê kiriye jî bi tenê şabûna wê bi serpêhatîyên kurê xwe vegotîye û di nîvê romanê de em nizanin çawa, Xatûn ji nişkê ve winda dibe. Ew jî weke kêmasîyekê xuya dibe ji ber ku heta nîvê romanê tim tê nîşandan ku bûyer û serpêhatîyên Keleş girêdayî vî karekterî bûn. Weke ku sedem û motîvasyona dizî û zalimtîya Keleş diya wî bûye. Keleşê ku xwe mecbûr hîs dike bi emrê xwe yê biçuk debara malê bike, ji bo dilê diya xwe sa bike niheqîyê li gundî û cîranên xwe dike. mal û milkê wan didize. Diya Keleş van kirinên kurê xwe timî bi aferin û keyfxweşî şîrove dike. Ev herdû leheng ji destpêkê ve girêdayî hev in û ji nişka ve windabûna Xatûnê motîvasyon û sebeba bûyeran ji holê radike û xwendevan êdî nizane çima Keleşê ku ewqasî girêdayî diya xwe bû, lê napirse, tucarî lê nagere û wê hema hema ji bîr dike. Mesela, wê baş bûya ku nivîskar bigota çi bi serê diya Keleş de hat. Mirov nizane gelo ji alîyê paşayî ve hat kuştin an jî gelo weke diya leşkerê wî yê herî baş hate efû kirin!?

Piştî qutbûna bi dayika xwe, Keleş dibe leşkerê Paşayê Osmanî û perwerdeya leşkerî dibîne. Serpêhatîyên Keleşê ku heta vê demê dizîyên wî bûn, ji vir heta dawîya romanê dibin serpêhatîyên perwerdeya leşkerî ku weke dizîyên wî roj bi roj yeko yeko tên vegotin. Ev jî dibe sedema dubarekirina bûyerên ku dişibin hev û romanê dirêj dikin.

Li vir nakokîya paşa heye ku him Keleşê Reş weke leşkerê xwe yê herî jêhatî dibîne û ku li alîyê din jî , dixwaze ciza bide diya Keleşî ku zarokekî ewqasî bêexlaq mezin kiriye. Yanî paşa him bêucdanbûna Keleşî teqdîr dike û dixwaze di şerê xwe de bi kar bîne û him jî sebebê serketina Keleşî ciza bike. Bawer dikim li vir nivîskar dixwaze trajedîya êzdîyan bîne ziman û nîşan bide çawa bi awayekî bêinsaf xelkê êzdî yê - bi awira paşa - bikêrhatî dihatin bikaranîn, û çawa êzdîyên din yên – bi awira paşa - nebikêrhatî dihatin windakirin. Lê ev yek bi awayekî zelal û eşkere baş nehatiye vegotin û xwendevan fêhm nake çawa Keleş dikare bibe girêdayîyê paşayekî ku tehlûkeyeke ewqasî mezin e ji bo diya wî (lewra bi serê xwe Keça Paşê weke motîvasyoneke mezin di romanê de nehative hûnandin).

Li vir em dikarin bibêjin ku karaktera Keleş bi awayekî zêde dilsaf hatiye avakirin. Weke ku kirinên xwe yên bêexlaq û bêwicdan ku pêk anîne, ji dizî û zalimtî heta komkujîyan, ev tişt hemû bêhiş û bêzanîn kiribin. Weke ku di dema leşkerîyê de jî hîn zarokekî bê sûc be, hatiye nîşandan. Yanî di vî warî de emrê leheng û zanîna hişê wî li hev nakin. Li şûna vê nivîskar dikarîbû rol û karaktera zalimekî bêexlaq û mirovkujekî baş ê bêwicdan bidaya lehengê xwe. Ev ê baştir bûya ji vê karaktera lawaz ê zarokekî bêguneh ku ji alîyê hinan ve tê bikaranîn, daye lehengê xwe. Mirov ji xwe dipirse ma ev zarok ku bûye mêrekî gihayî û leşkerekî baş qet aqilê wî tuneye ku pirsan ji xwe bike û hin tiştan şîrove bike. Li şûna lehengekî xurt ku bi zanebûna xwe tevdigere, nivîskar lehengekî lawaz û bêhiş ku tutiştî ji xwe napirse û ku li ser nakokîyên xwe nafikire ava kiriye.

Her du leheng jî însanên balkêş in. Ne li gorî mantiqa exlaqî ya civakê ne. Mesela, weke dayikekê, diya Keleşî li hemberî dizîyên kurê xwe ranabe û hewl nade wî ferî rêya baş bike, jêre nabêje derew, dizî û zalimtî tiştên xirab in. Berevajî ew wan taybetmendîyên kurê xwe weke jîrbûn, jêhatîbûn û kêrhatîbûnê dinirxîne û her kirina xirab ya kurê xwe weke serkeftineke mezin pîroz dike û bi vî awayî piştgirîya xirabîyên kurê xwe dike.

Keleş jî bi vê mezinbûnê re dek û dolabên xwe her car mezintir dike û xirabîyên wî jî her diçin bêexlaqtir dibin û wî heta bi mirov kuştinê û komkujiyê dibe. Lê mixabin, weke ku me got nivîskar ev rola xirabî ya Keleş heta dawî nebirîye û nîvçe hiştiye. Xirabîyên wî bi safbûn û bêhişbûneke zarokî xemilandine ku lehengî qels û lawaz dihêle. Xuya ye nivîskarî xwestiye lehengê xwe bide hezkirin, ji bo ku sempatîya xwendekar jêre kêm nebe ew bêguneh daye nasandin û ji bo ji mantiqa exlaqî ya civakê qut nebe, sucên xirabîyên Keleş dixe stuyê diya wî, lê bi hezkirin û girêdayina Keleşê Reş bi diya xwe ve xwendekar ji bîr dike ku ew ne dayikeke baş e. Ji ber vê girêdayîbûna wî bi diya xwe ve, windabûna Xatûnê hisa kêmasîyeke mezin dixe dilê xwendevanan.


Piştî derketina diya Keleşî ji romanê, ku ew bûyereke girîng e lê nehatiye vegotin, êdî çîrok bi tenê li derdora serpêhatîyên leşkerî yên Keleşî digere. Ev derketina diya wî û tevlîbûna Keleşê Reş nav leşkerîya Paşê, herikîna çîroka romanê qut dike û beşeke nû ya romanê bi jiyana nû ya lehengî dest pê dike. Di vê beşê de lehengekî nû dikeve çîrokê û hevalekî Keleşî çêdibe. Lê dîsa nivîskar vî lehengê nû nade nasandin û heta dawîya romanê em kêm tiştan li ser wî dizanin, em dizanin ku ew bieslê xwe ne misilman e. Ew tim li ba Keleşî ye, weke diya Keleş rola wî ya herî girîng bi hevrebûna wî ya bi Keleşî re ye û pir caran tê jibîrkirin. Çîrok dîsa li dora lehengê sereke digere.

Lehengekî sêyem ku hezkirîya Keleşî û keça Paşê ye tê û dikeve çîrokê, lê heta dawîya romanê tu gotin ji devê wê dernakeve. Ev leheng ji xeynî ku carinan bi cêrîyên xwe ve xuya dibe tutiştî nake. Xistina nav romanê a vê lehenga nîvheyî tiştekî balkêş e. Ji ber ku hezkirina wê dibe sedem ku Keleş bixwaze bibe leşkerê paşê û ku bixwaze di şerî de bibe yê herî serkevtî. Em nizanin çawa qîza Paşê dikare di cihê perwerdeya leşkerî ya qesrê de di nava leşkeran de bi cilên ewqasî xweşik ji xwe re bigere û rastî Keleşî bibe. Li vir xuya ye ku dema modern a nivîskêr û dema kevnar a bûyerê tev li hev bûne. Qîza Paşa weke keçikeke modern ku di kolanên bajarekî de digere di qişleya leşkerên qesrê de digere. Û behtir, ev lehenga ku heta dawîya romanê tenê carinan di gerên xwe de xuya kir, di dawîya romanê de ber bi Keleşî ve dimeşe û rasterast bêyî ku hev nas kiribin jê re eşkere dibêje ku naxwaze pê re bizewice. Ev yek bala xwendevanan dikşîne. Ji bo xwendevanê ku xwe xistibû dema bûyerên sedsalên 18yî, ecêb e ku keça paşayekî biçe qişleyekê û yekser here pêşîya leşkerekî bavê xwe û bi gotinên tund, di nav civaka qesrê de, rasterast fikrên xwe îfade bike. Tişta herî balkêş ev e ku ev keçik ku heta vê demê di romanê de hindikî xuya kiribû, ji nişka ve nîqaşa herî giran a vê romanê dike û Keleşî dike sûcdarê birakujîyê. Jêre dibêje (r. 155) *''ez nikarim bi êzdîyekî diz û mêrkûj re bizewicim, tu kurê êzdîyan î û êzdîyekî êzdîkuj î, ezê vê yekê çawa ji zarokê xwe re bêjim".* Wê û Keleşî bi hev re tucarî xeber nedaye, ew çawa diwêre rasterast meseleya zewacê hema bi vî şiklî veke. Şikla axaftin û lebata wê bêhtir dişibe ya jinên dema me, lê dîsa jî bêyî ku hev naskiribin ecêb e û mirov fêhm nake çima nirxandina herî girîng û giran a romanê ji devê lehengekê derdikeve ya ku di çîroka romanê de bi tu rolê girîng ranebûye.

Li vir xuya ye ku nivîskar fikrê xwe xistiye devê vê keçikê, lê ev yek bi awayekî ne jixwe kiriye û serdema çîrokê bi serdema xwe ya modern re tev li hev kirîye. Wî zanebûneke welatparêzî û netewperestî ya modern xistiye devê keçikeke serdema Osmanîyan, weke nimûne wexta dibêje : *''ez şerî naxwazim ez aştîyê dixwazim"*

### Psîkolojîya lehengan

Mixabin nivîskar behsa psîkolojîya lehengan nekiriye, ev weke kêmasîyeke mezin tê hîskirin, ji ber ku ewqas bûyerên girîng diqewimînin û em tucarî nizanin ka lehengê sereke di van bûyeran de xwe çawa hîs dike. Li ser hestên Keleşî, em bi tenê dizanin ku gelekî hez ji diya xwe dikir û dûvre em pê dihesin ku gelekî hez ji keça paşê dike. Wekî din, ji xeynî şadbûna Keleşî bi siwarbûna li hespan, bi xwarina ku didin wî û bi ditîna hezkirîya xwe, em tu tiştî li ser fikr û hestên wî nizanin. Mirov




meraq dike weke xortekî êzdî ku her roj dikeve dersa îslamê vê guhertina olê di mêjîyê xwe de çawa hîs dike. Em dibînin ku nakokîyek heye, ji ber ku ew him duayên êzdîyan yên diya xwe dixwîne û him jî sond dixwe ku wê ji bo îslamê xeyrî misilmanan hemûyan, êzdîyan, xiristiyanan û cihûyan bikuje. Lê belê behsa alîyê psîkolojîk ê vê nakokîyê nehatiye kirin. Jixwe em bi tenê di dawîya romanê de ji sedîsed êzdîbûna lehengî fêr dibin.

Mesela, di sahneya şerekî de dîmenê zarokekî ku sînga diya xwe ya mirî ku ji aliyê leşkerên paşê ve hat kuştin dimije ji bîra wî naçe. Lê nivîskar bêhtir behsa hestên wî nekiriye. Gelo ew bi êzdîbûna xwe dizane an na zêde eşkere nîne, gelo poşman bû ku tev li vê arteşê bûye, gelo dilê wî bi van kuştinên xwe diêşe, em pê nizanin. Û roja piştre weke ku ev tişt ji bîr kiribin dîsa diçe dersên xwe yên perwerdeya leşkerî û ya dînê îslamê. Xemsarîya lehengê sereke li hember xirabîya xwe, bi vê detaya jibîrneçûna dîmenê zarokê ku şîrê diya xwe ya mirî dimije, hinekî xirab dibe. Hestekî dilnermî û însanî dide karaktera lehengê sereke ku ji destpêkê ve bêguman û bêwicdan xuya dike. lê mixabin nivîskar bi tenê carekê behsa rewşa psîkolojîk a lehengê sereke kiriye, ev jî bi van hevokên qut nivîsandine: *"heta sibê ev dîmena zarokê ku sînga diya xwe ya mirî dimijîya ji ber çavên wî nediçû"*

Di sehneya şerekî din de jî nivîskar dibêje Keleş hewl dide jin û zarokan nekuje. Li vir em fêhm dikin ku dixwaze sempatîya xwendevan bi lehengê sereke ve qut nebe û heta dawî lehengê xwe weke zarokekî bêguneh ku mexdurê siyaseta Paşayê Osmanîyan e nîşan bide û dixwaze heyfa mirovan pê were. Mesela, wexta qîza Paşê van rastîyan jêre dibêje, Keleş weke sêwîyekî bê navnîşan ku êdî nizane divê çi bike û bi ku ve here hatiye tarîfkirin. Haya wî ji diya wî tune ye, hevalê wî ku tim li ba wî bû di şer de mir û keçika ku hez jê dikir, wî ji ber xirabîya wî naxwaze. Ez bawer dikim nivîskar xwestiye trajedîya Keleş bişibîne trajedîya xelkê êzdî ku bûne birakuj û ku ji alîyê desthiladarîyan ve hatin bikaranîn, lê ku di dawiyê de bêxwedî, bê cîh û war û tenê mane. Em dikarin bêjin ku ji berdêla ku agahîyê li ser psîkolojîya lehengê xwe bide, nivîskar behsa psîkolojîya bindestbûna trajîk a gelê kurd û bi taybetî a êzdîyan kiriye. Bi vî awayî nivîskar lehengê xwe yê lawaz, bêexlaq û birakûj bi xwendevanan daye hezkirin.

### Vegotin

Kêfa min bi zimanê hesan û rehet ku herkes dikare jê fêhm bike yê Newaf Mîro re hat, ji ber ku ev roman bi min bi hêsanî dihat fêhm kirin. Hevokên tevlîhev ên zêde dirêj bi kar neanîne. Lê li alîyekî din, em bala xwe didinê ku şiklê nivîsandina wî bi tenê bi hevokên kurt ava dibe. Ev pexşan û şiklê nivîsê hinekî dişibe ya wêjeya devkî ya dengbêjan ku çîrokên xwe bi vî awayî dibêjin. Gelek caran nivîskar eynî hevokan dubare dike. Mesela, serpêhatîya dizîya hêkan a Keleşî du caran li ser hev bi eynî şiklî nivîsandîye. Yekem car wî bi tenê hêk xwarine û hema piştre jî dîsa diçe dizîya hêkan da ku vêca diya wî jî hêkan bixwe. Dubare kirinên wesa herikîna romanê giran dikin û hinekî sebra xwendevanan diqedînin. Mesela, wexta behsa perwerdeya Keleşî ya leşkerî dike, xwarina wan a her roj yeko yeko vedibêje û tim dubare dike bê çiqasî xweş bû û çiqasî zikê xwe bi vê xwarinê xweş tijeh kiriye. Dubarekirina van sehneyên xwarinê serê didu yan jî sê rûpelan, xwendekar hinekî acîz dike. Weke çîrokeke devkî wê balkêş bûya, lê weke romaneke nivîskî vê tesîrê nake.

Mesela, em baş dibînin ku ev sehneyên xwarinê têsîra çîroka devkî ya **Ristemê Zal** li ser e ku têde sehneyên xwarinê dûv dirêj û bi zêdekirinê hatine nivîsandin û çîroka Ristemê Zal ku pêşîya wî goştê pezkovî li ser savarê ewqas xweşik hatiye çêkirin dideynin û ku biqasî heft zilaman dixwe bi bîr dixe. Ewqasî dubare kirina sehneyên xwarinê yên **Keleşê Reş** bi hemû detayan li ser xwarinê, dişibe vê çirokê. Mesela: r.48 *''mirov ne ji xwarin û ne ji bêhn û dîtina vê xwarinê têr dibû."*

Lê zêde dubare kirina van vegotinên xwarinê ku tu eleqeya wan bi çîrokê re tunin, piştî demekê xwendekar aciz dike. Tiştên ku çîroka **Ristemê Zal** bi bîr dixin ne tenê sehneyên xwarinê ne. Wextê nivîskar pesnê siwariya, xurtbûn, jêhatîbûn û bêtirsbûna Keleşî dike jî weke ku dengbêjek çîroka Ristemê Zal bibêje. Mesela, r.58 dibêje: *'' wextê Keleş siwarê hespa xwe dibe, dibin weke ba û brûsk, dibin weke ezmanê şîn û kevok, yek yê din temam dike. Dibazin lê mirov dikare bêje ku difirin….weke ku Keleş li ser pişta hespê siwar hatibû cîhanê…"*

Li alîyê din jî baş xuya ye ku çîroka **Dewreşê Evdî** di avakirina lehengê Keleşê Reş de gellekî têsîr kiriye. Dewreşê Evdî jî siwarekî baş, şervanekî hêja, xurt û jêhatî ye ku ji bo paşayekî misilman diçe şer. Ew jî dil dilkeve qîza paşayê êşîra ***Millî*** û ji bo wê diçe şer. Keleşê Reş jî dixwaze bi serketinên xwe yên leşkerî bike ku keça Paşê dil bikeve wî. Di çîroka **Dewreşê Evdî** de leheng nagihîje miraza xwe û di şer de tê kuştin. Di romana **Newaf Mîro** de **Keleş** nayê kuştin lê ew jî nagihîje miraza xwe. Weke ku ne tesaduf e ku çîroka Dewreşê Evdî li derdora çiyayên Qerejdaxê ku nêzîkî Wêranşahrê ye derbas dibe û ku nivîskar jî ji Wêranşahrê ye.

Motîfeke din a zimanê devkî ya dengbêjan vegotina bedewbûna Perîxana keça Paşê û dilketina Keleş e. Wextê Keleş wê dibîne hîşê wî ji serê wî diçe û laşê wî dilerize û herweha. Mesela r.64 *''Lê ev rastî bû. Ev ne xewn, ne jî nexweşî bû. Ew Pêrî û cêrî bi xwe bûn. Her ku ber bi Keleş ve dihatin, laş û kabokên Keleş sist dibûn...'* û paragrafeke timam bi vî rengî dinivîse. Weke dema **Cembelî** çav bi **Binevşa Narîn** dikeve devê wî ji hev dibe û zebeşeke Diyabekirê û heft kela nîskê sibê dikevine devê wî de. Ev mubalexekirinên hestan, motîfên tîpîk yên efsane û çîrokên devkî ne ku **Newaf Mîro** jî di romana xwe de bikar anîne.

Bi vî rengî em fêhm dikin ku nivîskar di vê romana xwe de herweha behsa xwe, kesayetî û nasname û çanda herêma xwe carinan bi bikaranîna motîf û zimanekî devkî û çîrokbêjî kiriye.

### Cih û zeman

Sê cihên girîng di çîroka romanê de derbas dibin: Di destpêkê de çîrok di gundê ku Keleşê Reş lê mezin bûye diqewime. Wesa xuya ye ku têkilîyên diya wî û cîranan xurt nînin û ji ber xirabîyên Keleşî jî xirabtir dibin. Tesîra mezinbûna li gundekî li ser kesayeta lehengê ew in ku azad, wêrek û jêhatî mezin bûye. Lê dibe ku ji ber êzdîtîya wan be ku li derveyî jiyana civaka gund de dijîn û exlaqê wan bi cîranên xwe re bi qusûr e, ne normal didin û distînin. Mesela rojekê pîrikeke reben ku dizîya fotografê kurê wê yê çend sal in nedîtîye wê gelekî xemgîn dike, tê cem diya Keleşî û ji nav hemû tiştên ku Keleş dizîne tenê vî fotografî jê dixwaze. Diya Keleş kurê xwe diparêze û pirîka reben ku êş ketîye dilê wê, bê hêvî vedigere. Tevî ku di nava gundîyan de tenê pîrê bi wan re dost e, dîsa jî diya Keleş kurê xwe diparêze û li pîra reben naye rehmê. Ev bêbextîya diya Keleş nîşan dide ku ew zêde hez ji cîranên xwe nake an jî rêzê ji êşa wan re nagire. Li vir mirov dikare derxe ku malbata Keleş ji ber êzdîbûna wan tev li gundîyên din nabin û ku ji ber misilmanan zilm û zor dîtine. Di r.13an de dibêje *''ji rojan û deman meha Remezanê bû û xelqê misilman bi rojî bûn û yên ne misilman bûn jî xwe wesa diyar dikirin"* Ji vê em tê derdixin ku li gundê wan misilman û êzîdî bi hev re dijîn û ku ne misilmanan di bin zor û zexta îslamê de ne. Ji ber vê yekê jî belkî wexta kurê wê xirabîyê li wan dike, kêfa diya Keleş tê. Ew ewqasî pesinê xirabîyên kurê xwe dide ku mirov jê derdixe ku gundîyên din misilman in û êzdîyan piçûk dibînin, lewre diya Keleş dixwaze kurê xwe xurt û jêhatî bibîne û hemû kirinên wî, her çiqasî xirab bin jî, bi aferîn pîroz dike û piştgirîya hemû xirabîyên wî dike. Lê divê xwendevan bi xwe van ravekirinan texmîn bike, ji ber ku ji alîyê nivîskêr ve eşkere nehatine vegotin.

Paşê bi mezinbûna Keleşî û daxwaza wî ya dizîyên mezintir bike, diçe bajêr zulmê li dikandaran dike. Mesela li xwedîyê çayxanê dixe û pereyên wî ku wê rojê qezenc kiribû jê didize û dide diya xwe. Bi zêdebûna bûyerên wesa dikandarên bajêr li hev kom dibin û diçin şîkayeta Keleş li cem Paşê dikin. Ji vir û pê ve jiyana Keleş diguhere. Paşa şêwirmendên xwe dicivîne û biryar didin ku divê dizê ku hat şikayet kirin bibînin û cezayê wî bidinê. Lê gava Paşa sûcdarê van dizîyan dibîne ewqas ji ber jîrbûn û jêhatîbûna wî matmayî dimîne ku êdî dixwaze Keleşî bike leşkerê xwe. Li vî bajarî leheng ji diya xwe qut dibe û êdî dikeve bin fermana Paşê û diçe qişleyê daku perwerdêya leşkerî bibîne.

Sêyem cihê girîng ev qişle ye ku Keleş perwerdeya dînê Îslamê û ya leşkerî lê dibîne. Li vê deverê weke ku hemû jiyana xwe ya berê û diya xwe ji bîr kirine û kesayetîyeke nû ji xwe re ava kiribe. Bi perwerdeyên ol û leşkerî, dibe misilmanekî ku bi arteşê Paşê re ji bo belavkirina Îslamê însanên nemisilman dikuje. Ango xiristiyan, cihû û êzdîyan dikuje. Qişleya ku lê perwerde dibe dişibe qişleyên taybet ku têde kesayetên nû ava dikirin. Cihên ku Osmanîyan lê leşkerên taybet bi navê ''Yeniçerî'' çêdikirin, bi bîr tîne. Ji ber ku hevalê wî yê herî baş Hemîd jî ne misilman e û hertiştê li ser eslê xwe ji bîr kiriye. Piştî mirina Hemîd jî, hevalê wî yê nû jî bi eslê xwe ne misilman e, lê nizane ji ku hatiye û malbata wî çi ye. Ew qişleya em behsê dikin, tê de zarokên ku ji gundên artêşa osmanî ew talan dikirin, hatine komkirin û ev zarokên bêkes lê dikirin leşkerên taybet ên Îslamê

Di warê zemên de ji xeynî tevlihevbûna dema modern a nivîskêr û dema bûyeran ku me behsa wê kiribû, nakokîyek di zemanê çîrokê de heye. Em dizanin pîrika ku tê cem diya Keleş fotografa kurê xwe jê dixwaze. Yanî di dema çîrokê de fotograf hene. Lê belê Paşa, qişle û seferên eskerî hemû îşaret bi sedsalên hivdeh û hijdehan dikin. Diyar e ku ev şaşîyeke nivîskêr e.

* Wergêr û M.A li ser gelên Asya û Rojhilata Navîn

# Naverok
ÇIRÎYA PAŞÎN 2012

Grevên Birçîbûnê
**Vahap Coşkun**
▶ R. 1

Sîyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û Pirsa Kurdî
**Doç. Dr. Nezir Akyeşilmen**
▶ R. 1

Bawerîneanîna bi dewletê
**Serge Halimi**
▶ R. 2

Li pişt mentiqê insanî mafê navneteweyî
**Philippe Leymarie**
▶ R. 2

Li Tirkîyeyê fêrbûna zimanê ermenî
**Aziz Oguz**
▶ R. 5

Ji bo Ewropayeke çepgir raperîna sîvîl
**Bernard Cassen**
▶ R. 6

Ber bi sezarîzmeke ewropî ve
**C. Durand û R. Keucheyan**
▶ R. 7

Gelo Julian Assange hez ji heavy metal dike?
**Maurice Lemoine**
▶ R. 8

«Bikêriya» dibistanê, meseleyeke siyasî û perwerdeyî
**Sandrine Garcia**
▶ R. 9

Rewşa kurdan a berî şerî
**Michel Verrier**
▶ R. 10

Sendîkaya ku mixalefeta tûnisî ji nû ve bi gewde dike
**Hèla Yousfi**
▶ R. 12

Ji dîktatorîya eskerî ber bi dîktatorîya dînî ve?
**Alain Gresh**
▶ R. 13

1967, têkçûna ku her tişt guhert
**Eric Rouleau**
▶ R. 15

Hikûmeteke fasî di bin kontrola qraltîyê de
**Wendy Kristianasen**
▶ R. 16

Şerên neteweperestîyan li Derya Çînê
**Stephanie Kleine-Ahlbrandt**
▶ R. 17

Kî bi rastî doza aştîyê dike li Kivuyê?
**Juan Branco**
▶ R. 18

Dîktatorên neposman
**Laurie Fachaux**
▶ R. 19

ÇAND Û HUNER
▶ R. 20

LE MONDE diplomatique kurdî

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €
(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www.arsivakurd.org